PEYAMA kurd

Hejmar 43 | 01.07.2005

Kurdish weekly newspaper



Gelo Atatürk ajanê Ingilîzan bû?

Rûpel 7

New York Times nivîsand: „Tirkiye navenda bazirganiya seksê ye!“ Rûpel 2

Tenduristiya penaberên ku di greva birçîbûnê de ne xirab dibe Rûpel 5

Li Kurdistanê Êşkence berdewam e Rûpel 5

Kandîdata serokwezîriya Almanya Angela Merkel ji bo Mesûd Barzanî got: „Hilbijartina we jibo pêkanîna demokrasiyê gaveke girîng e “ Rûpel 8

Ahmet Altan: “Tirkiyê dîrokê şaş bi zarokên xwe dide xwendin” Rûpel 9

Hawafira eskerî ra yew bomba ginay yew banî re Rûpel 15

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 43



Hesîb Rojbeyanî:

„Eniya Tirkmen roleke pir bi xeter dilîze û ew girêdayî Tirkiyê ye“

Rûpel 10

Celal Talabanî dilê dijmin hênik kir: „Tirk li pişta me ne“

Rûpel 6



Têkiliyên Înformasîyonî



Welîd Şexo

Înformasîyon destpêka bingeha têkiliyê ye, di dîrokê de çawa Teknîka Înformasîyonê pêkanî, çawa rewşa têkilîyê guhert û çawa ev prosêsa di pêşerojê de cîyê xwe digre? Ev pirsên taybetî di nav lêkolînên min de cîh digrin.

Xwendinek durustî liser dîroka Înformasîyona Tekniki (IT) gelek pêwîste, raman û mirovan ev bidest pêkanîne, emê di gotarên pêşiyê de binin zimên.

Tiştên hatine nivîsandin, derketin û bikar bûne, ev bingehên lêkolînên min in. Çawa ev raman wek mozeîkê hev digre û wênek zor baş pêktîne.

Nîşanên her gewre ramanan, liser pêşeroja pêşkeftina Înformasîyona Teknîkî ye. Îro pêşkeftina teknîkî xwe dide pêşiya hemû zanistiya cîhanê, jiber ku teknîk taybetek xweyê zor giring jibo însanan heye. Çawa tiştên xewn û xeyal dike tiştên real, bes di rêya teknîkê de kompromîsek di navbera prinsîpa xewn û real de pêktîne.

SHAPE * MERGEFORMAT

Înformasîyona Teknîkî (IT) û pêşeroja lêkolînê bihevre girêdanek zor girîng heye. Ji alîkî de Înformasîyona Teknîkî (IT) alavek zor pêwîste jibo karê lêkolîna pêşerojê û di alî din de Înformasîyona Teknîkî (IT) bandora xwe liser wergeradina têknîk û têkiliyên navbera cîhanê de heye.

Ev xal û ramanên zanistîne ku di gotarên minî pêşerojê de emê liser biaxivin û zelal bikin.

Endazyar û Lêkolîner,
Computer Science

E-Mail:walid cheikho@hotmail.com

New York Times nivîsand:

Tirkiye navenda bazirganiya seksê ye!



PK (Navenda nûçan) Hat gotin ku Tirkiye navenda bazirganiya seksê ye. Rojnama New York Times, di nivîsa xwe ya di derbarê "bazirganiya seksê" de nivîsand ku "jiber mezinbûna aborî û sistiya qaîdeyên wîzeyê Tirkiyê ji jinên Slav re bûye bazara herî mezin a dinyayê".

Rojnama New York Times, liser bazirganiya seksê ya li Tirkiyê nivîsek dirêj nivîsand û got " bazirganiya seksê ya ku li Tirkiyê berfireh dibe gellek jinên Slav dixe xefkê". Ligor nivîsê jinên Slav ku wek "Nataşa" tên binavkirin di ser behra reş re derbasî Tirkiyê dibin û pirê caran ew dikevin kerxanan. Rojname dinivîsîne ku " di Tirkiya laîk de fûhûş yasal e (fermî ye). Jiber mezinbûna aboriya Tirkiyê û sistiya qaîdeyên wîzeyê, jinên kevnedewletên Sovyetê xwe li Tirkiyê digrin û ev ji wan re dibe yek ji bazara seksê ya herî mezin".

Berpirsiyarê Rêxistina Koçberiya Navnetewî –şaxê Ankarayê- Allan Freedman ji New York Timesê re got ku " bifikirin ku gellek çem xwe bera ser deryayekê didin. Ev derya Tirkiyê ye". Freedman herweha got ku "herweha Tirkiyê bûye wek navenda koçberiyê û ev jî çavên rayedarên Yekîtiya Ewrûpayê ditirsîne".

Mêr ji jinên zeîf hez nakin



Lêkolîneran mentalîta berê pûç kirin... weke dihat zanîn mêr ji jinên zirav, tenik û dirêj hez nakin

PK - Berê dihat bawerkirin ku mêr ji jinên jar, tenik û dirêj hez dikin, xeyala her mêrî ewbû ku jin, hezkirî yan jî dostika wî zirav û wek mankênan be. Lê ligor pisporên Brîtanî ev neraste û mêr ji jinên „bi kîlo û bejna xwe lihevhatî" bêhtir hez dikin. Ligor pisporan jinên ku bi kîlo û bejna xwe ve lihevhatîne bêhtir seksî ne.

Ligor lêkolîna Pispor û lêkolînerên Zanîngeha Newcastleyê, balkişandina jinan ne di lêvên qelew, sîngên sîlîkonî û kulîmekên girover de, lê di lihevhatin û lihevragirtina kîlo û bejnêde ye. Ligor lêkolîna pisporên Zanîngehê mêr di xwezayiya xwede ji jinên hinekî qelew û lihevhatî hez dikin û wan bêhtir diecibînin.

Xizmetkarên pêşerojê



PK (Navenda nûçan)-Ligor rojnama Asahî ya Japonî, jiber kêmzayîna zarokan û pîr û kalbûna civata Japonî,şirketên teknolojiyên Japonî dixwazin robotên xizmetkar çêkin da ku xizmeta pîr û kalan bikin. Ligor lêkolîna şirketa Toyotayê, herku diçe civata Japonî pîr û kal dibe û hewcedariya robotên xizmetkar zêdetir dibe. Ligor gotina şirketa Toyotayê wê ev robotên xizmetkar heta sala 2010an derkevin piyasê û ewê di xizmeta zarok û pîr û kalan de bin.

Berê kujtin, piştre jî sax kirin!

Zanyarên Amerîkî „kûçikê mirî" sax kirin.

PK - Xewn û xeyala sedê salan pêk hat û di zindîkirina miriyan de pêşketinên nedîtî pêk hatin. Zanyarên Navenda Lêkolîna Safar a bajarê Pîttsbûrgha Amerîkayê dan zanîn ku wan di rewşa klînîkî de kûçikek (se, sa) kuştiye û piştî 3 seetan dîsa ew zindî kiriye.

Bi vê teknîka ku bi "Suspend Anîmatîon – zindîkirina dirêjkirî" tê binavkirin, pisporan xwîna di damarên kûçik de valakirin. Damar bi ava şor û cemidî hatin dagirtin. Kûçikê ku êdî nema bêhn distend, dil lênedixist û hemi fonksiyonên mejiyê wî rawestiyabûn di rewşa klînîkî de êdî miribû. Germa bedena ku di normalê de 37 e daketibû 7 derecan. Piştî 3 seetan şorava di damarên kûçik de hat valakirin û xwîna wî dîsa li damarên wî hat vegerandin. Kûçikê ku dilê wî bi elektroşokê hat xebitandin, piştî kurtedemekê hat ser hişê xwe û zindî bû. Zanyarên Înstîtuyê jibo ceribandina liser mirovan jî lampeya kesk pêxist û dibêjin "nexweşên ku xwînê winda dikin wê bên "cemidandin" û piştre di demek destdayî de emê karibin wan zindî bikin".



Xwedîyê Rojnameyê Peyama Kurd Verlag | Editor: Ahmed Zeki Okcuoglu | Cîgirê Editor: Nizar Caf | Navnîşan: Peyama Kurd Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany | Fon: +49 (0228) 18 00 654 +49 (0228) 18 00 655 Faks: +49 (0228) 18 00 656 | www.peyama-kurd.com info@peyama-kurd.com | Edîtorî: Peyama Kurd xwe mafdar dibîne, ku nivîsên jê re tên şandin, kurt bike. Ew ji alîyê rêziman û rastnivîsînê de di serrastkirina berheman de azad e. Berhemên ku ji bo Peyama Kurdjê tên şandin herke li ciyekî din hatibin weşandin, nayên çapkirin.

Mesrefa dibistanê ji terekê derdixin



PK - Hinek zarokên Batmanî, di vê pêvajoya girtina dibistanan de, liser terekeyên (çopên) bajêr digerin, tiştên ku dikarin bifiroşin kom dikin û jibo derxistina mesrefa dibistana xwe difiroşin..

Zarokên Batmanî yên 14 salî A.S û Z.S li şûna ku piştî xwendina salane bêhna xwe vedin, ew 10 kîlometreyan derdikevin derveyî bajêr û li navenda terekê li metal, naylon û tiştên ku têne firotin digerin. Ew bi vî awahî dixwazin di komkirina mesrefa dibistanan de alîkariya malbatên xwe bikin. Zarokên bi navê A.S. û Z.S.dibêjin, „jiber aloziya aborî, em karekî din nabînin. Em jî tişt û miştên ku têne firotin ji nava terekê kom dikin û debara xwe pê dikin. Piştî du meh û nîvan wê dibistan vebin. Jibo me çente, defter û pênûr lazim in. Eger em kar nekin, em nikarin pêwîstiyên xwe yên dibistanê bi cî bînin. Rewşa me ya aborî ne baş e. Em ji mecbûrî vî karî dikin û em jiber karê xwe şerm nakin".

Ev 50 salin ku ew avê dikşînin



PK (Navenda nûçan) - Jinên gundê Katurkuyu yê girêdayî Swêregê, doza avê li Parêzgarê Rûhayê kirin.

Jinên ku li meydana gund dista avê kelandibûn û kinc dişûştin, li Parêzgarê Rûhayê rast hatin ku di wê demê de li gund digeriya û derdê xwe jê re gotin. Jinên gundê Katurkuyu ji Parêzgar Şemsettin Uzun re gotin ku ev 50 sal in, ew ava bîran dikşînin û hemû pêwîstiyên xwe bi wê pêk tînin. Êdî ew dixwazin dawî li vê eziyetê were û av were malên wan.

Ji nava koma jinan Zeynep Genel derdê xwe wiha anî ziman, "Av li gundê me tune ye, em 300 mirov li vir dijîn. Ev 50 sal in ku ava me tune ye. Em avê ji bîran dikşînin û ava bîran jî ne pak e.". Parêzgarê Rûhayê ferman daye wezîfedaran ku pirsgirêka avê li gundê Katurkuyu were çareserkirin.

Dîsa namûs û dîsa xwîn



Li Ruhayê, li gundê Incirliyê girêdayî navçeya Bozova bûyerek ku mirov di nav de wenda dibe pêk hat.

Ligor agahdariyan li gundê İncirli dilê Fatma Ö. û Ahmet Arslan dikeve hev (Ahmet Arslan zewiciye û bavê 4 zaroka ye). Piştî demekê Fatma Ö. û Ahmet Arslan, daxwaza xwe ya zewacê digihînin malbatên xwe. Di destpêkê de malbata Fatma Ö. li dijî zewacê derdikeve lê ew piştre bi navbeynkariya hinek rîsipiyan zewaca wan bi şertê ku berdêlî be dipejirînin. Li beramberî Fatma Ö.malbata wê keça birayê Ahmet Arslan ya bi navê Emîne Arslan ji kurê xwe Bilal Ö. re dixwazin. Daweta herdû cotan lidardikeve. Lê piştî dawetê bi demekê berdêla Fatma Ö. Emine Arslan, li odeya xwe mirî tê dîtin. Di dema lêpirsîna bûyerê de mêrê Fatma Ö. Ahmet Arslan jî di encama êrîşek çekdar de ji aliyê 4 kesan ve tê kuştin.

Malbata Arslan, van herdû bûyeran jî davêjin ser malbata Fatma Ö. Jiber ku di rewşek wiha de Fatma bixwe jî di nava xeterê deye, serdozgeriya Rûhayê biryara parastina wê daye. Tê gotin ku berî kuştina Ahmet Arslan bi 3 rojan, mala xezûrê wî ji gund reviyane. Du jin û 4 zarok li pey Ahmet Arslan man û jiyana du malbatan rûxiya. Sedem; adet û toreyên kevneperest in.



Xwedê ew ji qeda û belan sitirand, lê..!

Li Rûhayê mirovekî bi navê Zeki Sağıroğlu, jibo ku xwe ji qeda û belan bisitirîne qurbanek kir sedeqe. Sagiroglu erebeya xwe li kêleka rê rawestand û çû cihê serjêkirina qurban. Piştî ku vegeriya, dît ku kamyonek tijî çemento bi ser erebeya wî de qulipiye.

Ligor agahdariyan, ev qeza liser riya Rûha û Dîlokê çêbûye. Mirovê bi navê Zeki Sağıroğlu jibo ku xwe ji qeda û belan biparêze erebeya xwe ya bi pîlaka 63 PF 923 li kêleka rê rawestandiye û çûye cihê serjêkirina qurban.

Di vê navberê de, Kamyoneke tijî çemento li devera Akabê serberjêr dibe û kontrola xwe wenda dike. Frêna kamyonê diteqe. Şifêrê kamyonê jibo ku rê liber kambaxiyekê bigre berê kamyona xwe dide aliyê çepê û bi ser erebeya Zeki Sağıroğlu de tê xwarê.

Xwediyê qurbanê Zeki Sağıroğlu bûyerê wiha tîne zimên, "jibo ku ez xwe ji qeda û belan biparêzim min beranek kirî. Di dema serjêkirin û paqijkirina berên de min gurmîniyek bihîst. Dema ez derketim derve, min dît ku kamyonek bi ser erebeya min de ketiye. Şikir ji Xwedê re ku pozê kesekî jî bi xwîn nebû".

Ev du sal in, ew liber ronahiya findê dijî

PK - Li herêma Serhedê li bajarê Ixdirê, xanimek bi navê Guzel Tekin (33) berî HYPERLINK „http://www.yesiligdir.com/modules.php?name=News&new_topic=17" 4 salan ji aliyê hevserê xwe ve ligel 6 zarokan hat terikandin. Hevserê wê careke din venegeriya. Jiber ku deynê wê yê ceyranê gihîşt 6 milyaran, ceyrana mala wê hat birîn û ev 2 sal in ku ew li ber ronahiya findê dijî.

Ew 17 salan li gel hevserê xwe ma û berî 4 salan hat terikandin. Ew ligel 6 zarokên xwe, bi alîkariya cîranan dijî û li beramberî xizaniyê li ber xwe dide. Ji devê xwe kêm dike û 5 zarokên xwe dide xwendin.

Liser rewşa xwe ya kambax, Güzel Tekin wiha diaxive, "hevserê min berî 4 salan, terka min û zarokan kir. Ez wê demê ducan bûm. Min bi paqijkirina malên xelkê û tevrikê debara xwe dikir. Îsal ji ber nexweşiyê min nikarîbû ez bixebitim. Li mala min ne televizyon heye û ne jî sarinc. Bi carekê de 600 milyon pereyê ceyranê hat, min nikarîbû bidim û ew giha 6 milyaran. Ev du sal in ez û zarokên xwe li ber ronahiya findan dijîn. Em li hêviya alîkariya xêrxwaza ne".

www.arsiv.com



gotin
Ahmed Zekî Okçûoglû

Kurdistan hatiye parçe kirin, lê doza Kurdistanê yek e

Jiyana me ya tekoşînê, carek din jî îspat kir ku teoriya "perçe perçe çareserkirina pisgirêka Kurdistanê" şaşe. Jiber ku "pirsgrêkên Kurdistanê" nînin, "pirsgirêka Kurdistanê" heye. Kurdistan hatiye perçekirin, lê pirsgirêka Kurdistanê yek e.

Ji ber vê yekê, hemû dagirkerên Kurdistanê, bi taybetî jî Tirk, tim, ne bi tenê li parçeyê Kurdistanê yê ku di bin dagirkeriya wan de ye, lê li hemû parçeyên Kurdistanê, li dijî neteweparêziya kurdan radiwestin. Dîsa ji ber vê yêkê ye ku Tirk û dagirkerên din bi yekdestî nahêlin ku li başûrê Kurdistanê Kurd bigihên mafên xwe yên mirovî û netewî.

Dagirker geleki baş dizanin ku heke Kurd li başûrê Kurdistanê bigihên mafên xwe, ev bi wê derê re bisînor namîne, agirê başûr wê hemû derên Kurdistanê bide ber xwe. Ji ber vê yêkê hemû bi yekdestî hewl didin ku agirê li başûrê Kurdistanê geşbûye vemirînin.

Lê ew jî baş dizanin ku ev kar li başûrê Kurdistanê êdî ne weke berê hêsan e. Ji ber vê yêke jî li dijî kurdan girêdayî senaryoya berê, yeke nû jî xistin rojevê. Ev jî ev e: "federaliya wîlayetan".

Weki ku tê zanîn federaliya wîlayetan ji bo Kurdan mafê herî nizm e. Dagirker dixwazin bi riya vê yekê netewebûna kurdan, îradeya wan ya siyasî û di rastiya xwe de Kurdistanê û doza Kurdistanê tune bikin.

Hemû dagirker vê diparêzin. Ji bilî wan, Emerîka û Ingîlterê jî heya niha bi awayekî fermî piştgiriya vê senaryoyê kirine. Di nava hemû perçeyên Kurdistanê de jî hêzeke pir xurt piştgiriya vê projeyê dikin. Ya herî girîng ewe ku serokê Yekîtîya Niştimanê Kurdistan Celal Talabanî pir vekirî vê senaryoyê diparêze. Lê aliyê dinjî piraniya gelê Kurd û li li başûrê Kurdistanê jî serokê (hêza herî xurt) Partiya Demokratî Kurdistanê Mesûd Barzanî jî bi awayekî vekirî li dijî vê senaryoyê radiweste. Ji helwesta Mesûd Barzanî geleki eşkere diyare ku ji bo pêkanîna vê senaryoyê divê Mesûd Barzanî û hêza wî bê perçiqandin û jiderveyîkirin. Dagirker çiqasî biparêzin jî, di rewşa îro de mirov dikare bibêje ku ev îhtîmal ne mimkûn xuya dike.

Di rewşa îro de pir li dij bin jî, bi gotineke din, xwe li dij bidin xuyakirin jî, bi ya min dagirker (Tirkiya, Îran, Surî) hesabê hinek senaryoyên din jî dikin; ev senaryo jî federaliya etnîki/cografi, heta Kerkûk jî tê de Kurdistanek serbixwe ye. Lê bi mercekî... dest berdana ji perçeyên Kurdistanê yên dinê...

*

Di 1971ê de li wargeha (kamp) me ya başûrê Kurdistanê, Dr. Şivan ji min re qala gotineke pêşewayê mezin Mustafa Barzanî kiribû: Rêvebirên Tirkan pêşniyarekê dibin jê re û dibêjin: "Tu li başûrê Kurdistanê dewletek serbixe ava bike. Emê jî piştgiriya te bikin. Heta emê li derdora sînor ji erdê Hekarî, Sêrt û Mêrdinê hinek ax jî bidin te. Lê li hemberî vê jî divê tu dev ji axa Kurdistana Tirkiyê berdî û vê yekê bi awayekî fermî belênî (taahut) bikî."

Barzanî vê teklîfa tirkan red dike. Binasî (gerekçe) ya wî jî ev e: "Spas. Lê ez ne ji bo Kurdistaneke serbixwe, lê ji bo mafê otonomiyê di nava sînorên Îraqê de şer dikim û derveyî vê daxwazek min nîne."

Di wê rewşê de jî bo ku xwe ji lîstika Tirkan biparêze, ji bo Barzanî îmkana gotineke dinê tune bû. Di wan rojan de rewşa dinyayê û rewşa Barzanî dest nedida ku ji bo Kurdistana navend daxwazekê bîne ser zimanê xwe. Lê, ixaneta wê jî nekir. Bêguman di şikestina şoreşa Barzanî de para vê helwestê jî heye. Tirkan geleki baş dizanibûn ku heke Barzanî li Iraqê biserkeve, roja dinê wê dest bavêje Kurdistana navend jî.

Yek jî helwesta Emerîka û rojavajiyên din e bêguman...

Peymana Lozanê têkçûye rast e. Lê divê em ji bir nekin, li dijberê Lozanê Sevr heye.

Di peymana Sewrê de ji doza Kurdistanê, bi başûrê Kurdistanê ve hatibû girêdan. Û ne hemî erdê Kurdistana Navend(bakur), lê nêzîkî 4/1ê Kurdistanê di nava sînorê Kurdistanê de cih digirt. Beşê dinê dabûn Ermen û Tirkan.

*

Ez bawerim ku kurê Mistafa Barzanî, Mesut Barzanî jî li hemberî pêşniyareke weha, bêguman wê bide pey şopa bavê xwe.

Lê, li dijî dagirkeran ew heya ku dikare liberxwe bide, ew jî tiştekî dinê ye. Mesûd Barzanî liberxwe bide jî, li hemberî hinde hêzan gelo mimkûne ku bi tena serê xwe biser bikeve?..

Divê Kurd carek din dîrokê bixwînin û gavek pêş de hêzên xwe xurt bikin. Hêza herî mezin jî siyasetek neteweparêza rast e.

Têbinî: Hejmara berî vê min du nivîsar nivîsandibûn. Lê di binê nivîsarekê de (Kemal Burkay Li cemser rê şanî Kurdistanê dike) imza min derneketiye. Li min biborînin.

Sûcdarên Stenbolê ne zarokên Kurd in

Parêzgariya (Walî) Stenbolê liser zarokên ku beşdarî pêkanîna sûcan dibin, lêkolînek çêkir û di encama lêkolînê de da zanîn ku piraniya zarokên sûcdar ne Kurd in û şaşe ku mirov bibêje zarokên Kurd bêhtir beşdarî kiryarên neyasayî dibin.

Ligor lêkolîna parêzgariya Stenbolê, zarokên ku qeyda nifûsa wan liser herêmên Marmarayê ye, bêhtir beşdarî kiryarên neyasayî dibin. Îsal heta 31ê Gulanê, 6 hezar û 94 zarokan kiryarên neyasayî kirine. Ji sedî 24ê van zarokên ku li Stenbolê ev kiryar kirine, ji herêma Marmarayê ne.

Piştî zarokên ji Marmarayê, zarokên Kurd di rêza diwemîn dene û ew ji sedî 22 ne. Zarokên ku ji Rojhilatê Enedolê çûne Stenbolê û beşdarî van kiryarên neyasayî dibin ji sedî 20 in. Zarokên Ji aliyê Behra Reş ji sedî 18 ne, yên ji Enedola Navîn ji sedî 11, yên ji Behra Spî ji sedî 3 û yên ji Egeyê jî ji sedî 2 ne.

Ligor lêkolîna Parêzgariya Stenbolê, zarokên ku beşdarî kiryarên neyasayî dibin, di aliyê perwerdeyê de jî gelekî lipaş in. Ji sedî 62 zarokan dibistana seretayî qedandine, yan jî berî ku temam bikin jê derketine. Ji sedî 24 zarok nexwende ne û ji sedî 14 zarokan jî heta bi lîseyê xwendine.

Sûcên ku ji aliyê van zarokan ve tên kirin wiha hatine rêzkirin. 508 bûyerên dizîkirina ji cihê kar, 492 bûyerên xapandin û diziyê, 461 bûyerên birîndarkirinê, 372 bûyerên lêdanê, 349 bûyerên diziya erebeyan, 290 bûyerên şelandinê, 239 bûyerên diziya ji malan , 175 bûyerên bêdestûr bikaranîna erebeyan yan jî serxweş ajotinê, 173 bûyerên diziya çenteyan û 114 bûyerên revandinê.

Hevkariya Komelên Êzîdiyan li Almanyayê serokkomariya Mesûd Barzanî pîroz kirin.

Jibo
Serokkomarê Kurdistanê Serok Mesut Barzanî!

Hewlêr
Kurdistan
Almanya, 27.06.2005

Birêz Serokkomarê herêma Kurdistanê Mesut Barzanî!

Me axavtina cenabê te Kek Mesut Barzanî, Serokkomarê Kurdistanê, zindî gohdarî kir. Cenabê te di vê axavtina piştî sondxwarina jibo serokkomariyê li parlementoyê de rêya serketina welatê me Kurdistan di hemî warê jiyanê de ronahîtir kir û rêberiyeke gewretirîn da destên netewê Kurd.

Em Êzîdiyên li Almanyayê bi axatina cenabê te dilxweş û serbilind bûn. Cenabê tê giringiya me Êzîdiyan jibo netewê Kurd anî ser zimên û serê me di nava civata Kurd de bilind kir: „Birayên me yên Êzidî Kurdên resen in, ew bê teqsîr beşdar bûne di xebata neteweya xwe de û wan cihê xwe di nav dilê miletê Kurd de girtiye û wan mezintirîn derece û rêz heye."

Piştî axavtina cenabê te ya dîrokî Êzîdiyên li Almanyayê bi telefonan, bi naman dilxweşiya xwe jibo gotinên te şanî dan û ji me daxwaz kirin, ku dilxweşîya wan bigihînin Hewlêrê. Em bi navên xwe, bi navên Êzîdiyên li Almanyayê serokkomariya cenabê te Kek Mesut Barzanî cardin pîroz dikin!

Hevkariya Komelên Êzîdiyan li Almanya:

Mala Êzîdiyan li Oldenburgê; Komela Êzîdiyan li Leerê; Bingeha Êzîdiyan li dervey welat; Komela Êzîdiyan li Bergenê; Platforma Êzîdiyên Cellê û Komela Êzîdiyan Hasselt-Kalkar



Tenduristiya penaberên ku di greva birçîbûnê de ne xirab dibe



PK (navenda nûçan) - 80 penaber berê 31 rojan, liber avahiya Neteweyên Yekbûyî dest bi grewa birçîbûnê kir. Penaber greva xwe ya birçîbûnê di malên xwe de berdewam dikin. Ji penaberên di grevê dene, 3 ji wan jixwe çûne û rewşa wan a tenduristî nebaş e. Penaberên ku di greva birçîbûnê de ne dixwazin ku rayedarên Neteweyên Yekbûyî û welatên demokrat xwedî li wan derkevin.

80'ê Penaberên kurd ên Îranê di sala 2001'an de ji Îranê derbasî Iraqê bûne û ji wir jî derbasî Tirkîyeyê bûne. Li gorî zagona Neteweyên Yekbûyî (YE) penaberê ku mafê hewandinê standibe, di nava 6 mehan de, dikare derbazî welatekî 3'yêmîn bibe. Digel ku salek di navberê de derbaz bûye jî, penaberên li Wanê naşînin welatekî din. Li Tirkîyeyê hezar û 200 penaberên din jî yên di heman rewşê de hene.

Li Kurdistanê Êşkence berdewam e



PK - Di Roja Navnetewî ya Piştgiriya Kesên Êşkencekirî de, diyar bû ku hikûmeta AKP, weke ku dibêje rê liber êşkencê negirtiye. Di sê mehên destpêkê yên sala 2005an de 448 kesan êşkence û cezeyên nemirovane dîtine. Ligor rapora Komeleya Mafên Mirovan 67 kes di bin çavan de hatine êşkencekirin û 83 kesan jî li derveyî cihên binçaviyê êşkence dîtine. Rapor balê dikşîne ser rastiyekê ku hinek caran tê veşartin û dide zanîn ku li Kurdistanê êşkence bi hemû awayên xwe hîna jî tê kirin. Baroya Amedê, liser vê mijarê bi navê „Li Tirkiyê êşkence û awayên têgihiştina wê ya civakî" semînerek pêşkêş kir. Di semînerê de hat gotin ku êşkence nexweşiyeke.

Hikûmeta AKP, di tevayê hevdîtinên ligel Ewrûpiyan de soza pêkanîna ktîterên demokrasiyê dide û dibêjin ku ewê jibo êşkencê „Sıfır toleransê" nîşan bidin. Lê ligor rapora IHD pirsgirêka êşkencê hîna jî li Tirkiyê nehatiye çareserkirin û ew bi her awayî tê kirin. Bi munasebeta 26ê Hezîranê (Roja Navnetewî ya Piştgiriya Kesên Êşkencekirî) Komeleya Mafên Mirovan İHD, raporek belav kir û radeya êşkenceya ku dibe raxist ber çavan. Ligor raporê, di sala 2004an de li Tirkiyê 843 kesan di dema binçaviyê de êşkence dîtin û ev rastî di sala 2005an de jî nehat guhertin.

Di sê mehên destpêkê yên sala 2005an de 448 kesan êşkence, heqaret û muameleya xerab dîtine. Ji van mirovan, 67 kes di bin çavan de û 83 kes jî li derveyî cihên binçaviyê yên fermî hatine êşkencekirin. 2 kesji aliyê parêzvanên gundan ve hatine êşkencekirin û 110 kes jî di zîndanan rastî êşkencê hatine. Ligor raporê, 15 kes li dibistanan bûne armanca dijwariyê û 105 kes jî di xwenîşandanên civakî de birîndar bûne.

Li Kurdistanê êşkence berdewam e

Ligor seroka IHD ya şaxê Stenbolê Eren keskîn, li Tirkiyê êşkence siyaseta desletê ye. Keskîn vê yekê wiha tîne zimên „Di dema derbasbûyî de, êşkenceya ku şopa wê bimîne dihat kirin, lê êşkenceya ku niha tê kirin zêde şopê lipey xwe nahêle. Di dema niha de, li şûna êşkenceya ku şopa wê bimîne, awayên weke porkişandinê û tehdîdkirina bi tecawizê tên bikaranîn. Jiber vê yekê mirov nikare bibêje ku êşkence li Tirkiyê nemaye. Gotina ku dibêjin li Tirkiyê jibo êşkencê sıfır tolerans gotinek vala ye." Eren Keskîn balê dikşîne ser rewşa Kurdistanê û dide zanîn ku radeya êşkenceyê li wir ji berê zêdetir bûye. Keskîn dibêje "Li wê herêmê hîna jî di bin navê şer û pevçûnan de çavên mirovan tên derxistin û guhên wan tên birîn. Li cihê ku bûyerên wiha lê diqewimin, mirov çawa dikare bibêje êşkence nemaye".

Xanim Keskîn balê dikşîne ser pirsgirêka delîlên êşkenceyê û dibêje, „Eger Tiba Edlî di raporên xwe de nepejirîne ku we êşkence dîtiye, hûn dikarin mexdûriyeta xwe bidin qebûl kirin. Lê wek tê zanîn Tiba Edlî saziyeke dewletî ye. Pêwîste raporên saziyên din jî weke delîl bên pejirandin."



mirovane

Av. Eren Keskin

Pêwîstbû bang jibo Serleşkeriya Gişti ba

Di van rojên dawî de, naveroka banga ku ji aliyê 150 rewşenbîrî ve li PKK hatibû kirin, pir tê gotûbêjkirin. Di wê bangê de ji PKK tê xwestin ku ew bê şert û şirût dest ji çekan berde û dewlet jî hinek guhertinên yasayî pêk bîne.

Ez nêta wan rewşenbîrên ku bang îmze kirine, nakim mijara gotûbêjê. Ez dizanim ku gelekan ji wan di nava tekoşîna demokrasiyê de, berdêlên mezin jî dane. Lê ez di wê baweriyê de me ku naveroka bangê pir şermezar û kêm bû.

Cihê mixabiniyê ye ku li Tirkiyê helwestek rewşenbîrî, ya ku bi rastî li dijî sîstemê ye û serî li dijî militarîzmê hildide çênabe.

Bêguman, gelek sedemên vê yekê hene. Totalîtarîzm, bi riya çewisandina ku liser mêjiyê mirovan dike, amûreke oto-kontrolê licem xelkê çêdike.

Dewleta Komara Tirkiyê, ji roja ku avabûye û heta niha, siyaseta stemkariyê li dijî Kurdan pêk tîne. Kurdistan, herdemê bi hiqûqek cuda hat birêvebirin. Yasayên wek, Qanûna Tuncelî, Qanûna İzale-i Şekavet, Biryarnameyên Sirgûn û Sansûrê, Zagonên Rewşa Awarte û yên din, bi taybetî jibo Kurdan hatine derxistin.
Di pêkanîna van yasayan de, herdemê zor û stemkarî hatiye bikaranîn.

Xala bingehîn ev e; eger mirov sedemên pirsgirêkan yên civakî û aborî ji holê raneke, daxwaz û bangên rewşenbîran yên nîvçe têra çareseriyê nakin.

Bêgûman, pir girînge ku rewşenbîr li dijî şer derkevin. Beriya salan, dema ku Kurdistan di nava agirê şer debû, dema ku Şirnex hat şewitandin, Licê hat bombebarandin, dema ku Fikrî Ozgenê 73 salî bi îşkencê hat qetilkirin, dema ku K.O (55) hat tecawizkirin, hejmara rewşenbîrên bi helwest ne 150, lê belkî ne 15 bû jî.

Helwesta dewletê ya sîtemkar qet nehat guhertin. Dewletê zordariyek bêhempa dikir û li dijî xwe jî şîdetek ku bikaribe kontrol bike, dixwest. Jiber ku militarîzm xwe bi zordariyê xwedî dike. Li Tirkiyê, militarîst di heman demê de xwediyê sermiyanekî mezinin jî. Ew baş dizanin ku nakevin çarçoveya lêpirsînê, jiber vê yekê jî rehet in.

Ez jî weke parêzvanek mafên mirovan dixwazim ku çek rawestin. Heta ez di wê baweriyê deme ku êdî dewrana şerên çekdarî derbasbûye. Lê ez dibêjim, eger ku jibo rawestandina şer bangek pêwîst be, lazime ew jibo aliyê dewletê yê militarîst ango Serleşkeriya Gişti bê kirin.

Di rojên borî de, li Wan û Diyarbekirê jibo cenazeyên gerîla bûyer derketin. Ka em hinekî bifikirin, eger tu rabî cenazeyê miroveki ku liber dilê komekê şêrîne, bê guh û çav, bê dest û ling teslîmî wê komê bikî, wê ew mirov çi bikin? Eger em li dijî şîdetê bin jî, di navbera me û wê de xeteke pir zirav heye. Tiştê bingehîn ewe ku mirov li dijî van bûyerên hovane yên bi vî awahî derkeve ku ew hesta şîdetê ligel kom û kesayetan dide pêş.

Hefteya borî, hevalê me yê xoşewîst Erdogan Aydin di bernameyek Roj TV de rastiyek pir balkêş anî zimên. Wî got pêwîste em wek rewşenbîr bikaribin ji wê dewletê bixwazin ya ku em bi wê re di nava pêwendiyek hiqûqî dene û em baca xwe didinê. Ez di wê baweriyê deme ku ev gotin, rastiyek pir di cî deye. Bi tenê jiber vê sedemê be jî, ez dibêjim pêwîstbû banga rewşenbîran, jibo hêzên dewletê bûya.

www.arsivakurdi.org



birayetî

Bayram Ayaz

Pirsa Kurdistanê, rojeva navnetewî û projeyên dîrokî yên Amerîkayê

Hefteya buhurî li Brukselê Konferensa Iraqê lidarket. Ji medya Kurdî Peyama Kurd li wê derê bû. Ew Konferens jibo projeyên avadaniya Kurdistanê, Iraqê û bi tevayî jibo prosesa guherînên li Rojhilata navîn gelek girîng bû.

Carna mirov dibê, gelo dîrok xwe dubare dike! Hewldanên nuha jibo Iraqê û herêma Rojhilata navîn tên kirin û karên ku piştî şerê duyemîn jibo Ewrûpa hatine kirin, gelek dişibin hev. Dema mirov Doktrîna Truman û Plana Marshall dixwîne û hewldanên evro yê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê jibo Rojhilata navîn muqeyese dike, dibîne ku armanca sereke yek e. Di herdûyan de jî armanceke siyasî global heye û jibo serkevtina vê armancê programa avadaniyê hatiye amadekirin.

Bi Doktrîna Truman Amerîkayê xwestiye pêşî li tevgera komunîst bigre. Bi Plana Marshall jî piştî şerê cîhanê avadaniya welatên Ewrûpayê plankirine. Navê vê planê ya fermî, Programa Pêşxistina Ewrûpayê ye. Doktrîn û plan hev temam dikin.

Nuha pirs çiye? Piştî rûxandina sîstema sosyalîst tesîra tevgera komunîst nema. Îro metirsî neleheviyên nabeynxmedeniyetan e ya ku bi reng û motîvên olî rûdidin. Ligor gelek bîrewer û siyasetvanên Amerîkayê tevgera îslamî ya fanatîk tehlûkeyek mezin e. Li cografiya "kembera kesk" tovên vê tehlûkeyê her diçe zêdetir serî dide. Zilma rejîmên otorîter û teokratîk li van deveran dihêle ku nêrînên îslamî-fanatîk di nav gelan de cîh bigre. Jiber ku ev rejîm di dema şerê sar de piranî hevbendên Amerîkayê û dewletên rojava bûn, hêzên îslamî-fanatîk dikarin bi hêsayî xerabiyên van rejîman bi Amerîkayê ve girêdin û li dijî Amerîkayê propagandayek bi tesîr bikin. Amerîka dixwaze pêşî li vê yekê bigre.

Çareseriya vê metirsiyê azadî, demokrasî, bihêzkirina civakek sivîl û bendewariya aborî ye. Nexşeyên siyasî yên globalîzmê jibo Rojhilata navîn ev in. Di warê aborî û stratejîk de jî helbet hesab hene. Kontrola bazarê, petrolê û avê bêguman pirsên sereke û stratejîk in.

Îro li Rojhilata navîn siyaseta Amerîkayê û doz û daxwazên tevgerên azadîxwaz û demokrat lihev tên. Hevbendî û hevkariya bizava azadîxwaza Kurdistanê û Amerîkayê bûye pêdiviyek objektîf. Li başurê welatê me serkirdeyatiya tevgera Kurdistanê plan û programa xwe zelal kiriye. Jiber vê yekê ew êdî bûne parçeyekî ji plana global û jinûveavadaniya Kurdistanê, Iraqê û Rojhilata navîn. Giraniya wan heye û ew rola xwe serkevtî bicîh tînin. Rûmeta bizava başurê welatê me di asta navnetewî de helbet jibo tevayiya gelê Kurdistanê destkevtinek mezin e. Jiber vê yekê Dewleta Kurdistanê jibo hemî Kurdan bûye navenda siyasî-nefsî.

Di asta navdewletî de rewşa tevgera Kurd li parçeyên dî xerab e. Halê tevgera bakurê Kurdistanê ya herî jihevketî ye. Li bakur hêj piraniya Kurdan di rêza kemalîstan, çepan û ultra nasyonalîstên Tirkan de dijminahiya Amerîkayê dikin. Ev xerabiyek herî mezine ku bi tevgera azadîxwaza Kurd dibê.

Tevgera bakurê Kurdistanê pêwiste di zûtirîn demê de xwe ji vê kambaxiya siyasî û fikrî rizgar bike. Siyasetek netewî hevbeş ku bi siyaseta Amerîkayê re hevaheng be, dîyar bike. Hêj gelek siyasetvan û rewşenbîrên me bi bîr û hizrên dema şerê sar difikirin û hereket dikin. Jibo vê yekê jî di asta navnetewî de ti giraniya tevgera bakur tune. Mirov bi vê yekê diêşe. Em bakûrî divê destê xwe hinekî bilez bigrin. Gilî û gotin ne bes in. Ji welat divê deng derkeve. Dîaspora jî xwe bilivîne.

Celal Talabanî dilê dijmin hênik kir:

„Tirk li pişta me ne“



Di 25ê mehê de di rojnameya Tirk Akşam de hevpeyvînek rojnamevan Husnu Mahalli ku bi dijminatiya xwe ya dijwar li dijî Kurd û Kurdistan tê naskirin, bi Serokkomarê Iraqê Celal Talabanî re hat weşandin. Di vê hevpeyvîna xwe de Talabanî liser rewşa Kurdistanê û Iraqê, şerd û mercên herêmê ramanên xwe yên ku rojnamevan Mahalli kêfxweş û bextewar bike tîne ser zimên. Mahalliyê bi dijminatî ya Kurdan ve tê naskirin û ji terorîstên ereb re dibêje "berxwedêr", Amerikayê bi dagirkerî û emperyalîzmê, Kurdan jî bi "xulamtî" û "hevkariyê"tawanbar dike pir bi rehetî xwe digihîne Celal Talabanî û bi peyvên ku ji devê Talabanî werdigre her carê avê liser dilê dagirkerên Kurdistanê dike, lê hevî û xeyalên gelê Kurd dişkênîne.

Rojnameya Akşam axaftinên Talabanî weha dinirxîne: "Ligor Talabanî xeyala Kurdistana serbixwe bi hilweşandina Sedam re bi dawî hat. Di rêvebiriya Iraqê de şirîkatiya Kurdan, jiber ku girîngtirîn serokekî Kurdan bû serokkomarê Iraqê dawiya xewna Kurdistanê anî."

Talabanî fikirên xwe yên di derbarê Tirkiyeya ku mezintirîn perçeyê Kurdistanê dagir kiriye weha radixe ber çavan: "Li pişt şiiyên Iraqê, Îran heye. Yên sunniyan welatên Ereban hene. Ya me jî Tirkiyeya me heye, divê hebe."

Talabanî pirsa, "Li seranserê Iraqê di mijara federalîzmê de lihevkirinek tam heye?" weha bersîv dide: Heman hemû Iraqiyan di vê mijarê de li hevdu kirine. Federalîzm êdî ne tenê xwestikek Kurdan e, Erebên şiî jî vê daxwazê dikin. " Talabanî bi berdewamî eşkere dike ku di derbarê federalîzmê de fikir û niqaşên nû jî derdikevin holê û hin kes dixwazin ku herêmên federal divê ji hikûmeta navendî bihêztir be. Ango divê rêvebiriya herêmî biryar bide da ji dewlemendiya xwe ya xwezayî wê çiqasî bide hikûmeta navendî.

Bi berdewamî Talabanî pirsa liser bingehê federalîzmê dibêje: "Herkesî li hevdu kiriye ku federalîzm divê ne etnîkî û mezhebî, lê cografî be. Ya girîng ew e ku di navbera hemû Iraqiyan de wek di vê mijarê de, di hemû mijaran de konsensusek heye. Ne bi tu awayî piranî divê îrade û fikirên xwe yên mitlaq liser hindikayiyan ferz neke. Civaka Iraqê vêya qet qebûl nake."

Rojnamevan Husnu Mahalli di hevpeyvîna xwe de her hewl dide ku peyvên bi xweşa wî û dewletên dagirker ve biçin ji devê Serokkomarê Iraqê û Sekreterê Yekîtî Niştimanî Kurdistan Celal Talabanî bigire û di vê merame xwe de bi zêdeyî biserdikeve. Mahalli dipirse: We bi salan jibo îdealên Kurdan têkoşîn kir. Lê îro hûn serokkomarê Iraqê ne. Çi bi îdealên dewleta Kurd ya serbixwe hat? Talabanî wek ku li Iraqê Tirkmen û Aşûrî, li Tirkiyê Laz û Gurcîyan naveroka têkoşîna gelê Kurd teng dike, dadixe sewiya mafên gelekî biçûk ku nikare "otonomî" jî daxwaz bike û wiha bersîv dide: " Ji zarokatiya xwe û virde ev 58 salin ez di nav têkoşîna polîtîk de me. Di temama pêvajoya jiyana xwe de min berê jibo Iraqek demokratîk û azad û piştre ji bo mafên gelê Kurd têkoşîn da. Ango wexta min têkoşîna mafê çarenûsî didomand, min wek ferdî tu carî liser veqetandina Kurdistanê ji Iraqê an dikare vebiqete nefikirîm û min neparast..." Bi berdewamî Talabanî tezên welatên dagirker dipejirîne ku gelê Kurd jiber sedemên cografîk nikare dewleta xwe ya serbixwe damezirîne. Talabanî xewn û xeyalên dişkîne û dibêje: "Ev xewna ku ez li vir behsa wê dikim ne xewna hissî ye ku hin helbestvan û neteweparêzên Kurd bi deng dikin. Jiber ku xewnên weha ne realîst in û ji pratîkê dûr in. Em ferz bikin ku dewleta Kurd hat damezirandin. Başe wê çawa bijî? Ev dewleta ku Sûriye, Tirkiye, Îran û Iraq li dij radibe wê çawa bijî? Ev dewlet ger erîşî dewleta Kurd ya wê bê damezirandin nekin jî, karin wê bifetisînin."

Husnu Mahalli liser bingeha dijminatiya Kurd rojnamevaniyê dike û kengî dixwaze xwe digihîne Celal Talabanî û dipirse: "Şirîkkirina Kurdan ya siyasî jibo îqtidara li Bexdayê, ligor we bû dawiya xewna Kurd? Talabanî bersîv dide: " Ev bi temamî rast e. Jiber ku Kurdan cara yekem fêm kirin û dîtin ku di dereceya yekem de hemwelatiyê Iraqê ne. Niha herkes bi Iraqîtiya xwe serbilind e..."

Peyamên ku Talabanî ji Tirkiyê re dişîne balkêş in, wek mînak: "Li pişt şiiyên li Iraqê Îran heye. Yên sunniyan welatên Ereb hene. Ya me jî Tirkiyeya me heye û divê hebe."

Diyare ku Celal Talabanî gelek caran jibîr dike ku li Bakurê Kurdistanê bi kêmanî 20 milyon Kurd hene û wexta dixwaze dilê Tirkiyê xweş bike, jibîr dike ku ew ne xwedî mafe ku bi zimanê dagirkirên Tirk biaxive û bi xeyalên gelê Kurd bilîze!

www.kurdi.org

Gelo Atatürk ajanê Ingilîzan bû?

Di 27ê Hezîranê de Neşe Duzel di rojnameya Radikalê de hevpeyvîna ku liser serûbinkirina dîrokê bi mamosteyê Universîteya Bilgi, Aykut Kansu re kiribû, weşand. Berî reportajê rojnamevan Duzel armanca vê hevpeyvîna xwe weha dinirxîne: "Çiqas zordarî bê kirin bila bê kirin temenekî derewan jî heye. Gava temen bi dawî hat, civat dest bi miraqkirina rastiyê dike. Liser derewan nîqaş destpêdike. Tirkiyê bi salan dîroka xwe ya nêzîk ji gelê xwe veşart. Em bê ku rûyê rast yê Sariqamişê, trajediya (fecia) Ermenî, Şerê Balkan nasbikin mezin bûn..

Di vê hevpeyvînê de Aykut Kansu di derbarê Kemalîzm û Îttihatçiyan de ji dervî îdeolojiya fermî, hin ramanên nû, tezên ku dîroka resmî derewîn derdixe tîne zimên. Kansu, pirseke di derbarê mijara Ermeniyan û Îttihatçiyan bersîv dide ku dîroknas dîroka Osmaniyan heta sala 1923an tînin û dibêje: "Heçku dema Îttihatçiyan ya salên 1908-1918an demeke ku qet bi dîroka Osmaniyan re nelihev e. Ji me re bi sala 1908an behsa îlankirina Meşrûtiyeta duwem dikin. Lê behs nakin ku dewrek nû vebû, li Tirkiyê nîzamek makeqanûnî hat damezirandin, siyaseta aborî û civakî lîberalîze bû. Jiber ku di eslê xwe de 1923, ji hemû van azadiyan û serdestiya parlamentiyê şûnda veger e.

Kansu bal dikşîne ser nakokiyên Îttihatçiyan, Kemalistan û vê yekê wek sedemek veşartina dîroka nêzîk ya Tirkiyê dinirxîne. Kansu dibêje: " Kemalîstan di destpêka 1923an de biryara hilbijartinek ku ji derwî wan tu kes nikaribin beşdar bibin, distînin. Îttîhatçî tên asteng kirin. Jixwe di 1926an de Doza Sûîkasta Îzmîrê dibe mahkemeya darizandina Îttihatçiyan. Balkêşe ku di mahkemeya ku bi sûîkastkirina Ataturk tên sûcdar kirin, di derbarê sûîkastê de ji wan re yek pirs jî nayê kirin. Ji wan re pirsa, "Jibo çi hûn dixwazin siyasetê bikin" tê kirin. Piştî darizandinan gelek Îttihatçî mehkûm bûn. Cavit Beg hat îdamkirin. Sebeba vê dozê bi awayekî fizîkî ji holê rakirina mixefeleta ku heta niha li Tirkiyê bi hêz e."

Di Eynî mehkemê de darizandina Kazim Karabekir, Kansu bi nakokiyên di navbera Ataturk û hevalên wî de dinirxine û radixe ber çavan. Bi berdewamî Kansu dibêje: "Kazim Karabekir û Ataturk di salên 1920an de ji hevdu dûrdikevin. Ataturk kengî dikeve tengasiyê girtina meclîsê tîne bîra xwe. Vêya incex bi pejirandina generalên wek Karabekir û Înonu dikare bike. Inonu bersîvek ne zelal dide. Karabekir dibêje, 'Ger meclîs bê girtin, ezê bêm Ankarê û vekim.' Ji Ataturk nayê ku meclîsê bigire. Hîn ew deman herdu teref jî dizanin ku, yek bi serdestiya meclîsê re ye, yê din di rewşên awarte de bi girtina meclisê û sazkirina rejîmek otorîter re ye."

Bi berdewabî Kansu dubare dike ku piştî sala 1923an li Tirkiyê rejîmek parlamenter nîne û qebûlkirina makeqanûna 1924an weha şîrove dike: "Piştî hilbijartinên 1923an Kemalîst li meclîsê ji sedî 50 bidestdixin. Ev, jibo guherandina makeqanûnê têr nake. Kemalîst dixwazin ku makeqanûnek destûra dîktatoriyek şexsî dide çêbikin. Lê yên ne Kemalîst vêya dikin makeqanûnek lîberal."

Kansu dibêje, Îttihatçî mirovên nîzama kevn yên ku jibo gîhandina armancên wan astengbin, ger bi tehdîdan nebe, bi komployan windadikin. Îttihatçî piştî bidestxistina îqtidarê wan kesên ku karin derbekê li wan bixe, ger nikaribin mehkeme bikin, bi sûîkastan dikujin. Di mijara fermana Ermeniyan de Kansu pêwendiyên Kemalîstan û Îttihatçiyan radixe ber çavan û radihihîne ku Kemalîst nikarin li dijî kiryarên Îttihatçiyan dervevin, " Jiber ku hin kesên di van bûyeran de cîh girtine piştre ketine nav Kemalîstan. Siyasetçiyê muteber yê piştî salên 1923an Wezîrê Karê Hundir Şukru Kaya, di wê demê de serokê mesûlê beşa burokratîk ya fermana Ermeniyan, Midûriyete Giştî ya Muhaciran bû.

Ligor Kansu jiber ku şerê cîhanî yê yekem hewldana parvekirina erdên ku di dest Osmaniyan de bû, dewleta Osmanî ligel Almanan mecbûr bû beşdarî şer bibe. Ligel vê rastiyê Kemalîst û dîroka resmî Îttiahatçiyan bi kêrnehatî rexne dikin. Kansu îşaret dike ku ligel Almanan beşdarbûna şer ne hilbijartinek Îttihatçiyan bû û weha berdewam dike: "Heta sala 1912an Îttihatçî dixwazin bi Îngîlîzan re hevkarî bikin. Lê Brîtaniya û Fransa di şerê Balkan de ligel dijmin cîh distînin. Artêşa Bûlgar heta Çatalca tê û Alman Îstanbûl ji dagirkiriyê xilas dikin. Jiber ku windabûyina Tirkiyê ne ji berjewendiyên Almanane ku di 1908an de piştgiriya Aldulhemîd dikirin.

Rojnamevan Neşe Duzel bi-

bîrtîne ku Almanan çekek bi 50 hezar zêr dane serleşker Enwer Paşa û wî jî ev çek daye artêşê û dipirse: "Ligor wê ev pêwendiyek çawa ye?" Kansu dibêje ku di wê demê de hemû teref li dû piştgiriya derve ne û lê zêde dike: "Bi ya min di van pêwendiyan de Îttihatçî yên paqijtirîn mane. Ew grûbên ku dixwestin wan hilweşînin ji Îngîlîzan re bêtir vekirî ajantî kirin."

Ligor Kansu Îttihatçî jiber panîkê biryara fermana Ermeniyan stendine. Di 1914an de Osmanî bi Rusan re di şer dene. Di sala 1915an de şer êdî li du êniyan dom dike. Piştî ku Îngiliz li Çanakale dest bi şer dikin, îhtimala ketina Istenbûlê dikeve rojevê. Osmanî bi vê tirsê êrîşê dibe ser Ermeniyan û bi carekê ve dixwaze xwe ji wan paqij bike. Kansu îdia dike ku Kemalîst bûne sedema veşartina fermana Ermeniyan. Kansu dibêje: "Ger di 1923an de îqtidara ku serdestiya meclîsê napejirîne û azadiya çapameniyê ji holê radike nehata sazkirin me yê pevçûn û hesab jihevpirsînên îttihatçiyan bidîtina. Lê Kemalîstan xwestin ku di sala 1926an de bi Doza Sûîkasta Îzmîrê hemûyan li derve bihêlin. Di sala 1925an de bi Yasaya Takriri Sukûn rejîma makeqanûn ji holê hat rakirin. Di 1931an de bi kongreya Partiya Gel nelê (ters, dijraber) ruhê makeqanûna 1924an rejîmek korporatîst hat damezirandin. Ev rejîma ku hertişt kontrol dikir heta 1946an dom kir. ." Ligor Kansu jiber rejîma Kemalîst ne vê vegotina dîrokê ne jî rewşa siyasî û aborî serast dibe.

"Kiyafetên li Tirkan tên ne ev in"

Her çiqas li Tirkiyê û dinyê Ataturk wek pêşengê modernîzmê û terefekî çanda rojavayî tê naskirin jî, Kansu ne liser vê baweriyê ye. Di salên 1920-1923an de li meclîsê gelek axaftinên Ataturk hene ku li dijî modernîzmê derketiye û ji cilên rojava re weha gotiye, "Kiyafetên li Tirkan tên ne ev in." Tiştê ku Ataturkê di warê civakî û aborî de mihefezekar û otorîtere dikşîne niqteya modernîzmê, bandora Ittihatçiyan ya di nav raya giştî deye. Ataturk jibo bêdengkirina mixalefetê û sîlehên wan ji destê wan bigire hin reform pêk aniye. Alfabeya latînî, yasaya medenî, hiqûqa malbatî, laîsîzm, mafên jinan, mamostebûna jinan, beşdarbûna jiyana kar hemû projeyên Ittihatçiyan bûn ku ya destpêkiribûn an amadekariya destpêkê dikirin. Bi vî awayî Îttihatçî bûn sedem ku Kemalîst rejîma modernîzmê ji xwe re hilbijêrin û xwe nêzîkî rajava bikin.



Kandîdata serokwezîriya Almanya Angela Merkel ji bo Mesûd Barzanî got:

„Hilbijartina we jibo pêkanîna demokrasiyê gaveke girîng e “



PK-Berlin

Seroka mezintirîn partiya muxalefetê CDU û kandîdata serokwezîriyê (Budeskanzler) li Almanya Dr. Angela Merkel, ji serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re mesajek pîrozbahiyê şand û got: „Ez bi navê xwe û Partiya Demokratên Xiristiyan li Almanya germtirîn pîrozbahiyan ji we re pêşkêş dikim...“

Merkel di peyama xwe ya pîrozbahiyê de, diyar kir ku hilbijartina Barzanî jibo seroktiya Herêma Kurdistanê „gavek bingehîne ber bi pêkanîna demokrasiyeke hemdem û çespandina aştî û biratiyê di nava neteweyên Iraqê de...“

Merkel got: „Ez carek din vê wezîfeya nû li we pîroz dikim û ji we re serkeftinê dixwazim...“

Angela Merkel ji sala 2002an de di parlamentoya Almanya de seroka fraksyona CDU/CSU ye



Di salekê de zêdetirî 5 hezar kesî hatin îdamkirin

Komeleya Navnetewî ya li dijî Cezeyê Îdamê „Hands off Cain“ rapora xwe ya salane belav kir û tê de diyar kir ku di sala 2004an de 5 hezar û 476 kes hatine îdamkirin. Ligor raporê, Çîn, bi îdamkirina 1500 kesî di serê lîstê de cî digre. Piştî Çînê, Îran tê ku wê bi kêmanî 197 kes îdam kirine.

Di sala 2003an de 5607 kes hatibûn îdamkirin.

Welatê ku zêdetirîn cezeyê îdamê daye û pêk aniye Çîn e. Li Çînê di sala 2004an de 1500 kes û li Îranê jî bi kêmanî 197 kes (sala 2003an 154 kes bûn) hatine îdamkirin. Ligor rapora “Hands off Cain” li Çînê di salekê de 10 hezar mirov cezeyê îdamê digrin.

Ligor raporê Vîetnam bi îdamkirina 82 kesan di rêza sêyem de cî digre. Di salekê de li Amerîkayê 59 kes hatine îdamkirin. Li Parzemîna Amerika cezeyê îdamê bi tenê li Welatên Yekgirtî yên Amerîkayê tê pêkanîn. Li Welatên Yekgirtî yên Amerîkayê di sala 2003an de 65 kes û di sal 2002an de jî 71 kes hatibûn îdamkirin.

Ligor Komeleya „Hands off Cain“ di sala 2004an de, ligor sala 2003an hejmara kesên ku hatine îdamkirin hinekî kêm bûye. Di raporê de tê gotin ku hîna jî cezeyê îdamê li 58 welatan nehatiye rakirin. Hejmara van welatan di sala 2003an de 61 û di sala 2002an de jî 64 bû.

Ligor Komeleya li dijî Îdamê, di sala 2004an de cezeyê îdamê li 25 welatan hatiye pêkanîn û tê gotin ku wan hejmara mirovên ku hatine îdamkirin ji çavkaniyên nefermî wergirtine. Ew ditirsin ku hejmara mirovên îdamkirî ji vê hejmara ku hatiye bidestxistin zêdetir be.

Di sala 2004an de sê welatan hewl daye ku cezeyê îdamê rawestînin. Li Tacikîstan ev ceze bi temamî hatiye rakirin, lê belê li Tanzanya û Saint Vincent hîna di erênayê de ye. Di deh salên dawîn de li van herdû welatan cezeyê îdamê nayê dayîn.

Ligor ku di raporê de hatiye gotin, li welatên wekî Libnan, Afxanistan, Hindistan û Endonezya bi salan cezeyê îdamê nehatiye pêkanîn, lê di sala 2004an de careke din ketiye rojevê û pêk hatiye.

Li Parzemîna Ewrûpa cezeyê îdamê bi tenê li welatekî tê pêkanîn. Li Belarûs di sala 2004an de 5 kes hatine îdam kirin.

Ev rapor bi tenê rewşa welatên ku cezeyê îdamê li wan tê pêkanîn radixe berçavan. Li hinek welatên ku Tirkiyê jî di nava wan de ye, cezeyê îdamê bi awayekî fermî nayê pêkanîn, lê hejmara mirovên ku bi dizî têne kuştin, dibe ku duqatê vê hejmara fermî be. Jiber vê yekê pêwîste Komeleya Navnetewî ya li dijî Îdamê, lêkolînên xwe li Tirkiyê û welatên weke Tirkiyê jî bike. Li Tirkiyê cezeyê îdamê bi awayekî fermî nayê pêkanîn, lê hejmara mirovên ku ji aliyê hêzên tarî ve têne kuştin jî ne hindik e.

56 mêrên destdirêj ji malê hatin qewitandin

Li Danîmarka, li hemberî mêrên ku zilmê li jinên xwe dikin berî salekê yasayek nû hat derxistin. Ligor yasaya nû, mêrên ku zorê li jinên xwe bikin, wê ji malê bên qewitandin. Di nava salekê de li Danîmarka 56 mêr ji malê hatin bidûrxistin.

Ligor yasaya ku sala derbasbûyî hat pejirandin, mafê polîsan heye ku mêr yan jî jinên destdirêj 4 hefteyan ji malê dûrbixin. Ji dema ku yasa derketiye û heta niha 56 kes ji malê hatine bidûrxistin û tev jî mêr in.

Yasa bi tenê ne bes e

Partiya Sosyalist ya Gel (SF) û Rêxistina Sitargehên Jinên Danîmarkî, vê yasayê têr û tije nabînin. SF û Rêxistina Sitargehên Jinan dibêjin, rewşa mêrên ku ji malê tên bidûrxistin nayê şopandin û herwiha pirsgirêkên wan jinên ku ji aliyê mêrên xwe ve tên perçiqandin jî nayê çareserkirin.

Partiya SF dibêje, “Piştî ku mêr ji malê tê bidûrxistin, jin û zarokên wî destekê nabînin. Her wiha mêrên ku dijwariyê bikartînin jî tu tedawiyê nabînin. Jiber vê yekê sedemên bikaranîna zor û dijwariyê ji holê nayêne rakirin.





Kurtenûçe

Axaftina bi Kurdî qedexe ye!



PK - Tirkiyê xwe li ber deriyê Yekîtiya Ewrûpa dibîne, lê hîna jî nahêle kesek bi zimanê Kurdî biaxive.

Li Dîlokê (Entabê) li zîndana tîpa H du girtî ji ber axaftina bi zimanê Kurdî hatin cezekirin.

Herdû girtiyên Kurd, jiber ku bi riya telefonê bi malbatên xwe re bi zimanê Kurdî axivîn, bi 3 meh cezeyê disiplînê hatin cezekirin.

Di derbarê vê qedexeya nemirovî de girtiyên Kurd, bi riya malbatên xwe daxuyaniyek dan çapemeniyê û bal kişandin ser Yasaya Cezekirinê ya Nû. Girtî di daxuyaniya xwe de dibêjin „Hikûmeta AKP li aliyekî guhertinên yasayî jibo endametiya Yekîtiya Ewrûpa çêdike û li aliyê din jî siyaseta xwe ya qedexekar û tunekar didomîne. Di televizyona dewletê de bi zimanê Kurdî weşan tê kirin, li hemû bajaran kûrsên zimanê Kurdî tên vekirin û heta li dadgehan jî bi Kurdî tê axaftin, lê jiber ku du girtî bi malbatên xwe re bi zimanê Kurdî diaxivin ew bi cezeyên disiplînê tên cezekirin".

Girtiyên Kurd, di dawiya daxuyaniya xwe de dibêjin „Em vê zihnîyeta ku zimanê me yê zikmakî qedexe dike, şermezar dikin û didin zanîn ku emê kiryarên bi vî awayî tucaran qebûl nekin".

Diyarbekirî baweriyê bi dezgehên Tirkan naynin

Netkurd - Anketek bi gelê Diyarbekir re li ser şîdet, muameleya xirab û îşkenceyê hat kirin.Ji bo pirsa ku hûn bawerî bi kîjan dezgeyê naynin jî ev bersiv hatin dan; polîs, medya Tirkan û ordîya Tirkan.

Prof. Dr. Melek Gorgenli (mamostê fakulteya edebiyatê ya unîversîteya Egeyê) bi alîkariya Baroya Diyarbekirê anketek li ser şîdet, muamelaya xirab û îşkenceyê çêkir.

Anket li Diyarbekirê (Bağlar, Kayapınar, Suriçi û Yenişehir) bi 713 kesan re hatiye çêkirin.

Li gor vê anketê,

Ji bo pirsa herî zêde kî şidetê dike ev bersiv hatin dan: Ji % 38 polîs lê danê dike û piştre bav li zarokan, mamoste li şagirtan û mêr jî li jinan dike.

Ji bo pirsa ku hûn baweriyê pirtir bi kîjan dezgehê tînin wiha bersiv hat dan: Medya ku ji satelitê weşan dike, idareyên herêmî û komeleyên civakî yên sivîl.

Ahmet Altan:

"Tirkiyê dîrokê şaş bi zarokên xwe dide xwendin"

PK-Frankfurt Bi munasebeta (bi boneya) xelatkirina Orhan Pamuk ji aliyê Yekîtiya Weşangerên Alman ve, nivîskarê Tirk yê navdar Ahmet Altan, nivîsek dirêj di yek ji mezintirîn rojnameyên Alman Frankfurter Allgemeine de weşand û têde Tirkiyê bi tundî rexne kir.

Ew di vê nivîsa xwe de Tirkiyê wek welatekî ku rastî lê nayê gotin binav dike, û wê wek welatekî ku rastiya dîroka xwe ji zarokên xwe re nabêje tawanbar dike.

Altan diyar dike, ku kêm kes hene li Tirkiyê dikarin bi cesaret rastiyan bînin zimên: "Li Tirkiyê hema hema kesek li nirxên wêjeyî yên berhemên Orhan Pamuk nakeve gumanê, wî xelatek wiha heq kiriye, lê belê xelatkirina wî li Tirkiyê tê gotûbêjkirin, sedema wê jî ewe ku, li wir cesareta gotina rastiyan qels e..."

Tiştê balkêş di nivîsa Ahmet Altan de ewe ku, Tirkiyê rastiya dîroka xwe ji zarokên xwe re negotiye û nabêje jî:

"Tirkiyê welatekî wihaye ku dîroka xwe şaş fêrî zarokên xwe dike. Li vî welatî qet zarokek jî nizane ku di demekê de, Tirkan berê Ermeniyan dane ser riyeke bi xwîn û ew ajotine ber deriyê mirinê... ev rastî li dibistanan nayê xwendin..."

Altan, di nivîsa xwe de helwesta Ewropiyan li hember nivîskarên biyanî rexne dike û wiha dibêje: "Mixabin di vê dema dawiyê de, di helwesta Ewropiyan de li hember edebiyatê hinek kêmasiyên ku mirov xemgîn dikin hene. Ewropa jibo nivîskarên ku ji derve tên, bi helwestek siyasî nêzîkî wan dibe. Cesareta helwesta siyasî, ji afirandinên wêjeyî zêdetir çepikan qezenc dike..."

Wek tê zanîn Ahmet Altan li Tirkiyê û li derve nivîskarekî rêzdar tê dîtin.

Ew heya niha jiber bîr û baweriyên xweyê siyasî û mirovane, jiber helwestên xwe yên demokratîk, gelek caran hatiye darizandin û ceza xwariye.

Ew ji aliyê bavê ve Tirk e, diya wî jî Kurd de.



Nivîskarê Tirk Amet Altan

Şêx Seîdê nemir û hevalên wî li Diyarbekirê hatin bibîranîn

Di 25ê Hezîranê de Şêx Saîdê nemir û hevalên wî, di salvegera 80yî ya dardakirina xwe de li avahiya KÜRT-KAVê bi civînekê hatin bibîranîn.

Civîna bîranînê bi rawestandina deqîqeyek rêzgirtinê ya jibo hemi şehîdên Kurdan destpêkir. Piştî rawestandina rêzgirtinê, endamê rêvebirîya Weqfa Çand û Lêkolînî ya Kurdî (KÜRT-KAV) Fehîm Işik, liser navê Weqfê qisekir. Işık di kurtegotina xwe de behsa girîngiya xwedîlêderketina dîroka Kurdî kir.

Di civînê de kesayetiyên mîna Latîf Epözdemîr, neviyê Şêx Seîd Kasim Firat, Hîmet Bozcali, Dr.Abdullah Kiran, M.Celal Baykara û gelekên din beşdar bûn.

Amed

Komeleya Kurd a Diyarbekirê (Kurd-Der) jî jibo bîranîna Şêx Seîd û hevalên wî ku di sala 1925an de hatibûn dardakirin, liber Ulucamîyê daxuyanîyek belav kir.

Endama AKP'ê Nîl Demîrkazik jî tê de lidor 50 kes beşdarî bibîranînê bûn. Serokê Kurd-Der a Diyarbekirê Îbrahîm Güçlü daxuyanî xwend û diyar kir ku „Ataturk, ji Kurdan sûd wergirtîye lê jibo nehêlan û pişavtina Kurdan, sîyasetek nemirovane meşandîye". Güçlü, anî zimên ku tevgera Şêx Seîd a sala 1925an, tevgerek civakî, gelperest û girseyî bû. Güçlü got ku biryarên dadgehên îstiqlalê ne hiqûqî ne.



Dîmenek ji civîna bibîranîna Şêx Seîd û hevalên wî

Hesîb Rojbeyanî:

„Eniya Tirkmen roleke pir bi xeter dilîze û ew girêdayî Tirkiyê ye“

Peyama Kurd: ***Armanca we ji serdana Almanya çi ye?***

Hesîb Rojbeyanî: Em hefteya borî li Berlînê bûn û me hevdîtinek girîng li gel Berpirsyarê Beşê Rojhilata Navîn û Berpirsyarê Beşê Kêmnetewên Cîhanê li Wezareta Karûbarên Derve ya Almanya pêk anî. Di wê hevdîtinê de, me behsa rewşa Kurdistanê û bi taybetî behsa rewşa Kerkûkê kir. Her wiha me bersiva nûçeya Washington Post jî da ku gotibû Kurd li Kerkûkê Tirkmen û Ereban digrin û dişînin zîndanên Silêmanî û Hewlêrê. Di rastiyê de Hêzên Hevpeyman çend terorîstên Ereb binçav kiribûn û ji ber ku cî li Kerkûkê tunebû, ew teslîmî hêzên ewlekariya Hewlêr û Silêmaniyê kiribûn. Lê yek Tirkmen jî di nava wan de tune bû.

Ji bo çi heta niha Hikûmeta Bexdayê ji bo pêkanîna yasaya 58an tu gav navêtine?

Piraniya berpirsên Hikûmeta berê ya Eyad Elawî, kevnebeesî û Erebên nijadperest bûn. Niha di encama hevkariya Kurd û Şîîyan de hikûmeteke nû hat hilbijartin, lê sed xwezî bi Hikûmeta Elawî.

Hilbijartina serokatiya herêmê bandoreke çawa li Kerkûkê dike?

Hilbijartina Serokê Herêmê û çêbûna saziyeke wiha resmî, xwedî bandoreke mezin e. Serdana Serok Barzanî ya dawî li Bexdayê,hevdîtinên wî li gel rayedarên Iraqî û sûrbûna wî li ser Kurdistanîbûna Kerkûk, tiştekî pir girîng bû.

Heta çi radeyê pirsgirêkên nîştecihên Kerkûkî yê ku mal û milkê wan ji wan hatibû standin, çareser bûne?

Ji 15 hezar kêşeyên ku hatine tomar kirin, heta niha bi tenê pirsgirêka çendsed kesekî hatiye çareserkirin û milkê wan li wan hatiye vegerandin. Ji aliyê mehkemeya Kerkûkê ve, bi tenê biryara vegerandina mal û milkê 10-15 kesan hatiye dayîn û malê wan ji Ereb û Beesiyên nijadperest hatiye wergirtin. Lê yên din hîna weke xwe mane. Me weke bîroya qerebokirin û bicîkirina penaberan, nameyek şand Wezareta Çandiniyê ya Îraq. Me di wê nameyê de xwest ku Zagona Birêvebiriya Bilind ya Şoreşê ya ku di dema Bees de hatibû wergirtin, raweste. Lê belê Wezareta Çandiniyê ya Îraqê daxwaza me şandiye Encûmena Wezîran û wan jî şandiye APSS. Daxwaza me weke yariya fûtbolê di nava van saziyan de diçe û tê. Heta vê kêliya ku em vê hevpeyvînê çêdikin jî, erebkirina Kerkûkê berdewam e. Karmendên Ereb ji Navend û Başûrê Îraqê tînin cem me ji bo kar, lê bi hezaran Kerkûkî bixwe bêkar in. Parêzgarê Kerkûkê Ebdûrrehman Mistefa daxwaznameyek şandiye û tê de xwestiye ku şandina karkerên Ereb ji Bakur û Navenda Îraqê were rawestandin. Hikûmeta Bexda heta niha tu alîkariyek ji bo Kerkûkê terxan nekiriye. Lê dema ku Dr. Berham Salih li Bexdayê cîgirê Serokwezîr bû, 100 milyon dolar ji bo avakirina Kerkûkê hat terxankirin. Ji wan 100 milyon dolaran bi tenê 25 milyon gihan Kerkûkê û 75 li Bexdayê asê mane.



Penaberên Kerkûkê di rewşeke pir xerab de ne, di bin konan de dijîn û ava wan ya vexwarinê jî tune ye, çima?

Heta niha, ji bo penaberên Kerkûkê, bi tenê Dr. Roj Nurî Şaweys ji butçeya bîroya xwe 200 hezar dolar hatiye şandin. Lê ji bo asankirin û bi rêkûpêkkirina rewşa Kerkûkê pêwîstiya me bi 500-600 milyon dolar heye. Mixabin, di nava Kerkûkê de em weke Partî û Yekîtî bi hev re kar nakin. Ez hêvîdar im ku piştî hevgirtina herdû hikûmetan, em bikaribin bibin xwediyê yek bername û yek stratejîyê jî. Pêwîste em zêde pişta xwe nedin Bexdayê. Divê Herêma Kurdistan rola xwe ya pêwîst bilîze.

Çima heta niha ji bo ewlekariya Kerkûkê hêza Pêşmergeyan nehatiye bikaranîn?

Berî demekê behsa vê yekê hat kirin, lê hîna nebûye. Lê belê li bajarê Mûsil Pêşmerge li gel Hêzên Hevpeyman roleke mezin dilîzin. Bê guman hatina Pêşmergeyan ji bo Kerkûkê pir girînge û bi giştî Tirkmen, Keldan û Aşûrî jî pê kêfxweşin ku Pêşmerge li gel Hêzên Hevpeyman Kerkûkê biparêzin.

Çima hilbijartinên Encûmena Parêzgeha Kerkûkê hatin li paş xistin?

Yek ji sedeman ew bû ku Eniya Tirkmen û hineh Erebên Şîî li derveyî Lîsteya Birayetiyê ya Kerkûkê bûn. Daxwaziyên wan ji wan mezintir bûn. Lîsteya Birayetî ya Kerkûkê ji wan re digot, "Kerem bikin werin, lê armancên lîsteyê qebûl bikin û di çapemeniya xwe de belav bikin". Lê ew bi vê yekê ne razî bûn. Di navbera Partî û Yekîtî de jî li ser parvekirina hinek wezîfeyan nerînên cuda hebûn. Heta niha me bi bernameyeke baş li gel hev kar nekiriye. Lê li beramberî me terorîst, Erebên Şîî û Tirkmen tev yek in.

Bandora nûnerên Kurd yên li Bexdayê çiqasî li ser başkirina rewşa Kerkûkê çêbûye?

Berî hilbijartinan wan karekî baş nedikirin.

Armanca Eniya Tirkmen ji derxistina probleman çiye?

Eniya Tirkmen roleke pir bi xeter dilîze. Wan derew li Tirkiyê jî kiribûn. Ji bo afirandina pirsgirêkan, hevkariya wan li gel terorîst û kevnebeesiyan jî heye. Her wisa jî ew di hilbijartinan de li temamê Îraqê şkestin. Wan wisa belavkiribû ku hejmara wan 4 milyon e lê wan 93 hezar deng wergirtin. Berovajî vê Eniyê, piraniya Tirkmenan dixwazin li gel Kurdan bijîn.

Gelek caran cîranên Îraq tên tawanbarkirin ku destê wan di bûyerên terorîstî yên Îraqê de heye, raste gelo?

Gelek kes ji Eniya Tirkmenan hatine binçavkirin û tê gotin ku destê wan di bûyerên terorîstî de heye. Ew girêdayî Tirkiyê ne û difikirin ku Împeretoriya Osmanî heta niha jî heye. Di dema derbasbûyî de şandeyeke Tirk hatin Kerkûkê û em li gel wan rûniştin. Min ji wan re got, "hûn tên doza mafê Tirkmenan li me dikin, lê 20 milyon Kurd li Tirkiyê hene û bê maf in. Divê hûn destpêkê mafên wan yên çarenûsî bidin wan. Mafê Tirkmenên ku li Kerkûkê dimînin sedcarî ji yê Kurdên li Tirkiyê baştir e". Serokê şandeya Tirkiyê got, "ev gotinên ku tu dibêjî nerîna te bi tenê ye yan nerîna temamiya Encûmena Kerkûkê ye".

Hejmara nîştecihên Kerkûkê çiqas e?

Tu serjimareke durust li ber destê me tuneye lê ji sedî 51ê zêdetir Kurd in. Piştî wan Tirkmen, Keldan û Aşûrî ne. Lê bi sedema erebkirina Kerkûkê niha hejmara Ereban ji ya Tirkmenan zêdetir e. Ji Kerkûkê 60 hezar malbat hatine derxistin, lê heta niha 10 hezar vegeriyane.

Di dema borî de Tirkiyê xwest di bin navê Heyva Sor a Tirkiyê de nexweşxaneyekê li Kerkûkê çêbike, lê Encûmena bajêr rê neda vê yekê. Niha jî tê gotin ku ew dixwazin bi riya bazirganekî Tirkmen zanîngeheke Tirkî vekin hûn li ser vê çi dibêjin?

Çawa Encûmena Kerkûkê rê li ber vekirina nexweşxaneyê girtibe, ewê wisa jî rê li ber vekirina zankoya Tirkî û hemû projeyên Tirkan bigre.

Erebên ku di dema Bees de hatibûn Kerkûkê hîna li wir in yan vegeriyane?

Piraniya wan hîna jî li Kerkûkê ne lê hejmareke pir kêm vegeriyane.

Hevpeyvîn: Fadil Özçelik
Cotyar Darfiroş

Hesîb Rojbeyanî, Endamê Encûmena bajarê Kerkûkê ye û ew berpirsyarê karûbarê bicîkirin û qerebokirina penaberên Kerkûkê ye. Ew di 17ê Hezîrana 2005an de, li gel şandeyekê ji Hikûmeta Kurdistanê hatiye Ewrûpa. Ew şandeya navborî ji Serokê Fraksiyona P.D.K Dr. Nasih Xefûr, endamê perlamanê Kurdistanê Romyo Hekarî, Nûnerê parêzgarê Hewlêr Nîhad Letîf Qoce, Berpirsyarê Giştî yê Grûba Companiyên STÊR Selah Awla û Mihemed Elî pêk tê. Ev serdan ji aliyê Serokê Komeleya Gelên li ber Wendabûnê Prof. Tillman Zuerich ve bi armanca pêkanîna çend hevdîtinên girîng hatiye birêkxistin. Ji bo ronkirina rewşa Kerkûkê ya dawî, Peyama Kurd hevpeyvînek li gel Hesîb Rojbeyanî pêk anî.

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog. Prof. Dr. Fatê Were Civatê



Şêxbat

Xaltîka Fatê, agir bi malê ketê ma te nivîsa şûjinê malbata Avestayê nexwend peppûkê? Keçê qirikê mêrik ketiye nava solan û nema jê derdikeve haa. Hingî rebeno ji jina xwe ditirse 44 carî sola wê maçî dike û dalêse. Agir bi malê keto hem sola jina xwe dalêse û hem jî dev tavêje jinan û dibêje "de neyse, aqilê jinan e. Dibêjin ya, aqilê di serê mirişkekê de, di serê du jinan de tune ye (Fatê Were Civatê di nav de.) Min negotiye, ATATURK gotiye". Te dît ne!? Ê bi xwedê wijdanê min qebûl nekir û min go de hema ezê ji xaltîka xwe re bêjim bila haya wê jê hebe. Ma hevqasî bêbextî dibe xaltîka Fatê?

Helîma Xişxişok / Bonn

Hey daw û delingê te şewityê rebbî, yanî go te xişxiş ji xwe nanîba sebra te nedihat ne! Illeh hûn dixwazin min û xelkê bera hev din, ma ez nizanim! Hey qehpika heram, mêrik sola jinka xwe 44 carî dalêse-nalêse ma ji te re çi hê! Mêrik darê şikestiye, rizyayîye, peppûke, ji solan pêve nizane tiştekî din balêse. Başe ma mêrê te kuderê te dalêse porkurê!? Lao şûjino, perpityo, serpîreko, dev ji solan berde bavê mino! Ji solan û bi jor de balêse xweştire ehmeqo! Tam di solan de tuneye, tam di kaniyê deye korê kor! Te go aqlê du jinan di serê jinekê deye û ev Atavirq gotiye!? Ê bi xwedê raste looo! Heta go serpîrekên mîna te solan balêsin û ji kaniyê avê venexwin wê ne didu lê aqlê heft jinan jî di serê mirîşkekê de be. Jixwe hingî rebenê Atavirq jî mîna te sol alastin, rebeno bû nêrûmêk û îcar dest bi alastina potîn û çaroxan jî kir. De şûjino, dev ji alastina sola jina xwe bernede ha, ne 44 carî, hema bila tim di devê te debe û ji devê xwe dernexe!

*

Xaltîka Fatê, ez bi navê kerên Tirkiyê serî li te didim. Wek tu jî dizanî jixwe ji berê de heq û mafê me keran li Tirkiyê tunebû. Ev nebes bû îcar niha hikûmetê rabû vê dawiyê serjêkirina hespan helal kir û fitû da. Dibêjin wê goştê wan rebenan bikin sicûq û rovyê heşandî. Îcar em kerên Tirkiyê niha jixwe ditirsin go rojekê dora serjêkirinê bê me jî. Gelo em herin li Kurdistanê penaberiyê bixwazin yan çi bikin? Ez bi navê komîta navendî ya kerên Tirkiyê bi te dişêwirim û pêşniyara çareseriyekê ji te dixwazim. Silav û rêz! Bi navê kerên Tirkiyê:

Kerê Boz / Ankera-Tirkiyê

Hayhoooo, hayhoooo! Ez ji mirovan xilas nebûm îcar ma dora ker û heywanan yabo! Kuro lao Kerê Boz, hey ker kurê kerê, lao ma ez rebena xwedê çi ji mafê keran fêmdikim ehmeqo! Ê lao dewleta Virqo fermana Filehan rakir û serê wan jêkir. Piştî wê gotin îcar dora Kurdaye û fermana Kurdan rakirin. Piştî wê gotin "ev lêlê ye, hîna lolo maye" û kerên xwe bera nav kerên me dan û bi navê sosyalîzm û biratîyê kerên me xapandin. Ê lao em hîna nikarin mafê hesp û kerên Kurdistanê biparêzin îcar emê çilo ê we Tirkan biparêzin hêêê!? Heyran, dewlet dewleta weye û hûn jî ker û hespên dewleta xwe ne. Ez di bextê we kerên Tirk deme; hûnê neçin Kurdistanê û kerên me jî hînî tir û fisan nekin! Tir û sifên xwe li welatê xwe berdin û wê jehra sosyalîzm û biratiya ker û hespan neynin nava me! Te fêmkir kero? De haydê, oxira we a ker û hespan be!

fate@peyama-kurd.com

Pêkenok

2x2

Kurê yekî bi xeyd û girî ji dibistanê tê malê. bavê wî jê dipirse:

- Xêre kurê min, tu çima digrî ?

- Min îro ji matematîkê dereca xirab stend.

- Çima ?

- Mamoste ji min pirsî : 2 carî 2 çend dikin min got: 6 dikin.

- Ê kurê min, 2 carî 2 = 4 dikin, te nizanîbû te gotiba 5 dikin ma te ev 6 ji ku derxist!..

Remildank

Beran (21.03-20.04)
Hûnê rojekê xweş bibûrînin. Ji bo tiştên piçûk moralê xwe xira nekin, dest li parên xwe bigrin

Gamêş (21.04-20.05)
Dibe hûn pêrgî hinek hevalên kevn bên. Hûnê ji aciziyê bi dûrkevin û di serê xwe de zelal bin

Cêwî (21.05-21.06)
Hûn dixwazin derkevin seyranê, lê hinek bûyer rê li ber we digrin. Zorê li xwe nekin, rihet bin

Kevjal (22.06-22.07)
Her tiştî navêjin nava xwe, ramanên xwe vekirî bêjin. Rê li ber we ye, lê hûn di erênayê de ne.

Şêr (23.07-22.08)
Ditinên xwe vekirî ji hezkiriyê/ya xwe re bêjin. Hûn hewldarin ku aboriya xwe baştir bikin

Simbil (23.08-22.09)
Rojek bi heyecan e.Zêde nekevin bin berpirsiyariyê, yan na hûnê tenduristiya xwe serûbin bikin.

Mêzên (23.09-22.10)
Hûn serê xwe pir bi rewşa aboriya xwe dêşînin.Wê hinek nûçe we ji wê serêşandinê xilas bikin.

Dûpişk (23.10-21.11)
Hûn gellek caran karê xwe nivco dihêlin. Bi taswas (dudil) nebin, karê îro nehêlin sibê.

Kevan (22.11-21.12)
Hûn pir bi his û dilzîz in. Ruhtenikbûna we fersendê dide derûdorê, hay ji xwe hebin, nexapin.

Kovî (22.12-19.01)
Moralê we bilind e, hûn ji xwe bawer in. Di warê aborî de nîşanên baş dixuyin, bêhêvî nebin.

Satil (20.01-18.02)
Bûyerên balkêş diqewimin.Di bin bandora bûyeran de neminin, wê rewşa aboriya we baştir bibe.

Masî (19.02-20.03)
Nûçeyên bi heyecan hene. Pêşniyazî û daxwaz pir in, lê zû biryar nedin û zêde xwe neêşînin.

Çengelpirs

Ducar, ji nûve dengbêja wêne		Qumaşek Serîhildan, dijrabûn		Erêna Namûs, xîret		Êş, jan Lihevhatin		Rind, xweşik, bedew		Keştî, gemî Liberrabûn	
								Navekî mêran			
Bênamûs Planet					Fîrma Xwarinek ji şîr çêdibe						
				Parçe, lîme mirovxur					Xwarin		Xwarina heywanan
Xelk, girêdayê hikumdar Lib, tene							Gundekî Kurdistanê tewaş, parçê rûn				
			Golika nav garanê fermana razanê							Sertîpa gotina mêr	
Alim	Bajerekî Kurdistanê xerabûn							Cûreyekî lampê			
				Raket, xwe dirêj kir							
Ji bo çi		Çêbû cûreyekî bêrê			Cemidî, negerm		Parçe, qisim				
				Zarok, mindal hewa							
Kanî, avzêm heywanek						Kesê yekem					
			Pirsgirêk, problem								



Pêkenok

Kûçik

Cewd ê reben hefsar xistibû stuyê bizinê û ew digerand. Hevalekî wî pêrgî wî bû û jê pirsî:

- Kuro Cewdo tu çi dikî?

- Ma tu nabînî ez Kûçikê xwe digerînim!.

- Malneket,sturehê wî hene lao!..

- Wele ez têkilî jiyana wî a şexsî nabim!..

www.arsiv

Şanaziya Dîrokê
Birc û bedenên paytexta dîrokî ya Kurdistanê
DIYARBEKIR

Memet Çetintaş


Deriyê Rûhayê

Diyarbekir liser rojhilatê platoya Bazalt ava bûye. Ev plato, ji qerejdaxê dest pêdike û heya çemê Diclê direj dibe. Diyarbekir 100 metroyî ji deşta Diclê bilintir e. Çemê Diclê liber nigê bajêr kevanekê çêdike û diherike.

Du taybetiyên sereke yên Diyarbekirê hene; yek ji wan Bedenên Diyarbekirê ne, ya didoyan jî xaniyên Diyarbekirê ne.

Ligor texmîna zanyaran Keleha Diyarbekirê, berî çêbûna Îsa di sala 3000an de ji hêla bapîrên Kurdan, Xoriyan ve hatiye avakirin. Ev Keleh dikeve aliyê rojhilatê bajêr. Piştî ku împaratorê Roma Constantius di sala 349an de bajêr dagir dike, dest bi avakirina bedenan û tamîrkirina Keleha Diyarbekirê dike. Bedenên ku di dema Constantius de ava dibin, ji Deriyê Mêrdînê dest pê dike û digihîje heta bi Deriyê Nû. Ji Deriyê Nû jî dest pê dike û digihîje heta bi Deriyê Çiyê. Beden, li aliyê rojava digihîje heta bi „Kolana Gazî “ (Gazi caddesi).

Di sala 363an de împeretorê Roma Joviyanus bi hikumdarê Îranê Şapûr re peymana aştiyê çêkir. Ev peyman di dîrokê de mîna „Peymana Bêyom ya Joviyanûs“ tê binavkirin. Ligor vê peymanê hin kelehên Nisêbînê (Nîsîbîsê) ji Sasaniyan re man. Jiber vê yekê gelê mesîhî yê wan bajaran hatin Diyarbekirê û liber bedenên Diyarbekirê li aliyê rojava cîhwar bûn. Piştî vê bûyerê bedenên aliyê rojava hatin xerakirin û bi firehî ji nû ve hatin avakirin. Bi vî rengî gelên mesîhî yên koçber jî ketin nava Keleha Diyarbekirê.

Keleha Diyarbekirê dişibe masiyê pehnik; du beşên kelêhê hene: Keleha Hindir û Keleha Derve.

Keleha Derve ji 82 bircan pêk tê û dirêjiya bedenên wê 5 km ne. Bilindbûna bedenan ji erdê 8-12 mitro ye, stûriya wan jî di navbera 3-5 mitroyan de tê guhertin. Piraniya bircan girover in, lê çend heb ji wan pirqorzî ne jî; Birca Benûsen û ew bircên ku li deşta Diclê dinerin çarqorzî ne. Jiber ku mirov bikaribe derkeve ser bedenan li aliyê hindir li kêleka deriyên bircan du derence hene. Ji wan yek li destê rastê ye, ya din jî li destê çep ê. Liser hemû bedanan û bircan mezxel hene, rûyên van mezxelan li aliyên cûrbecûr dinerin. Liser bedenan jibo parastina riya dewriyê dîwarên mezxelê hene, ev dîwar li aliyê derve dinerin û stûrbûna wan jî 70 cm ye.

Bircên kelehê du qat in, qata jêrê embar e û li qata jorê jî leşkerên dema herbê diman.

Ceng bi piranî li meydana di navbera Deriyê Çiyê û Deriyê Rûha de çêdibû, jiber wê yekê bircên vê derê pir li ber hev hatine avakirin û ji yên din mezintir in. Li vanderan dûrayiya bircan ji hev di navbera 36, 42, 44 metro de tê gûhertin. Di navbera bircan de dîwarên betin (zexmandin-taqwiye) hene, firehiya wan dîwaran 1.50 m. ye, kûraniya wan jî 1.30 m ye. Gava ku mirov ber bi aliyê Deriyê Mêrdînê ve diçe dûrayiya navbera bircan zêde dibe; ev dûrayî di navbera 54, 63, 66 m. de tê gûhertin. Beden li aliyê rojhilat, aliyê ku li deşta Diclê dinêre, li ser zinarên bilind û asê ava bûne, jiber wê bircên kelehê li vê derê jihev dûr hatine çêkirin û bilindbûna wan li gora yên din kêmtir e.

Çar deriyên girîng yên Keleha Derve hene. Li bakur Deriyê Çiyê (Berê Deriyê Xarpût dihat gotin), li rojava Deriyê Rûha (Berê Deriyê Rom yanî Deriyê Anatol dihat gotin), li başûr Deriyê Mêrdînê (Berê Deriyê Tell dihat gotin) û li rojhilat jî Deriyê Nû (Berê Deriyê Diclê an jî Deriyê Şatt dihat gotin). Bedenên Diyarbekirê ji bazalta reş hatine çêkirin û pir zexmin.

Keleha Hindir dikeve aliyê rojhilatêbakur. Li wir girekî rokirî (yıgma) heye, jêre Keleha Wêran (Viran-Kale) tê gotin. Li bakurê kelehê Deriyê Fetîh heye, Deriyê Serayê û Deriyê Kupelî diçin Keleha Derve. Wekî din li wir deriyekî veşartî jî heye û navê wî Deriyê Ogrun e. Mirov di wî derî re dadikeve Diclê.

Liser bedenên Diyarbekirê ev kîtabeyên Dewlet û Hikûmetan hene:

Roma bi latînî (367-375), Bîzans bi girekî-yûnanî (449-528), Ebbasî bi erebî (909), Merwanî (996-1035), Selçûkî (1088-1092), Selçûkiyên Şamê (1093), Înalî (1141), Nîsanî (1154-1183), Artûkî (118-1208), Eyyûbî (1236-1237), Akkoyûnî (1149-1479) û Osmanî bi zimanê farisî.

Bedenên Diyarbekirê piştî seda Çînê li dinyayê yên duyemîn in. Seda Çînê jiber êrîşên Moxolan hatiye avakirin. Gava ku mirov bala xwe dide seda Çînê, mirov dibîne ku tenê kevir dane ser hev û sed ava kirine, lê bedenên Diyarbekirê ne wisa ne. Liser rûyê her sûrekî, her dîwar û her bircekê, kîtabe, nexş û fîgûrekî watedar hene. Bedena Diyarbekirê şahidên dîrok û şaristaniyên cûrbecûr in. Bedena Diyarbekirê şahidê êş û kedera gelê Diyarbekirê ye. Gelek împarator û qumandanên zalim dîtine.

Gava qumandarê artêşa îslamê Xalît bin Welît tê ber Diyarbekirê û hewl dide ku Diyarbekirê zeft bike, li hemberî xwe miletekî tekoşer û bedenek asê dibîne, her çiqasî ew liberxwe dide jî, bedenên Diyarbekirê rê nadin wî ku ew bajar zeft bike. Ligor ku tê gotin rojekê ji rojan Xalît bîn Welît tê aliyê fîskaya û bedenan saxtî dike. Dixwaze ciyekî qels bibîne û ji wê derê têkeve bajar. Li wê derê kûçikek li ber çavê wî dikeve. Mêze dike kûçik ji qûlikekê dikeve hindir û derdikeve. Gava ku ew diçe nêzîkî qûlikê, dîbîne ku cihê qanalîzasyonê ye. Şevekê bi dizî leşkerên xwe di wê qûlikê re xistin hindir û bajar zeft kir. Di vî şerî de lawê Xalid bîn Welîd Osman tê kuştin. Jibo ku ew tola lawê xwe hilîne, radibe serê bi hezaran xortên Kurd li Serexaneyê jê dike û xwîna wan xortan liser rûyê bedenê dixe. Ligor ku tê gotin xwîna wan xortan hîna jî xûyane.

Liber her deriyekî Diyarbekirê hemamek heye. Ligor ku tê gotin berê gava yek ji derve bihata bajêr berê diçû li hemamekê ji wan xwe paqij dikir û piştre diket nava bajêr.

Liber Deriyê Rûha, Hemama Melik Ehmed û Hemama Biçûk heye. Liber Deriyê Mêrdînê, Hemama Devê heye. Li Deriyê Çiyê jî Hemama Wehab Axa heye. Ligora ku tê gotin li Diyarbekirê 20 hemam hebûne.

Di sala 1930an de waliyê Diyarbekirê jiber kompleksa xwe ya siyasî xwestiye bedenan xera bike û vê şahesera gerdûnî (unîversal) ji holê rake. Waliyê contirk sedama xerakirina bedanan jî wiha şîrove kiriye: „Jiber ku beden derûdora bajêr digre, bajar nikare hewayê bigre.“

Wan deman profesorê Îngîlîz A. Gabriel jo bo lêkolîneke arkeolojîk li Diyarbekirê bûye. Profesor gava ku dibîne walî dest bi xerakirina bedanan dike, raporekê dinivisîne û serî li wezareta perwerdekariyê dixe û ji wan daxwaz dike ku vê xerakirina bedenan bisekinînin. Ev daxwaza prof. A. Gabriel tê pejirandin û xerakirina bedanan tê sekinandin.

Prof. A. Gabriel bi vî karê xwe dilê rewşenbîrên Diyarbekirê fetih dike. Kesên ku doh dixwestin bedenên Diyarbekirê xera bikin, îro jî liser navê restorasiyonê mîna dîwarekî beredayî ji nû ve ava dikin. Armanca wan ewe ku nasnameya bajêr ji holê rakin û nasnameyekê nû bidin bajêr. Halbûkî bedenên Diyarbekirê hunera 5000 sala ne, liser her kevir û liser her qorziya wan keda hostayên payebilind heye. Bedenên Diyarbekirê mabeda siran e. Bedenên Diyarbekirê sirên xwe heta niha ji tu kesî re negotine. Kî dizane, dibe ku rojekê sirên xwe ji camêrên xwedîsoz re bêjin.



www.kurdistan.org



Rengîniya havînê

Havîn, demsala herî germ û herî bi bereket e. Tava tûj û ezmanê sayî, dilê mirov li jiyanê vedike. Xweza tê guhertin. Her tişt di bin tîrêjên rojê de dibiriqe. Roj, rengê xwezayê diguherîne û li gel pir tiştan, cil û bergên mirov jî di vê demsalê de têne guhertin. Li şûna fanere û çakêtên qalind, mirov dest bi lixwekirina tiştên tenik û hênik dike. Li şûna rengên tarî û girtî, kincên rengorengo dolaban dixemilînin. Ji bo ku tu di dema hilbijartina rengan de nekevî dudiliyê, vê nivîsê bixwîne.

Ji bo havîna 2005an, çêkerên modayê tevayê rengên xwezayê bikar anîne. Qumaşên kincan weke ku ji nava boyaxeke rengîn derketibin bi pemba, şînê ezmanî, kesk, zer, şirkî û tevayê rengan hatine xemilandin.

Ji bo kincên ku di rojên taybetî û şahiyan de werin lixwekirin, rengên reş û spî di rêza yekemîn de ne. Piştî van herdû rengên sereke yên ku di dolaba her jinekê de têne dîtin, rengê xweliyê, rengê zîvî û bronzî tên.

Kincên havîna îsal li kêleka rengên xwe yên beloqî, gulgulî û pitpitkî ne jî. Hûn dikarin îsal etekên xwe yên curbecur yên ku we di binê dolabê de ji bîr kirine jî bikarbînin. Etekên dirêj, yên di binya kabokê re, yên kin, yên mînî, yên teng, yên fereh û kiloş. Hemû jî îsal mode ne.

Di kincên havîna îsal de rehetî û hênkayî esas hatiye girtin. Li şûna gumlek û blûzên teng, yên fereh û azad derketine û li şûna qumaşê giran jî, yê sivik hatiye bikaranîn.

Ji bo ku bedena te bikaribe hilmê bistîne, xwe ji kincên ku ji pemboyê saf hatine çêkirin, mehrûm nehêle.

Ji bîr neke, kincên mirov neynika kesayeta mirov in. Rengîniya kesayeta xwe, bi riya kincên xwe diyar bike.



Navenda Zelal:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH
Hamburg
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH
Berlin
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink Gmb
Mannheim
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II
Düsseldorf
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE
Essen
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM
Dortmund
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH
Fellbach
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE
Bremen
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR
Erfurt
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZELI
Köln
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

Hunermend: Mehmûd Eziz Şakir

„Ez xwe di nav milletê xwe de serbilind dibînim“



Peyama Kurd: ***Ji kerema xwe tu dikarî bi kurtî behsa Jiyan, bizav û çalakiyên xwe yên hunerî biki?***

Mehmûd Eziz Şakir: Ez di sala 1950 de li Dirbesiyê li rojavayê Kurdistanê ji dayik bûme. Sala 1960î min bi rasti dest bi karê hunerî û muzikê kiriye. Sala 1969an ez bi alîkariya Yûsiv Berazî çûme êzgê Kurdî li Iraqê (Êzgê Bexda).Sala 1970î ez çûme Lubnanê, li Beyrûdê û me bi alîkariya Kemal Sembaz û Mistefa Cuma Koma Serkeftin ava kir. Di salên 1969 -1979an de me li Lubnanê û li Urdinê gelek çalakî, şev û aheng çêkirin. Sala 1976an me Koma Rengîn ava kir lê jiber nebûna tomargehan dom nekir û zû hilweşiya.

Li salên 1985 -1988an me Koma Bihar ava kir û me kasêt tomar û kom dikirin. Li sala 2000an rê liber min vebû, ez çûme Swêdê û Ewrûpa. Delive jibo min hilket ku ez wan berhemên xwe belav bikim û heta niha ez di karê xwe de berdewam im. Li salên 1963-1968an ji bili Kurdi min bi zimanê Erebî jî distira lê dûvde min dest jê berda. Heta niha 300 stranên min hene, 40 stran ji wan ji hozanên hozanvanên binavûdengên Kurd in, wek Osman Sebri, Cigerxwîn, Dîham Elfetah, Mihemed Eli Hiso, Eli Şêxê, Mihemed Berazî,Yûsif Berazî , Hemîd Qadî. Piştî sala 1969an û heta niha ez serbixwe kardikim û min pişt bixwe ve girêdaye û ez hozan û awazan jibo xwe datînim.

Di destpêka karê xwe yê hunerî heta sala 1969an min pişt bi hozanvan Yûsiv Berazî û stranbêjê Kurd (birayê min) Mihemed Eziz Sakir ve girêda û wan gelek alîkarî jibo min kirin. Ez paldam û rêya dirist ya hunerî nîşanî min dan.

Îlhama stranê ji kuve hat?

Destpêkê ji binemalê û haydana birayê min (Mihemed Eziz Sakir) û hozanvan Yûsif Berazî, paşê dengbêjên navdar wek Mihemed Arif ,Îsa Berwarî,Mecidê Herkî, ku li sala 1963an li pişka Kurdî ya Tehranê min guh lê dibû, bûn singistê hunerê min.

Tu li rojavayê Kurdistanê rewşa stran û muzîka Kurdi çawa dibînî?

Ligor destûdara (rewşa) em têde, bindestbûn û nehêlana xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî, nebûna tomargah û kenalên setelaytê di pêşketina muzîka Kurdî de rolek neyînî dilîzt. Berê eyb bû yek stranan bêjit, lê nûke berovajî, xwe di nav miletê xwe de serbilind dibînîm ,û spasiya miletê xwe dikim. Derbarey hunerê klasîk de, divêt mirov yariya pê neket. Heke bivên ciwankariyê têda bikin jî divêt ritma wê neguherin,biparêzin û strana klasîk ya resena Kurdî heyvên bikin. Mîna stranên Mihemed Eziz Sakir her dema mirov guh lê bibit, dikeve dilê mirov, çumkî resenatiya strana Kurdî têda diyare.

Li başûrê Kurdistanê li benda tene, tu çima hinde direng ma?

Pisti sala 1974an û têkçûna şoreşa Kurdî ,nemana Komela me ya hunerî û di sala 1979 de têkçûna têkiliyên Sûriyê ligel Iraqê, rê hat girtin. Em ji miletê xwe qut kirin. Piştî sala 1991an û heta niha jî destûdarê (rewşa) Kurdistanê cîhnegirtiye. Me jî nedixwest em liser wan bibin bar. Bi anehiya xwedê piştî ez ji Ewrûpa vegeriyam ezê wê miradê bicîh bînim.

Tu dixwazî tiştekî din bêjî?

Gazinda min ne ji miletê meye, çimkî em hunermend bi rêz û bi giranbihayî ji layê gel ve dihên pêşwazî kirin û di xizmeta me dene. Spas jibo gelê me ku li hunermendên xwe xwedî derdikevin .

Lê em kêmasiyê licem dezgehên ragehandina Kurdî, rojnamevaniyê û setelaytên Kurdan dibînin, ku li beramberî hunermendan bi erka xwe ranebûne, mafê me hatiye xwarin. Di 36 salên berdewamiya xebata mina hunerî de, kêm tişt ji me re hatiye kirin, divê li me bizîvirin.

Spas jibo te û Peyama Kurd ku we serdana me kir û bi rêka we em gihandine gel û hezjêkerên dengê me. Ez serkeftinê ji karê we yê piroz re dixwazim.

Hevpeyvîn: Mahîr Berwarî

Mehmûd Eziz Şakir

Mehmûd Eziz Şakir hunermend û stranbêjek kevin, xudan şiyan û serpêhatiye. Demek dirêje di xizmeta stran û muzîka resen (orîjînal) a Kurdî de ye û şiyaye rêçek taybet jibo xwe hilbijartiye. Mirov hêbet dimîne dema li xebata wan û dest û darê ew têdane dinêrit.

Mehmûd Eziz û hevalên xwe di demek wisa dest bi muzîka Kurdî kirin ku li himberî wan gelek astengî, zehmetî û aloziyên dijwar hebûn. Jiber vê mirov dikare Mehmûd Eziz û hevalên wî wek pêşmergên muzîk û strana Kurdî binav bike. Wan bingehek paqij jibo strana Kurdî danîn û jiyana xwe gorî hunera Kurdî kirin.Lewra stiranên wî reseniya strana Kurdî pêve diyare, parastine û bi berpirsiyarek netewî birêve biriye. Cihê xwe di dilê gel de çêkiriye. Stranên wî tucaran kevin nabin, her zindîne.

Peyama-Kurd bi erkek netewî hunermendê navdar Mehmûd Eziz hembêz kir û di serdana xwe ya Almanya de xwe gihand wî. Mehmûd Eziz bi dilxweşî daxwaza hevpeyvîna me bicîh anî û em jî wek Peyama Kurd jêre temeneki dirêj û bextewar dixwazin.



Ceribandin

Li te digerim

Cemal Özçelik

Li te digerim!
Lê ne li wê keça ku li dibistanê
Li tenîşta min rûdine
Û bi şînçavên xweyî bişirokî li min dinêre.
Ka tu li ku yî? Te xwe di xewnên şevan;
ew xewnên ku sibehan
êdî qet nayê bîra mirovan de veşart?!
Tu li kêleka min î,
lê ez dizanim tu ne ewa ku ez lê digerim î.

Em jiber baranê ne reviyabûn;
Her ku wê em bi dilopên xweyî
Şilmezeloqî avreşandî dikir,
me ewqasî bêtir hevdu himêz dikir,
lêvên xweyî ji heyecanê zuha bûbûn
weke ku mirov „elmalî şekir“ bialêse
bêtir bi lêvên hevdu didan
Em bûbûn mîna keç û xortên „lîselî“!

A xweş çibû, tu dizanî?
Her tişt ji xweber pêk hatibû..
Bê hesab û kîtab,
bê pîlan û lîstik..
Ne tenê çav û lêvên te..
Nerîn û maçên te jî xwezayî bûn.
Min ew di qalikê xweyî zirav
yê ku bedena min rapêçabû dihesand,
wan germahiyek didan ruhê minî qurmiçokî.

Xwezî tu ewqasî ne ciwan ba!
Ma bi rastî jî a ku
kûrnewal di navbera me de çêdikir ev yek bû?
Di qanûn û deftera evînê de
Cî ji mijarên weha re hebûn?
Di hezkirinên bê mîzan de
gerek yek têwer biba.
Wek hercar,
yê ket, cardi ez bûm.
Di kûrnewalan de li te digerim..

Destana Derwêşê Evdî wek DVD derket

PK-Sydney

Destana navdar Derwêşê Evdî ku heya niha ji aliyê bi dehan dengbêjan ve bi stran hatiye gotin, wek cara yekemîn liser DVD derket.

Ev berhem ji aliyê radyoya Kurdî SBS ve li Sydney hate amadekirin..

Destana Derwêşê Evdî, ji aliyê Baqî Xido ve hatiye gotin û bi dengê Şahîn B. Soreklî wek serpêhatî hatiye pêşkêşkirin

Destan ji 14 xelekan pêk tê.

Eger ku tu bikaribî bersiva vê pirsê bidî, wê DVD bê pere ji aliyê radyoya SBS ve ji te re bê şandin:

Navnîşana malpera beşê Kurdî yê SBS RADIO çi ye?

Bersîva xwe tev nav û navnîşana xwe bi email rêbike:

HYPERLINK „mailto:kurdish.program@sbs.com.au“ kurdish.program@sbs.com.au û ji xwe re DVD yekê qezenc bike.

www.kurdi.org

Kilmxeberî

Dihok de kurs diya rojnamewanan

Dihok- 28î Hezîran de bajarî kurdistan Dihok de semedî rojnamewanana yew kurs ame organîze kerdiş. Hende 40 rojnamewanî ke kovar û rojnameyanî û komelanî cemaatî ê ciya ciya de xebityenî, torî nê kursî bî.

3 kesî Holandî ke karî rojnamewanî de pisporî, îta de xeber û rapor nuştiş û roportaj kerdiş ser ders dûnî rojnamewanan.

No kurs 2 heftê rûmeno.

Kurdistan azad de bajarî modern yenî awankerdiş

Silemaniye- Hukumetî kurdistan hefte ku viyert dest ci awankerdişî 3 bajaranî modern kerd. Nê hîrê bajaran de 9 Henzar banî viraziyenî.

No projeyo komplex Tabîn de start guret. Temelî bajarî Tabîn bi yew merasîma perî serek wezirî îdareyî Silemaniye Ömer Fettah re erziya.

Çarçeveyî no proje de mintiqayî Tabin, Sitek û Zırgwez de 3 bajarî bi awaniyanî bingehin û karanî hizmeta yenî viraştiş.

Hereketa Referandomî kurdistan waşteyî xo pêşkêşî parlementoyî Kurdistan kerd



Hewler- 27î Hezîran de yew heyetî komîteyî Referandomî Kurdistan parlementoyî kurdistan ziyaret kerd. Ê bi cagirotê serekî parlementoyî kurdistana amê piye het û çend waşteyî xo eşkira kerd û yew waştişnamê zi pêşkêşî Parlementoyî kerd.

Ameyê Kaniya reş ame minaqaşa kerdiş



Çolig- Hefte ku viyert şarî Kaniya Reş ke ciya ciya bajaranî tirkiye de nişênî rue, amê piyeser û ameyê Kaniya Reş minaqaşa kerd.

Çimkî no demo peyin de Kaniya Reş de lez – lez erdlerz beno. Şarî Kaniya Reşa wazeno na pers re yew çare vîno

PEN`a Kurd ra rojî edebiyatî kurdî



Hamminkel- PEN'a – KURD bênatê rojanî 24 – 26 Hezîran de bajarî Almanya Hamminkeln de, Akademiyî Klausenhof de semedî endamanî xo ya rojî edebiyatî kurdî kêrd hedre.

Nê hîre rojan de nuştoxî ke îta de hedre bî, eseranî xo ra parçeyî wendî. Hanc îdareciyanî PEN gerayişî xo ê Diyarbekîr û başurî kurdistan ser û kombiyayişî PEN'a enternasyonal ê 71. ke Bleda- Slovenya de viraziyaybî, agahdarî da hedreyan

Çend nuştoxî ke torî na çalakî bî nê yî:

Zerdeşt Haco, Mustefa Reşîd, Salihê Kevîrbirî, Yûnis Behram, Dilbixwîn Dara, Muruvet Cacim, Seyidxan Kurij, Munzur Çem, Elî Cafer, Ferîd Xan, Ferzende Çelîk, Evdile Koçer.

Persane ma ser nuştox **Munzur Çem** derheqî rojanî edebiyat de vînaye xo îna ard ziwan:

"Bi qenaatê mi no çalakî karêde baş o. Labelê ser o qeseykerdiş û dîskusyonî kî hewce yê. Endamê PENa Kurd tena Almanya de nîyê. Seba ke çalakîyê winasî welatanê Ewropa yê bînan de kî bêrê amadekerdene, ganî kar bêro kerdene.

No derheq de nuqtayêda bîne kî nawa: Gelo ecebe PEN neşkîna, nê karî sey şew ya kî roja kulturî amade bikero?

Hetê metodî ra, bi qenaatê mi ganî yan nuştoxî eseranî xo biwanê, ser o dîskusyon viraziyo, yan zi tenya persî bêrê perskerdene. No, armancê merdimî ra girêdayî yo. Labelê ez metodê diyine tercîh ken. Yanê nuştox eserê xo biowano, va goşdayoxî kî persan pers bikerêne. Çi ke seba dîskusyonê eserêde edebî, zanayîş lazim o. Her kes nêşkîno nêr karî bikerone û no semed ra kî dîskusyonê de winasî netîceyêda rinde nêdano.

Eke rewşe dest bidone mi, ez wazen ke ewro ra pey kî amadeyê nê kombîyayîşan ben. Labelê ke merdim bişkîyo, hûmara amedebîyayoxan zîyade kerone zaf rind beno. Heto bîn ra merdim tenya wendişî ser o kî mefikirîyone. Persanê ziwan û kulturî, persanê kar û gureyê PENa Kurd kî ganî rojeve de ca bigêrone ke ma no kombîyayiş de no kar kerd ke no ke bahs bî.

Serekî Kurdistana Federe bi serek û sekreteranî partiyanî Kurdistanî ya ame piye het



27î hezîran de gazî kerdişî serekî Kurdistana Federe ser yew kombiyayiş viraziya. No kombîyayiş de piyerê hêzanî sîyasî ê başûrî Kurdistanhedre bî. Serekî kurdistan gerayişî xo ê Baxdat ser agahdarî da hedreyan û va ke ma gereka piyeri yew bi û semedî ca ardişî madeyî 58, destûra newî ê iraq û federaliye piya bixebit.

Mesûd Barzanî eşkira kerd ke o û Celal Talabanî derheqî nê persan de sey piye fikiryen

Hawafira eskerî ra yew bomba ginay yew banî re



Amed- 25î Hezîran de Dîyaerbekir de Fermandariye hêzî ezman re semedî perwerdeya yew hawafira tîpa F4 wirişt Wext ke na hawafir bajar ser firdayn, ti ra yew bomba kot yew banî ser. No ban de kes çîniyeb û bomba nêteqay, no rid ra kes nêmerd û birîndar nêbi

HAK-PAR: Gereka PKK metodanî çekdar caverdo û dewlet zi heqanî şarî kurd qebûl bikero

Kurula serektiye HAK-PAR 26î Hezîran de amê piyeser û semedî raya peroyî ya yew eşkirakerdişî çapamenî kerd vila.

HAK-PAR no vilavokê xo de, şerî çekdarî zerar dûno tekoşîna sisyasî yê şarî ma vûno û vînayê partî îna ûna ziwan"

No demo peyin de hancî şer û şidet beno zêd. No qide miyanî cemaat de bêhuzurê bena zêd, semedî provakasyonana şartî benî hedre. Eskeranî tikr kurdistan de newe ra dest bi operasyonan kerd. Nê operasyon û cigêrayiş şarî ma bêhuzur keno. Hancî mersaîmê cenazayan de biyayê nêweş û provakasayon yenî meydan.

Şero ke 15 serrî rûmit, şarî kurdistan re yew faydê xo nêbi. No şer zi şarî kurdistan re yew fayde nêano. No şer hêna zaf dormarê şovenîstan û mîlîtarîstan re fayde ûno. Ê nêwazenî tirkiye demokratîze bo û semedî dekotişî Yewbiyayê Ewropaya gaman berzo.

HAK-PAR bawerkena ke kurdî ancax bi riyê siyasî, bi metodanî demokratîk û girseyî eşkenî azad bî. Şerê çekdarî zerara dûno şarî ma.

No semd gereka PKK çekanî xo rueno, metodî çalakiyanî çekdar caverdo û ni qide rûn mesawo nûnê derdoranî şovenîst-mîlîtarîst.

Per bîn ra esasî xo de politîkayê dewlet rayer dûna çalakiyanî çekdar. Gereka dewlet na politîkayê înkar, red, tekcî û primitîv caverdo. Gereka dewlet heqanî şarî kurd ê bingehîn qebul bikero.

Komîteyî heqî merdiman ê suriye raporî xo eşkira kerd

27î Hezîran de Komîteyî heqî merdiman ê suriye raporî xo ê serrî eşkira kerd. Gorî no raporî suriye de halî heqî merdiman nê 5 serranî peyin de resawo qonaxo en pîs.

No rapor de halî heqî merdiman îna yeno eşkira kerdiş: „ Îşkence hama ho rûmeno, na serra peyin de 13 kesî îşkence ra merdî, înan re 11 kesî kurdî. Nika suriye de 3000 kesî sebebanî siyasî û emniyet ra hê hepisxane de ê".

Malmîsanij:

Seba ke ma yewbînî ra hîna weş fam bikî, ma rê ziwanêko fesîh (akerde) lazim o

Peyama Kurd: ***Ti serranî 1970 ra kirdkî nusenî. Heta o wext qet kirdkî bi herfanê latînî nêamebi nuştiş. To bi ruh, çi motîvasyon dest bi nuştiş kerd? Senî ame to vîr ke ti kirdkî binusî?***

Malmîsanic: Xortîya mi de yew defterê mi bi, mi ge-ge tede rojaneyê (gunluk) xo û notê xo nuştînî. Nê nuşteyê mi bi tirkî bîy la çîyê ke mi nêwaştinî kesna (çewna) fam biko mi kirmanckî (zazakî, kirdkî) nuştînî. Mi çend deyîrê ma zî tede nuştbî, semedê xo. O wext mi alfabeya kurdî nêzanaynî. Mi bi herfanê alfabeya tirkî nuştinî la nê herfî semedê nuştişê kirmanckî bes nêbî. Mi goreyê xo yew çare naye rê dibi, mi bi îşaretan çend herfî zêde kerdibî.

Unîversîte de mi fariskî û erebkî wend. O wext mi dî ke gelek kelîmeyê kirmanckî, fariskî û erebkî mîyan de zî estî. Musayîşê fariskî û alfabeya erebkî mi rê yewna rayîr akerd, çîyê ke mi nêwaştinî kes fam biko mi o wext reyrey bi herfanê erebkî nuştînî. Dima çend kitabê kurmancî (kirdaskî) kewtê destê mi. Wextê wendişê fariskî û kurmanckî de ez fikirîyaya ke ez eşkena hîna zaf kirmanckî binusa. Madem nê kelîmeyê ma erebkî û fariskî de nusîyînî, çira bi kirmanckî nuşte û kitabî nênusîyî?

Mi ke alfabeya kurdî şinasnay, mi hinî (êdî) bi herfanê kurdkî nuşt. Bêguman nuşteyê min ê kirmanckî tay bîy, zaf nêbîy.

Wexto ke to dest bi nuştişî kerd, bi kirdkî qet xebatê gramerî çin bî. Tu bi çi ûsul û qaydeyan a nuşt?

Yew avantajê mi bi, mi tirkî het erebkî, fariskî û franskî zî wendbi.

Mi ke nê ziwanan (zûnûn) de kitabî wendinî, ez teşwîq bînî, mi xo bi xo vatinî "her kes bi ziwanê xo nuseno, çirê merdim kirmanckî zî nênuso?" Wextê wendişê nê ziwanan de mi rey-rey goreyê zanayîşê xo hetê gramerî ra zî kirmanckî û nê ziwanî muqayese kerdinî. Mi xo het vatê "lazim o ke ferheng û gramerê ma zî bibo ke merdim ziwanê ma tehlîl biko".

Mi o wext kirmanckîya mintiqayanê bînan weş nêzanaynê. 1973 de mi unîversîte qedînay. Unîversîte dima mi Kurdistan de malimî (mamostayî) kerde. Wexto ke ez malim bîya mi dest bi hazirkerdişê ferhengê (sozlugê) kirmanckî kerd. No gure tim vîrê mi de bi: Mi vatê "ez nê ferhengî temam bika". Mi wendekaranê (telebeyanê) xo ra kelîmeyê mintiqayanê bînan pers kerdinî. Verê mi vatê qey ez hol kirmanckî zana la mi ke dest bi nuştişê ferhengî kerd, mi fam kerd ke ez kirmanckîya mintiqayanê bînan hol nêzana. A roj a na roj a ez persena û xebitîyêna ke kirmanckîya cayanê bînan hîna weş bimusa.

Wexto ke mi dest pêkerd kovaran de nuşt, mi goreyê zanayîşê xo nuştinî. Hem hetê gramerî ra hem zî hetê rastnuştişî (îmla) ra. Çunke seke to zî va, o wext gramerê kirmanckî destê ma de çin bi. Tena gramer ney (nê), nuşteyê bi herfanê latînkî zî çin bîy. Kesê ke ez tecrubeyê înan ra îstîfade bika xora çin bîy. Nê zî bes nêbî, mi nuştînî la merdimanê ke bizanaynî biwanî zaf-zaf tay bîy. Yanî teşwîqêk çin bi. Kirmancan bi xo zî qîymet nêdaynê kirmanckî. Tayêne mi ra vatênê "ti gureyanê vengan de meşxul benî". La mi ziwanê xo ra hes kerdinî û mi vatê bi ziwanê ma, yanî kirdkî zî merdim ganî binuso. Cuwe ra a roje ra heta ewro mi îsrar kerd û nuşt. Yew qala yew embazî hema zî yena vîrê mi, vatbi "To nanê xo dekerdo çanteyê xo, ti kewtî kirdkî dim a". Eke ez ziwananê xerîban -mavajî tirkî yan zî franskî- ser o bixebitîyaynê kesî rê xam û ecayîb nêameynê la ez ke ziwanê ma ser o xebitîyaynê tayêne rê ecayîb ameynê. Semedo ke ferqê mintiqayan estbîy, çend merdimanê ke zanaynî kirmanckî biwanî zî weş fam nêkerdinî. Bê nînan, tim rîskê cezawerdişî bi. Eke polîsî rêzêk (yew satire) kurdkî zî to het bidînî, sereyê to dejaynî. Merdim mecbur mendinî ke nuşteyanê xo û kitab û kovaranê kurdkîyan tim binimno.

Hetê ra zî ez bi xo gramerê kirmanckî ser o xebitîyaynî û mi ge-ge babetê (behsê) gramerî nuştinî. Yanî ez yew het ra musaynî yew het ra zî mi musnaynî. Ez çend ke musaynê, qaydeyanê min ê nuştişî hende hol cayê xo girewtinî.

Şima 1997 ra nat bi nameyê grûba "VATE"yî hem kirdkî ser o xebat kenî hem zî bi nameyê "VATE"yî yew kovare vecenî. Ti na xebate senî vînenî? Goreyî to prosesî serkaxiteardişî lehçeya kirdkî de cayî na xebate çi yo?

Bêguman ez bawer kena ke faydeyê xebata Grûba Vateyî esto, eke ez bawer nêka ez tede ca nêgêna. La weş nîyo ke merdim wesfê xebata xo bido. Teqdîr yê (ey) wendoxan û tarîxî yo. Seba persê to eke ez kilm vaja, xebata Grûba Vateyî tesbîtkerdişê termanê (terîmanê) kirmanckî, rastnuştişê kirmanckî û standardîzekerdişê na lehçe ser o ya. Netîceyê na xebate se Ferhengê Tirkî-Kirmanckî (Zazakî) û Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî neşr bîy. Xebata ma ya bîne zî kovara Vateyî ya. Na kovare tena kirmanckî ya û heta ewro (êro) 24 hûmarî vejîyaya. Kalîteyê nuşteyan ser o teqdîr zî -seke mi va-, yê wendoxan o. Ez hêvî kena ke nê xebatê ma, îstîqbalê lehçeya kirmanckî ser o tesîro pozîtîf bikîn.

Kovar û rojnameyê kurdan ê ke paştîyê înan de rexistinî siyasî çin î, emirî înan zaf nêrameno. Vate senî hende wext o vecîyeno.

Ma bi bawerî, qerardarî (kararlilik) û fedakarî nê karî kenî. Wexto ke ez vana "ma", meqsedê mi tena ez û embazê redaksîyonî nîyî. Embazê ke Grûba Xebate ya Vateyî de yê, nuştoxê ma, aboneyê ma, wendoxê ma, nas û dostê ke piştî (destek) danê karê ma, rolê pêrune (hemîne) tede esto.

Grûba Vateyî de sere ra kesî ke traditsiyonanî siyasîyan ê ciya-ciyayan ra yenî, pîya xebitîyenî. Kurdan de, çi heyf ke yew traditsiyono winasî (îna) çin o. Şima senî no kar de ser kewtî?

Kesê ke na xebate de ca gênî, zanî ke ziwan (zûn) miletê ma rê zaf muhîm o û wazenî ke goreyê zanayîş û taqetê xo nê warî de xizmet bikî. Bêguman nê embazan ra her kes wayîrê tecrube û fikranê sîyasîyan o û nê fikrê înan cîya-cîya yî. Fikrê ma cîya bibî zî ziwanê ma yew o. Eke ma ziwanê xo yê muşterekî xurt bikî, ziwanê ma standardîze bibo, faydeyê ma pêrune naye de esto. Seba ke ma yewbînî ra hîna weş fam bikî û tercîhanê xo yê fikrî û sîyasîyan bikî zî ma rê ziwanêko fesîh (akerde) lazim o. Semedo ke ez bieşka derheqê fikranê to de qerar bida, lazim o ke ez ziwanê to ra weş fam bika. Yanî şerto verên famkerdiş o. Famkerdiş bi ziwan beno. Ziwan zî, ne tena ziwanê dewa min o û ne zî tena yê dewa to yo. Ma ganî formanê muşterekan tesbît bikî ke roj bi roj wendiş, nuştiş û famkerdiş hîna asan (rehet) bibo.

Xebatê "VATE"yî re zaf zî rexneyî yenî. Ma cuwa ver nuştêni, ê mintiqayanî bînan vatênî ke ma fam nêkenî. La qet nêbo çewlîgijan fam kerdenî, nika Çewlîgij zî vanî ke ma fam nêkenî. Eceba grûba Vateyî meseleyî standartkerdişî de biney ecele nêkena? Semedî çerkeridşî (helkerdişî???) nê meseleyî yewna rayîr çin o? Tîya de qestî mi o yo ke wendoxî hîna asan bieşkî biwanî.

Normal o ke rexneyî bibî çunke kesî kirmanckî wendegeh (mekteb) de nêwenda, zaf kesî wendiş û nuştiş zî nêzanî. La ez bi xo bawer nêkena ka xebata standardîzekerdişî rew (ro) bîya. Ti mi ra bipersî, na xebate erey zî kewta, ganî rewna bibînî. Eke ma ra ver bibînî, ewro karê ma hîna asan bînî. Eke ma ewro na xebate bidomnî, beno ke meşte karê qicanê ma bineyna asan bibo. La ez ke naye vana ez nêwazena vaja ke wa xebata standardîzekerdişî lezkanî (ecele) bibo. Ney, lazim o ke na xebate bi sebr, bi zanayîş û bi tehlîlanê derg û dilayan bibo. Hetanî ke destê ma ra yena ma nê xususan de dîqet kenî la ma zî merdim î, her çîyê ma mukemel nîyî. Sey her merdimî xeletîyê (şaşîyê) ma zî benî.

No mesele tena meseleyê yew dewe, yew qeza yan zî yew bajarî nîyo. Eke kirmanckî de tena fekê Çewlîgî yan zî fekê Dêrsimî bibînî karê ma hîna asan bînî. La mintiqayê bînî zî estî. Eke ti tena bi fekê Çewlîgî binusî, na rey şarê mintiqayanê bînan, mavajî yê Dêrsimî, Sêwasî, Erzinganî, Gimgimî, Dîyarbekir, Sêwregi, Motkî weş fam nêkeno. Eke çewlîgij vajo "lîya de fûm nêkên wa fûm nêkirî, mî r' çi", yew sêwregij eşkeno vajo "la qandê çiçî ti wina vanî, dimlîya ma dahana weş a", dêrsimij zî eşkeno vajo "ti çitur hen vana, kirmanckîya dêrsimî zof wes a". Eke ma ra her kes fekê mintiqaya xo tercîh biko, ziwanê standard ê nuştişî aver nêşono. Her kes ganî bizano ke kirmanckî tena yê yew mintiqa nîya û lazim o merdim bixebitîyo ke yê mintiqayanê bînan zî bimuso. Hîna zaf zî kesê wendeyî û nuştoxî ganî naye bikîn. Eke wina nêbo û her kes çarçeweya dewa xo de bimano, ziwanê nuştişî aver nêşono. Merdim ganî naye zî xo vîr a nêko ke ferqê ziwanê nuştişî û qalîkerdişî (qiseykerdişî) esto.

Kovar û rojnameyî ganî tekstanê (metnanê) folklorîkan zî neşr bikîn ke wendoxê ke kirmanckîya mintiqayanê bînan nêzanî tekstanê fekê mintiqaya xo biwanîn û vera-vera wendişê kirmanckî hîna hol bimusîn, dima zî ziwanê standardî bimusîn.

Wendoxê jêhatî tena qusurê nuştoxan ney, qusur û tembeleya xo zî vînenî.

Roportaj: Seyîdxan Kurij

Mi ziwanê xo ra hes kerdinî û mi vatê bi ziwanê ma, yanî kirdkî zî merdim ganî binuso. Cuwe ra a roje ra heta ewro mi îsrar kerd û nuşt. Yew qala yew embazî hema zî yena vîrê mi, vatbi "To nanê xo dekerdo çanteyê xo, ti kewtî kirdkî dim a". Eke ez ziwananê xerîban -mavajî tirkî yan zî franskî- ser o bixebitîyaynê kesî rê xam û ecayîb nêameynê la ez ke ziwanê ma ser o xebitîyaynê tayêne rê ecayîb ameynê





شاری ڤینیسیای ئیتالیا ئاهەنگی سالّڕۆژی پەنابەران دەگێڕێت

ئیتالیا ـ گوڵاڵە زەنگەنە ـ سەر لە بەیانی ڕۆژی ٢٠٠٥/٦/٢٠ لە یادی سالّڕۆژی پەنابەران، شارەوانی شاری ڤینیسیا (Comune di Venezia) بەشی خزمەت و یارمەتی بۆ پەنابەران، وەک هەموو سالّێک بەم بۆنەوە کونفرانسیکی ساز کرد، بە ئامادەبوونی سەرۆکی شارەوانی و چەند پسپۆڕ و شارەزایەک لە بواری پەنابەریدا و چەندین ڕێکخراوی بیانی، یەکێک لەوانە "کۆمونیتای کورد لەئیتالیا"، وەک شاهید بەحاڵیش چەند پەنابەرێک و میوانانی سەنتەری پەنابەری ئەم شارەش بەم بۆنەیەوە بە چەند وتارێک، بەشدار بوون.

پاشان، هەر بەشی خزمەت و یارمەتی بۆ پەنابەران، ئەرکی نانخواردنی نیوەڕۆی میوانانی سەنتەری پەنابەرانی شاری ڤینیسیا سەنتەری BOA و هەموو ئەوانەی کە هاوکارن و کاری تیدا دەکەن، خستە ئەستۆی خوی لە دورگەیەک لە شاری ڤینیسیا، هەموو میوانان و بەشداران کەوتنەڕی بە یەخت لە ناو کەنالەکانی شاری ڤینیسا بە ئالای ڕەنگاوڕەنگ. ئەوەی شایەنی باسە وێنەی تایبەتی وێنەکێشی کوردی خۆرئاوای کوردستان، س. حەسەن کە پەنابەرە لەم سەنتەرە، کرا بە پۆستەر و لە شارەکەدا بڵاوکرایەوە.

هەر بە بۆنەی ڕۆژی پەنابەران دوای چاوپێکەوتن لەگەڵ لێپرسراوی گشتی بەشی پەنابەران لە ڤینیسیا- ئیتالیا خانم ڕۆزانا مەرکاتو (Rosanna Marcato)، بەهەلم زانی چاوپێکەوتنێکیش لەگەڵ هاوکارم دکتۆر کامەران ڤان بکەم چ وەک لیپرسراوی بەشی ڕۆژهەلّات وئەفریقای باکور، لە سەنتەری پەنابەران BOA و چ وەک جێگری سەرۆکی کورد لە ئیتالیا. سەنتەری پەنابەری شاری ڤینیسیا(BOA) کە لەلایەن دەولّەت و کۆمونیتای ئەورووپا و شارەوانی ڤینیسیا مووچەی تایبەتی بۆ تەرخان کراوە و هەروەها ئەمە بەشێک لە پڕۆژەیەکی گەورەترە لە سەرتاسەری ئیتالیا بە ناوی "پلانی دەولّەتی بو پەنابەران"، ئەم سەنتەرەی ئێمە بەشێکە لەم پڕۆژە گەورەیە. چەند پر سیارێکم دەربارەی پەنابەر بە گشتی و پەنابەری کورد بەتایبەتی، ئاراستەکردن..

.خانم ڕۆزانا:

پرسیار: هەرچەندە هاوکاری جەنابتم لە کاردا، بەلام ئەمەی خزمەت بناسێتی بە خوێندەری پەیامی کورد ؟

وەلام: ناووم ڕۆزانە مەرکاتو، لە سالّی ١٩٩٢. هەستم بە گرنگی کارکردن بۆ پەنابەران کرد. ئەمڕۆ بەڕێوەبەری بەشی خزمەت و یارمەتی بۆ پەنابەران لە شارەوانی ڤینیسیا مووچەی تایبەتی بۆ تەرخان کراوە و هەروەها ئەمە بەشێک لە پڕۆژەیەکی گەورەترە لە سەرتاسەری ئیتالیا بە ناوی "پلانی دەولّەتی بو پەنابەران"، ئەم سەنتەرەی ئێمە بەشێکە لەم پڕۆژە گەورەیە. چەند پر سیارێکم دەربارەی پەنابەر بە گشتی و پەنابەری کورد بەتایبەتی، ئاراستەکردن.. .خانم ڕۆزانا:

پرسیار: هەرچەندە هاوکاری جەنابتم لە کاردا، بەلام ئەمەی خزمەت بناسێتی بە خوێندەری پەیامی کورد ؟

وەلام: ناووم ڕۆزانە مەرکاتو، لە سالّی ١٩٩٢. هەستم بە گرنگی کارکردن بۆ پەنابەران کرد. ئەمڕۆ بەڕێوەبەری بەشی خزمەت و یارمەتی بۆ پەنابەران لە شارەوانی ڤینیسیا.

ئەو کاتە هێشتا دوو سالّ بوو کە ئیتالیا ڕێگای ئەدا کە داوای پەنابەری بکرێت و هەر لەو ساڵەشدا شەری یۆگۆسلافیا دەستی پێکرد و شارەکەمان شاری ڤینیسیا بە سەدان پەنابەری گرتە خۆی و لەو زەمانەدا هیچمان نەبوو فریامانکەوێت، زۆر هەوڵم دا بۆ ئەوەلامی شارەوانی سەنتەرێکی پەنابەری بکاتەوەلام. لەو کاتەوەلام تا ئێستا زۆر شت گۆڕاوە و توانیمان بەشێک دروست بکەین لە ناو شارەوانی ڤینیسیا کە سەنتەرێک بۆپەنابەران بگرێتە خۆی، لەگەڵ چەندین خزمەتگوزاری یاسایی و کۆمەلایەتی تەندروستی و قوتابخانە و زمان بۆ زیاتر لە ٢٠٠ کەس لە سالێکدا کە ئا لەم سالانەدا توانیم گرووپێک دروست بکەم بۆ ئەوەی کاربکەین بەیەکەوە، ئەمڕۆ ئێمە وەک جەیشێکی ئامادە و چاولێکەر سەرمان ئەکرێت لە چاوڕاستی ئیتالیا

پرسیار: ئەوسەنتەرانەی کە بۆ پەنابەران هەن، کامانەن ؟

وەلام: ٥٠ شوێنمان هەیە بۆ پیاو (زوگورتی) ٥٥ بۆ خێزان و ئافرەتان کە منالیان هەیە، ئەم سەنتەرانە زۆر ڕێزیان لێ ئەگیرێ میوانەکانیش سەربەستن لە هاتوچۆ یان، بەرانبەر ئەمەش داوای ڕێزو خوێندنی زمانیان لێ دەکەین.

ئەو پر سیارانەی کە لێت دەکەم زیاتر تایبەتە بە پەنابەری کورد و لەبەر ئەوەی ئەم چاوپێکەوتنە بۆ ڕۆژنامەیکی کوردییە.

پرسیار: چەند سالێکە کورد ئەناسیت و هەلسوکەوتیان لە گەڵ دەکەیت، چ ڕاو بۆچوونێکت لە سەر کورد لا دروست بووە‌لام ؟

وەلام: مەسەلەی سیاسی کورد زۆر سەرنجمی ڕاکێشا زیاتر لەو کاتەی کە چەندین کورد گەیشت بۆ ڤینیسیا لە سالّی ١٩٨٠ کە کوردی عێراقی بوون ئیستا چەند کەسێک لەوانە لە گەڵم کاردەکەن .

ئەبێت ئەوە دیاری بکەم کە جیاوازییەکی کولتووری وسیاسی زۆر هەیە لە نێوان عێراق، سوریە، ئێران و تورکیا، لەو باوەڕەدام کە ئاپارتاید و چەوسانەوەی باری سیاسی لە تورکیا نیشانێکی وای بە قوڵی جێهێڵاوە کە بە شێوەیکی تر دنیا ببینن و بیر بکەنەوە .لەگەڵ ئەوان مشکلەمان هەبوو و مشکلەمان هەیە تا ئیستا بۆ لەیەک تێگەیشتن و هەوڵیش ئەدەین کە تێگەڵ کۆمەڵگای ئیتالّی نەبن.

پرسیار: دوای ئەو گۆڕانکاریەی کە ڕوویداوەلام لەو ناوچانەی کە کوردی لێ دەژی ، وەلامک گۆڕانکاری عێراق و چوونە ژورەوەی تورکیا بۆ ناو یەکێتی ئەورووپا و هتد، چ کاریگەرییەک دەکاتە سەر ئەوەی کە پەنابەر، مافی پەنابەری بدرێتی؟

وەلام: بێ گومان، ئەو گۆڕانکاریانە کار دەکاتە سەر پەنابەر، کوردی عێراق ئیستا زۆر کەم بووە بەهەر حاڵ زۆر زەحمەتە پەنابەرییان پێ بدرێت، هەمان شتە بۆ کوردی تورکیا لە سالّی ٢٠٠٢ەوە تا ئیستا زۆربەی وەلامی نێگەتیڤی وەر گرتووە.

پرسیار : چەند ساڵە، سەنتەری پەنابەری هەیە لە ڤینیسیا، تا ئیستا چەند پەنابەری کوردی گرتووەتە خۆی ؟

وەلام: وا بزانم لەم سالانە یا زیاتر لە ٣٠٠ کوردمان وەرگرتووە و هاوکاریمان کردوون، زۆربەی ئەوانە ئیستا زۆرباش ڕاهاتون و ژیان بە باشی دەبەنە سەر.

پرسیار : کورد مافی داواکردنی پەنابەری هەیە، بەلام لە سەر دۆکومێنتەکانیان کە پێیان دەدرێت، نیشانێک دادەنرێت یاخود نانوسرێت کە کوردن، چی ئەلێت لە سەر ئەم شتە ؟

وەلام: وەک میژوو نیشانی داوە هەموو نیشانەیەک کە ڕەگەز جیاوازی بکات، خەتەرە.

پرسیار : چ جیاوازییەک یاخود گۆڕانکارییەک ڕویداوە لە ساڵانی پێش و ئێستا لە سەر یاسا و مافی پەنابەری لە ئیتالیا، چ بۆ داهاتوو، بە دی ئەکرێت ؟

وەلام: بڕگەی ژمارە ٠٢ : ١٩٠ یاسای پەنابەری بەردەوام لە ئیتالیا ئەگۆڕێ ، ئەمڕۆ لە هەموو ئیتالیا ٧ دادگا هەیە بۆ پەنابەر بە پێچەوانەوە کە جاران هەر دادگای ڕۆما هەبوو بۆ ئەوەی گوێ لە پەنابەر بگرێت و ماوەیکی زۆری ئەخایاند، بەلام ئێستا لە ماوەی یەک مانگ لە سەنتەری پەنابەری دەمێنێتەوە کە سەنتەرێکی داخراوە و ئازاد نین و لە ماوەی ٢٠ ڕۆژ وەلامی پرسیارێ دەدرێت، حکومەتی ئیتالیا پەنابەر بە تێکەڕێکی یاسا لە قەلەم دەدات و سیاسەتێکی توند و تیژ، لە دژی بەکار ئەهێنی، وەک سنووورداشتکردن و پاڵ پێوەنانی وەک ئەوەی کە لە شاری لامپە دووزە ڕویدا بە پێچەوانەی یاسای نێو دەوڵەتییە وە.

پرسیار : بێ گومان پەنابەری کورد لە ئیتالیا، پەیامی کورد دەخوێنێتەوە. ئەتەوێ‌چیان پێ بڵێیت لە ڕێگای ئەم ڕۆژنامەیەوە؟

وەلام: ئەمڕۆ ڕۆژی دروست کردنەوەیە نەک ڕاکردن، بەڕای من باش تر وایە مانەوە لە وڵاتی دایک ئەگەر هیوایکی بچوکیش هەبێت بۆ دروستکردنی دواڕۆژێکی باشتر، هەر وەک باپیرانمان وتویانە نانی غەریبی نانێکی تاڵە.

من زۆر حاڵەتی ناخۆش و زەحمەت کێشانی پەنابەر دەزانم لە ئەورووپا، زۆر جار پەنابەران لە چاوی ئێمەی دەزانن چونکە وا دەزانن کە ئێمە ئەوەندە گرنگییان نادەینی، بەلام ئەوەی کە لەگەڵ ئێمە کار دەکات ئەزانی چەند هیلاک ئەبین تا یارمەتی ئابوری پەیا دەکەین بۆ ئەوەی بتوانین یارمەتی پەنابەرانی پێ بدەین چ لە لایەن یارمەتی مافەکانەوە چ لەلایەن ژیانی ڕۆژانەوە. زۆرجار هەست ئەکەین بە تەنهایین لە مەیدانی شەری ڕۆژانەیا بەتایبەت کە گوێمان لە ڕەخنە و گلەیی ئەو کەسانە ئەبێت کە یارمەتیان ئەدەین وە ک بلێیت ئێمە یاسا دابنێین. پێخۆشحاڵ ئەبین لەباتی ئەوەی خۆمان وەک کاروانی ڕێگا دابنێین بەشدار و هاوکاری یەک بین، بەڕەو جیهانێکی پاک و باشتر ..

چاوپێکەوتنەکەی کامەران ڤان:

ئەگەر بکرێت خۆت بە خوێندەری پەیامی کورد بناسێنی؟

وەلام : ناوم" کامەران ڤان" ە لە دایک بووی کەرکوک . کوردستانم لە ساڵی ١٩٨٠وە لەئیتالیا دەژیم هەر لێرەش خوێندنی زانکۆم تەواو کردووە ، لێپرسراوی بەشی ڕۆژهەلّات و ئەفریقیام.

پرسیار: ئایا ئەوانەی لێرە دەژین سەربەستن لە هاتو چۆ؟

وەلام: بێ گومان ئەوانەی لە سەنتەری ئیمە دەژین سەربەستن لە هاتو چۆ

پرسیار: چۆنێتی بەڕێوەبردنی لە لایەن ئیوەوە ؟

وەلام: زور هەوڵ ئەدەین کە میوانەکان لە هەندیک کار و باری سەنتەرەکە بەشدار بن، وەک پاک و خاوینی سەنتەر و شوینی نان خواردن هتد. چونکە ئەمانە هەموو شوێنی هاوبەشن، و هەوڵ ئەدەین کە کات و ڕۆژانەی خویان بە سوود بە سەر بەرن، لێرەش هەر کەسێک بەڕپرسی لایەنێکە و لایەنی تەندروستی و بیروکراسی کارەکانی دۆکومێنت و وەرزش و زمان و کولتووری ئیتالی وّ هتد...

پرسیار: وک ئاگادار بیت بینینی پەنابەران چونە بو ئەورووپا(ئیتالیا) ؟

وەلام :زور جار بینینێکی چەوت هەیە لە ئەورووپا بە بۆنەی قسەوقسەلۆکی خەلک ودۆست هتد، یان بە بینینی تەلەفزیۆن هەموو شتێک بە بریقەدار دەبینن لە سەرەتاوە، دوایی دەکەوێتە تەلّەکەوە بەتایبەت لە وڵاتە کەمتر دەولّەمەندەکان لەو وڵاتاکانی ئەورووپا، پەنابەر دوای ئەوەی کە ئیقامە و پاسپۆرتی پەنابەری دەدرێتی و هیچی تر، نە مانگانە و نە خانو. ■■■



وێنەی شێوەکاری خۆرئاوای کوردستان، س. حەسەن کرا بە پۆستەر و لە "ڤینیسیا"دا بڵاوکرایەوە

پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو

خێو و جنۆکە و نوشتە!!

زەردەشت خورمالّی

مرۆڤ بە شێوەیەکی سرووشتی، خولیای بابەتی ناشاسایی و"غەیبی"یە و، هەمیشە ئارەزووی ئەوەی کردووە کە، شتێک سەبارەت بە ئایندەی خۆی بزانێت، بۆیە بە درێژایی مێژوو، ئەو کەسانەی کە جۆرە توانایەکی ناشاسییان هەبووە، سەرنجی دەوروبەرەکەی خۆیان ڕاکێشاوە و، سوودی جۆراوجۆریان لەو توانایەیان وەرگرتووە. هەرچەندە لێرەشدا دەبێت دان بەوەدا بنێین کە لە ڕاستیشدا، هەندێک مرۆڤ، جۆرە توانایەکی ناشاسییان هەیە کە ئاست و بازنەی یاساکانی سروشت دەبەزێنێت. دکتۆر"ئەلکسیس_ کارێل"، وەرگری خەلاتی نۆبل، لە کتێبە ناودارەکەی"مرۆڤ ئەو نەناسراوە"، دەڵێت: (مرۆڤ توانای شاراوەی هەیە، کە دەتوانێت لە ڕێگەوەی زۆر شتی ناشاسایی بکات.) هەروەها دکتۆر"جوزیف مۆرفی" لە کتێبی"توانای مۆر"دا، دەڵێت: (مرۆڤ دەتوانێت لە ڕێگەی پەرەپێدانی توانا شاراوەکانی، زۆر کاری ناشاسایی بکات، وەک فرین یان ڕۆیشتن بەسەر ئاو.) هەڵبەتە بەندە بە هۆی ئەوەی کە ماوەیەکی زۆر خولیای ئەو جۆرە شتانە بووم، زانیاریەکی ئەوتۆم لەو بارەوە هەبوو. شەوێکیان، بە ڕێکەوت لەگەڵ هاوڕێیەکمدا، ڕێم کەوتە مالی خزمێکیان کە بەناو زۆر ڕۆشنبیر و پێشکەوتوو خوازیوون و، باوەڕیان بە هیچ بابەتێکی میتافیزیکی نەبوو، ئەو خێزانە پێکهاتبوو، لە ژن و مێردێک و دوو کور و کچێک، کە هەرسێکیان لە هەرزەکاری تێپەڕیبوون. وەک لە یادمە، زستان بوو، قسەی تەنیشت"عەلادین" تام و چێژێکی تایبەتی هەبوو، بۆیە چەندەها بابەت باس کرا، تا سەرەنجام باس هاتە سەر مەسەلەی خێو و دێو و دڕنج و بەخت گرتنەوە و ڕوح ئامادەکردن. هاوڕێکەم هەر ئەوەندەی کە وتی هاوڕێکەم"ڕاتە بەندە" لەو بارەوە شت زۆر دەزانێت، هەموو ئەندامانی ئەو خێزانە لێم هاتنە وەلام و کردیانم بە کێودا. نەک هەر ئەوەندەش، بەڵکو ناو بە ناویش پێیان ڕادەبواردم! بە هەر حاڵ. دانم بە خۆمدا گرت تا ماندووبوون لە هێرشە بەربڵاوەکەیان لە دژم. ئنجا بە هیمنی کەوتمە باسی ئەو جۆرە بابەتانە و، بە هۆی ئەوەی کە زانیارییەکی باشم لە بواری شانۆ و نواندندا هەبوو، بە شێوەیەکی سەرنج ڕاکێشانە شتەکانم پاس دەکرد و ئەوەم ڕوونکردەوە کە چۆن لە داهاتووی کەسێک دەکۆڵیتەوە. هیندی هیندی، سەرنجی هەموانم بەتەواوی بەلای خۆمدا ڕاکێشا و دەرزیت فڕیدایە دەنگیت دەبیستەوە. ئەوەندەش چیرۆکی جنۆکە و ڕوحیانەت بۆ گێڕابوونەوە، تەنانەت کەسیان نەیاندەوێرا دەستێ بە ئاو بگەیێن، بەتایبەتی خێزانێکی چاخۆر بوون و چاییش میزی بە دواوەیە و، کەچی کەسیان لە جنی خۆی نەدەجوڵایەوە. کات بەسەرچوو، تەنانەت ناچارکراین شەو لەو ماڵەدا ڕۆژ بکەینەوە. هەر ئەوەندەم خۆش بوو کە دانیشتەکە کۆتایی هات، ئیدی هەر هەموویان"پێکەوە" هێرشیان برد بۆ ناودەست! ئنجا پاش ئەوەش، هەر یەکێکیان بە لای خۆیدا و، بە دڵی ئەوانی دیکەوە، ڕایدەکێشام و، پرسیاری بەخت و ناوچاوی خۆی لێ دەکردم! منیش ئەو کاتە تافی لاویتیم بوو، لە دڵەوە ئارەزووی ئەوەم هەبوو کە تۆڵەی ئەو هەموو پێڕابواردنەیان لێ بکەمەوە، لەبەر ئەوەش، لەسەر ڕەقەم و بە ئارەزووی دڵم بە هەموویانم ڕابوارد. ■■■

حەسیب رۆژبەیانی، ئەندامی ئەنجوومەنی شاری کەرکوک:

بەرەی تورکمانی درۆی لەگەڵ دایک و باوکی خۆیان کرد کە تورکیایە و سەرچاوەی دارایینانە



بەڕێز حەسیب رۆژبەیانی ئەندامی ئەنجومەنی شاری کەرکوک بەڕپەسمی نووسینگەی "قەرەبووکردنەوە و گەڕانەوەی دەرکراوەکانی کەرکوک"، بەیاوەری وەفدیکی پەرلەمان و حکومەتی هەرێمی کوردستان، کەپێکهاتبوو لە بەڕێزان "دکتۆر ناسح غەفور سەرۆکی فراکسیۆنی زەرد لەپەرلەمانی کوردستان و رۆمێز هەکاری ئەندامی پەرلەمانی کوردستان و نیهاد لەتیف "قۆجە نوێنەری پارێزگای هەولێر و سلاح عەولا و محمەد علی نوێنەری کۆمەڵی کۆمپانیای گەورەی کوردستان" هاتونەتە ئەڵمانیا. ئەو سەفەرە لەلایەن پرۆفسێۆر "تیلمان تسیولش" کە دۆستێکی نزیکی کوردە و لێپرسراوری "کۆمەڵەی گەلانی هەڕەشەلێکراو"ە کە بارەگاکەیان لەشاری گۆتتنگنی ئەڵمانیایە، ڕێکخرابوو. بۆ تیشک خستنەسەر بارودۆخی ئێستای کەرکوک، پەیامی کورد بەدەرفەتی زانی دیدارێک لەگەڵ بەڕێز حەسیب رۆژبەیانی سازبکات.

پەیامی کورد: لەم سەفەرەتان بۆ ئەڵمانیا، ئامانجتان چی بوو؟

وەڵام: لە هەفتەی ڕابردوودا، لەگەڵ بەرپرسی بەشی رۆژهەڵاتی ناوەڕاست و بەڕێوەبەری بەشی کەمە نەتەوەکانی جیهان لەوەزارەتی دەرەوەی ئەڵمانیا کۆبووینەوە، لەم کۆبوونەوەیەدا باسی بارودۆخی هەرێمی کوردستان و کەرکوک، کرا. بەڕپەرچی ئەو پڕوپاگەندانەمان دایەوە کە گوایە لەکەرکوک لەلایەن هێزی ئەمریکی و ئاسایشی کوردستانەوە، عەرەب و تورکمان دەگیرێن و ڕەوانەی هەولێر و سلێمانی دەکرێن کە ڕۆژنامەی واشنتۆن پۆست بڵاوی کردبوەوە، کەچی لە ڕاستیدا هێزی فرە ڕەگەزەکان چەند تیرۆرستێکی عەرەبیان گرت بوو، بە هۆی نەبوونی شوێن لە کەرکوک بە ناچاری ڕەوانەی بەندیخانەی هەولێر و سلێمانی کردن کە هیچ تورکمانێکیان لەگەڵدا نەبووە لەناو گیراوەکاندا.

پەیامی کورد: ئایا بۆچی تا ئێستا حکومەتی بەغدا هیچ هەنگاوێکی نەناوە بۆ جێبەجێکردنی مادەی ٥٨ کە تایبەتە بەئاساییکردنەوەی کەرکوک؟

وەڵام: حکومەتەکەی ئەیاد عەلاوی، زۆربەی بەرپرسەکانی کۆنە بەعسی و عەرەبە شۆفێنیەکان بوو بوون. دوای دامەزراندنی حکومەتەکەی ئبراهیم جەعفەری، سەرەڕای هاوپەیمانیەتی لەنێوان لیستی هاوپەیمانیەتی کوردستان وئیتلافی شیعەدا، بەداخەوە هەزار خۆزگەم بە حکومەتی عەلاوی کە هێشتا لەو حکومەتەی ئێستای شیعە باشتر بوو بۆ کەرکوک.

پەیامی کورد: سەرۆکی هەرێم چ سودێکی دەبێ بۆکەرکوک؟

وەڵام: بوونی سەرۆکی هەرێم وەکو مەرجەعێک کاریگەری گەورەی دەبێ، ئەو سەردانەی سەرۆک بارزانی بۆ بەغدا و دیداری لەگەڵ لێپرسراوانی بەغدا و پێ داگرتن لەسەر کوردستانی کەرکوک وەکو لەمادەی ٥٨دا، هاتوە کە هەرگیز مساوەمەی لەسەر ناکرێ و هەوڵی گەڕانەوە بۆ ئیدارەی هەرێمی کوردستان دەدات، گرنگی بوونی سەرۆکی هەرێمی دەرخست.

پەیامی کورد: ئایا چەند کێشەی زەوی و زار مۆلکداری چارەسەر کراوە؟

وەڵام : لە ١٥ هەزار کێشە کە لە لایەن خەڵکی ئاوارە کەرکوکەوە تۆمار کراوە، مال ومڵکیان لەلایەن بەعسیەکان وعەرەبە هاوردەکان دەستی بەسەر داگیراوە، بەڵام تەنها ١٠ تا ١٥کەس مال و مۆلکی خۆیان وەرگرتووەتەوە. ئێمە لە "نووسینگەی قەرەبووکردن و گێڕانەوەی ئاوارەکان"ی سەر بەپارێزگای کەرکوک، نووسراوێکمان ئاراستەی وەزارەتی کشتوکاڵی عێراق کردووە، داوامان لێ کردوون ئەو بڕیارانەی مەجلیسی قیادەی سەورەی بەعسی گۆربەگۆڕ هەڵبوەشێندرێتەوە، کەچی وەزارەتی کشتوکاڵی عێراقی ڕەوانەی ئەنجوومەنی وەزیرانی عێراقی دەکات لەوێوەشەوە ڕەوانەی Apss دەکات وەکو یاری تۆپی پێ هەردەمێک لەشوێنێکدا ئاستەنگ دروست دەکەن و بە چاوێکی سووک سەیری کەرکوک دەکەن. تا ئەو کاتەی ئێمە بەیەکەوە ئەم چاوپێکەوتنە دەکەین؛ بە عەرەبکردنی کەرکوک بەردەوامە. فەرمانبەری عەرەب لە ناوەڕاست وباشوری عێراق ڕەوانەی کەرکوک دەکەن، کەچی بەهەزاران کەس لە کەرکوک بێ کارن، ئەگەرچی بەڕێز عبدرحمان مستەفا پارێزگاری کەرکوک بەنووسراوێک گواستنەوەی فەرمانبەر و کرێکاری لەپارێزگاکانی تری عێراقی وەستاندوە. حکومەتی بەغدا تائێستا هیچ جۆرە پارەیەکی بۆ کەرکوک تەرخان نەکردوە، تەنها ئەو کاتەی کە بەڕێز دکتۆر بەرهەم سالح جێگری سەرۆکی حکومەتی بەغدابوو بڕێ ١٠٠ ملیۆن دۆلاری بۆ ئاوەدانکردنەوەی کەرکوک تەرخان کرد کەچی تەنها ٢٥ ملیۆن دۆلار گەیشتەکەرکوک و٧٥ ملیۆن دۆلار لە بەغدا مایەوە.

پەیامی کورد: ئاوارەکان لە بارێکی نالەبار ژیان بەسەر دەبەن لە کەرکوک لەژێر خیمەدان و تەنانەت ئاوی خواردنەوەشیان نییە، بۆچی؟

وەڵام: تەنها لەلایەن دکتۆر ڕۆژ نوری شاوەیس بڕی ٢٠٠ هەزار دۆلاری لە نوسینگەی خۆی تەرخان کرد، کە کاتی جێگری سەرۆک کۆماری عێراق بوو. بۆ ئاساییکردنەوەی کەرکوک پێوستیمان بە ٥٠٠ تا ٦٠٠ملیۆن دۆلارە بەڵام بە داخەوە ئێمە لە ناو کەرکوک وەکو پارتی وێەکێتی بەیەکەوە کارناکەین، من ئومێدم هەیە دوای یەکگرتنەوەی هەدوو ئیدارەکەی حکومەتی هەرێم، چاوپێاخشاندنەوەیەک بە شێوازی کارکردندا لە کەرکوک بکەین و یەک ستراتیژ دانێین، پێوستە ئێمە زۆر خۆمان بە بەغداوە نەبەستینەوە. هەرێمی کوردستان ڕۆڵی هەبێ لەخزمەتکردن و گەڕانەوی ئاوارەکان.

پەیامی کورد: بۆچی تا ئێستا سوود لە پێشمەرگە وەرنەگیراوە بۆ دابینکردنی ئاسایش لە کەرکوک؟

وەڵام. پێش ماوەیک داوایان کردبوو، تا ئێستا سوودی لێ وەرنەگیراوە، بەڵام لە شاری موسڵ پێشمەرگە بە هەماهەنگی لەگەڵ هاوپەیمانان، ڕۆڵێکی گەورە دژی تیرۆر دەبینن. بوونی پێشمەرگە لە کەرکوک، زۆر پێوستە بۆ کورد. بە گشتی و تورکمان و کۆمەڵێکی زۆر کلدان و ئاشوری پێیان خۆشە پێشمەرگە بەهاوکاری هاوپەیمانان ئاسایشی کەرکوک پارێزێ.

پەیامی کورد: بۆچی هەڵبژاردنەکانی ئەنجومەنی پارێزگای کەرکوک دواکەوت؟

وەڵام : یەکێک لە هۆکارەکان بەرەی تورکمانی و لایەنی عەرەبی شیعی وعەرەبی دەرەوەی لیستی برایەتی کەرکوک بوو کە داواکاریەکانیان لە قەبارەی خۆیان گەورەتر بوو دەیانویست دەستکەوتی گەورە بەدەست بهێنن، لیستی برایەتی کەرکوک دەیگوت فەرموون دەتوانن بیکەن. بەڵام بە مەرجێک ئامانجەکانی لیستی برایەتی کەرکوک قەبوڵ بکەن، لەدەرگاکانی ڕاگەیاندنا بڵاوی بکەنەوە کە بەداخەوە باوەڕیان پێی نەبوو، دیارە پارتی و یەکێتی بۆچوونی جۆرا و جۆریان هەبوو لەسەر پۆستەکان. لەم دواییەدا خۆشبەختانە لە یەک نزیک بوونەوە، ڕێککەوتین بە بەرنامەیەکی دارێژراو کاربکەین، تا ئێستا کارمان بە پێی پرۆگرامێکی دارێژراو نەکردوە، بە پێچەوانەوە ئەگەر کێشەی کردارەکانی تیرۆرستان و بەرەی تورکمانی وعەرەبە شیعە مەزهەبەکان لەبەرچاو بگرین هەماهەنگی نێوانیان لە لایەنە کوردییەکان زیاترە.

پەیامی کورد: ڕۆڵی نوێنەرانی کورد لە حکومەتی بەغدا چەند کاریگەر بووە بۆ ئاساییکردنەوەی بار ودۆخی کەرکوک؟

وەڵام : پێش هەڵبژاردن زۆر عەملیانە کاریان نەدەکرد، ئەو کەسانەی کە لە بەغدا کاردەکەن لە پەرلەمان یان حکومەتی فدراڵی.

پەیامی کورد: بەرەی تورکمانی لە نانەوەی کێشە و ئاژاوە، ئامانجیان چیە؟

وەڵام: بەرەی تورکمانی ڕۆڵێکی زۆر مەترسیداری هەیە، درۆی لەگەڵ دایک و باوکی خۆیان کرد کە تورکیایە و سەرچاوەی دارایینانە. هەماهەنگی و هاوپەیمانی لە گەڵ تیرۆرستانی و کۆنە بەعسیەکان هەیە، تەنها بە مەبەستی ئاژاوەنانەوە بەڵام لە سەرتاسەری عێراق شکستی گەورەیان هێنا کە گویا چوار ملیۆن کەچی تەنها ٩٣ هەزار دەنگیان هێنا، بە پێچەوانەی بۆچوونی بەرەی تورکمانی، زۆرینەی تورکمان دەیانەوێ لەگەڵ کورد بژین.

پەیامی کورد: زۆرجار دراوسێکانی عێراق بەوە تاوانبار دەکرێن کەوا دەستیان لە کردەوە تیرۆرستییەکاندا هەیە، ئایا ئێوە هیچ بەڵگەتان لە بەردەستدایە؟

وەڵام: گەلێک کەس هەن لەریزی بەرەی تورکمانیدا گیراون و دەستیان لە کرداوە تیرۆرستییەکاندا هەبووە، سەر بەتورکیان و وا دەزانن ئیمپراتۆریەتی عوسمانی ماوە. بەڵام ئەوان بەهەڵەدا چوون و دنیا گۆڕاوە.

ئەوکاتەی وەفدەکەی وەزارەتی دەرەوی تورکیا هاتە کەرکوک لەگەڵیان دانیشتین، پیمان گوتن تۆدەڵی من باوەڕم بە ئازادی و دیموکراتی هەیە ١٥ تا٢٠ ملیۆن کورد لە تورکیادا هەیە دەبێ ڕێگەیان بدەن مافی چارە نوسی خۆیان دەست نیشان بکەن، ئەو تورکمانانەی لە کەرکوک دەژین سەد بەرابەر کوردی تورکیا مافیان پارێزراوە، سەرۆکی وەفدەکە گوتی ئەو قسانەی دەیکەی تەنها ڕای خۆتە یان ڕای سەرجەم ئەندامانی کوردە لەئەنجومەنی کەرکوک.

پەیامی کورد: ژمارەی دانیشتوانی کەرکوک چەند دەبێت؟

وەڵام : سەرژمێرێکی دروستمان لەدەست دانیە بەڵام نزیکەی ملیۆن و نیوێک دەبێت، کورد یەکەم ژمارەیە پاشان تورکمان و عەرەب دێ، ئنجا کلدان و ئاشوری، بەڵام بەهۆی بەعەرەبکردنی کەرکوک ئێستا ڕێژەی عەرەب زیاترە لە تورکمان.

لە ٦٠ هەزار خێزانی کوردی دەرکراوە تەنها ١٠ هەزار خێزان گەڕاوەتەوە کەرکوک و باری ژیانیان گەلێک خراپە.

پەیامی کورد: ئایا حکومەتی هەرێم هیچ هاوکاری نەکردوون؟

وەڵام: لە هەردووئیدارە ١٠٠ملیۆن دۆلاریان تەرخانکردبوو بۆ بۆ ئاوارەکانی کەرکوک و گوندەکانی دەوروبەری، تواندرا ٢ ملیۆن دۆلار بۆ پێداوستی خۆیندنی زمانی کوردی وچاککردنەوەی قوتابخانەکان کەلکی لێ وەربگیرێت.

پەیامی کورد: تورکیا لە ڕابردوو وبستی نەخۆشخانەیەک بە ناوی مانگی سوری تورکی بکاتەوە ،ئێستاش دەنگێکی وا هەیە کە لە ڕێی سەرمایەدارێکی تورکمانی هەولێرەوە زانکۆیەکی تورکی بکاتەوە، بۆ ئەمە چی دەڵێن؟

وەڵام: ئەنجومەنی کۆنی شاری کەرکوک ڕێ لە بەردەم کردنەوەی نەخۆشخانە گرت، وە لە داهاتوش ڕێگە بەهیچ پرۆژەیەکی تورکی نادات.

پەیامی کورد: عەرەبەکان پاسەوانی لوولە نەوتیەکان دەکەن کەچی خۆشیان دەیتەقێنەوە و ئێوە لەئەنجوومەنی کەرکوک پێشنیاری ئەوەتان نەکردووە لولەیەکی تازە لەڕێگەی هەولێرەوە بۆ دهۆک؟

وەڵام : ئەو شتە لەدەست بەغدادایە لەگەڵ حکومەتی بەغدا و ئەمریکییەکان پێشنیاری واکراوە. من دەبینم بەرپرسانی بەغداد نیازیان باش نییە، دەبێ پاسەوانی لوولە نەوتییەکان لە دژی تیرۆرستان بن نەوەک تیرۆرست بن وەکو ئێستا کە پشماوە بەعسن.

پەیامی کورد: ئایا ئەو عەرەبانەی کە لە سەردەمی ڕژێمی لە ناوچوو هێندراونەتە کەرکوک، هەموویان ماونەتەوە؟

وەڵام : زۆربەی زۆریان لە کەرکوک ماون، ژمارەیەکی کەمیان گەڕاونەتەوە شوێنی خۆیان. ■■■

هەڵێنجن: جوتیار دارفروش ـ فادل ئوزچەلیک

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

کەلوورکانی هەفتە



کاوڕ ٣.٢١ تا ٤.٢٠
کارەکەت کە ماوەیەکە بایەخەکەی جارانی پێ نادەیت، چاوەڕوانی گەرم و گوڕێیەکەی سەرەتاکانت دەکات تا بەرەو باشتر ژیانت بڕوات. گرفتی خێزانیت لە بەردەمدایە.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠
خەمێکی گەورەت لە کۆڵ دەبێتەوە و، ڕەنگ و ڕووەکەی جارانت بۆ دەگەڕێتەوە. لە ڕووی سۆزداریيەوە، ئەوەندە پەلپ و بیانوو لە یارەکەت مەگرە، تۆی زۆر خۆش دەوێت.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١
لە ڕووی کارەوە، زۆر گرنگە داهاتووت دابین بکەیت، بەڵام ئێستاشت لە بیر نەچێت، لە ڕووی خێزانییەوە زۆر ئاسوودەیت.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢
بەسیەتی ئەوەندە بە شان و باڵی خۆتدا هەڵ مەدە و، بیرێکی واقیعی لە خۆت بکەرەوە، ئەگەر بە ڕابردوو بێت، زۆر کەس هەن جاران پاشا یان سەرۆک کۆمار بوون، ئێستاش سفرن!



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢
ماوەیکی دێرین دەستی یارمەتیت بۆ درێژ دەکاتەوە، ڕەتی نەکەیتەوە، لەم ڕۆژانەدا تۆ زۆر نیگەرانی و بە ئاسانی ناتوانیت تەرکیز بکەیت، ئارام بە و هێمنانە بیر بکەرەوە.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢
زۆر بە جوانی لە دەوروبەرەکەت وردبەرەوە، چونکە لەوانەیە کۆمەڵێک شتی تازەت بۆ دەرکەوێت کە ماوەیەکی زۆرە لێت شاراوەیە. دان بە هەڵەکەتا بنێ لە بەرامبەر یارەکەت.



تەرازو ٩.٢٢ تا ١٠.٢٢
بەخت و ئاوچاوانت لە هەندێ پێشهاتی خراپ دەتپارێزێت، تۆ لێهاتوویت و سەرکردایەتیت پێ هەڵدەسوڕێت، هەوڵ بدە ئەوە بسەلمێنیت.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١
کەسانێک بیر و بۆچوون لەسەر تۆ ئالوگۆڕ دەکەن و تیایدا هەموویان دان بە ڕێک و پێکی تۆدا دەنێن، چاوپێکەوتنێک هیوا بۆ دل و گیانت دەگەڕێنێتەوە.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١
یەکێک لە ناسراوەکانت دڵسۆزت نییە، بە ئاگابە لێی، لەم ماوەدا بڕیاردان لە بەرژەوەندی تردا نییە، تۆڕە بوونی نائاسایی زیانت پێ دەگەێنێت.



کیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩
ئەم ماوەیە بەخت یاوەرتە و هەوڵ بدە سوود لەو هەلانە وەربگرە کە بۆت دەڕەخسێت، ئەگەری ئەوە هەیە کەسانێکی ڕێک و پێک بناسیت و ببنە دۆستت.



سەتل ١.٢٠ تا ٢.١٨
توانایەکی نائاسایيت هەیە و ئیرادەیەکی پۆلاییشت لە هەمان کاتدا هەیە، هەر بۆیە دەتوانیت لەم ماوەدا سوودێکی باشیان لێ وەربگریت.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠
پارەی خۆت لە پرۆژەی سەرپێیدا نەخەرە کار، چونکە زیانێکی گەورەی بەدواوەیە، پارەکەت لەلای خۆت بێت لەم ماوەدا، لە هەموو شوێنێک باشترە.



دایکە ئەمریکیەکانیش باری سەرنجیان هەیە سەبارەت بە شەڕی ئەمەریکا لە دژی تیرۆر..

سەبارەت بە چوونی کورەکەی بۆ عیراق بۆ بەشداری کردن لە ڕزگارکردنی عیراق و عیراقیەکان لە دەست دڕندەترین دیکتاتۆری سەردەم، دایکێکی ئەمەریکیم بە ڕێکەوت لە ئەمەریکا لە ویلایەتی میزووری ناسی وتی: من هیچ پێم خۆش نییە کورەکەم چووە بە شداری بکات لەو شەڕەدا، ئەوە ئیشی ئەو نییە، وتم : ئەی ئیشی کێیە ؟ ئەوەتا سەرۆک بووش ئەو ئەرکەی گرتە ئەستۆی خۆی و میللەتانی عیراقی لە سەددامی خوێنڕێژ ڕزگار کرد و هەر ئەویش دواتر شەڕی دژ بە تیرۆری دەستدایە و ئەیەوێت ناوچەکە لە تۆوی تیرۆر ڕزگار بکات؟ دایکەکە وتی: بەڵام ئەوە ئیشی بۆشی سەرۆکیش نییە ، ئەو چ پەیوەندیەکی بەو ناوچەیەوە هەیە ئەگەر نەوت نەبێت، وتم : ئەی دوای ئەوەی کورەکەت ڕۆشت تۆ چیت کرد؟ وتی: هیچ، لەگەڵ کۆمەڵی دایکانی تری وەکوو خۆم دڵی خۆمان بەوە دەدایەوە کەوا کورەکانمان چوون بۆ داکۆکی کردن لە وڵاتەکەیان و پارستنی لە تیرۆری سەردەم کە بۆش دەڵێت ڕەگەکەی لە ئایینی ئیسلامدا داکوتاوە، بەوە دڵی خۆمان خۆش ئەکەین گوایا کورەکانمان ئەرکێکی نیشتیمانی پیرۆز بەجێ دەهێنن و دووعایان بۆ دەکەین بە سەلامەتی بگەڕێنەوە. ئەو کاتەی ئەو قسانەم لەگەڵ ئەو دایکەدا ئەکرد بەدەست خۆم نەبوو دایکانی شەهیدانی ڕیی ڕزگاری کوردستان و دایکانی شەهیدەکانی هەڵەبجە و شەهیدەکانی ئەنفال و ئەوانەی بە کۆمەڵ زیندە بەچاڵکران هاتەوە یاد. بیرم لەوە کردەوە ئەی ئەوان لەپێناو چیدا شەهیدبوون؟ دایکیان لەپێناو چیدا جەرگیان سووتا، لەپێناو ئەوەی دیکتاتۆرێک هەموو ئازەزوویەکی کوشتن و لەناوبردنی مێللەتەکەیان بوو، هەموو خەون و خەمێکی زیندەبەچاڵکردنی گەنج و پیر و ژن و منداڵ بوو بە کۆمەڵ لەپەنا یەکا لە گۆڕەکاندا، لەو دایکەم پرسی: ئێوە قەت ئەوانەتان بەسەر هاتووە کە بەسەر کورد هاتووە؟ من ئەزانم ئێوە و ڕۆڵەکانتان کە دەبنە خۆزاکی ئەو جەنگە چ کارێکتان بەو مەسەلەیەوە نیە، بەڵام ئێمەش زیاد لە ٤٠ ساڵە قڕ ئەکرێین ..

ئەمەریکیەکان لە ڕاستیدا ئەگەر لەگەڵیان بدوێیت پێت ئەڵێن ئەوان کێنیان لە عیراقیەکان نیە، ئەوان کێنیان لەو بڕیارەی سەرۆک بووشە یە جەنگین لەو دژی تیرۆر و کێنیان لەوەیە کەوا ڕۆڵەکانیان بکاتە قوربانی ئەو جەنگە .. گەنجێکی ئەمەریکی تەمەن ٢١ ساڵ براوەکە کە تەمەنی ٢٤ ساڵە نزیکەی ساڵێکە لە عیراقە لەگەڵ هێزەکانی ئەمەریکا وتی: نازانم سەرۆک بووش بۆچی ئاوا نادانەوە لە هۆکاری سەرهەڵدانی کێشەی ئاوان و بگەڕێت بۆ چارەسەرکردنی زیادبوونی ڕێژەی ئاوان بەهەموو جۆرەکانیەوە لە ئەمەریکا ، ئەگەر نەوت و بەرژەوەندیە ئابووریەکان نەبێت هێزەکانی ئەمەریکا لە عیراق چیدەکەن ..

سەیر لەوەدایە ئەوان لە گۆشەیەکەوە لەمەسەلەکە ڕوانن و لە گۆشەنیگایەکەوە بیری لێدەکەنەوە و ئێمەش لە گۆشەنیگایەکی ترەوە.. ئەوان عیراق بە دۆزەخی ئەمەریکیەکان و گۆڕستانی کۆر و لاوەکانیان ئەزانن ، ئێمەش هەر هەمان ئەو هێزانە بە ڕزگارکەرمان ئەزانین و هەندێکیش لە عیراقیەکان بە داگیرکەریان ئەزانن، لەو بەینەشدا شەڕی دژی تیرۆر هەربەدەوامە و هێزەکانی ئەمەریکا هەر ئەمێنن و لاوە ئەمەریکیەکانیش ئەکوژرێن، ئەوەش باجی بەرژەوەندیەکانە بۆ ئەمەریکیەکان و باجی ڕزگاربوونی ئێمەشە.. دەنا چ جیاوازیەک نیە دایک هەر دایکە لە هەرکوێ بێت، بەڵام دایکیش نیە لە دونیادا بە هێندی دایکی قوربانی و شەهیدانی ڕیگای ڕزگاری کوردستان بەهێز خەم بالابەرز بێت..■■■

Yadek le Dilşad Merîwanî
Şehîdî Zimanî Kurdî



Mistefa Çiwartayî

Ziman yekêke le hêma giringekanî bûnî her neteweyek, giringîw pîrozî pêş ala û serwerîş dekewêt. Detwanîn blêyn pênaseye, kultûre, amrazêkî pêşkewtinî şaristanyete. Amêre bo derbirînî hizrî mirov û arastekarî fermanekanyetî. Eme sereray ewey ke hokarî axawtin û lêktêgeyştine. Yekêk lew zimananey ta êsta şêwazêkî yekgirtû û standartî bexowe negirtûwe, zimanî kurdî ke le çend diyalêktêkî ciyawaz pêkdêt û lewanîşewe çendîn liqî lê debêtewe. Kêşeyekî lem core tenha bo ême dirûst nebûwe, belkû zor le netewekanî dîke heyanbiwe yan heyane, bo nimûne zimanî elmanî heta salî 1913 çendîn diyalêktî ciyawaz bû, paşan leser destî dû bira, tiwanra bikrête ew zimaney ke êsta pêy denûsin û depeyvin, legel eweşda her dû bo sê sal carêk gorankarî têda dekrêt û berdewamîşe. Ereb her le konewe ta êsta her yeke be diyalêktî xoy depeyvê lê yek şêwazî nûsinyan heye ewîş be diyalêktî qûreyşî kon denûsin çûnke zimanî qurane.

Netewey kurd ziyatir le her neteweyekî dîke, ziman û kultûrekey lejêr hereşe û lenawbirdinda bûn, wilatekey parçekiraw û xoşî dabeşkiraw, dagîrkerî her parçeyek be şêwazêk hewlî lenawbirdin û tiwandinewey em neteweyey dawe. Le turkye kemalyekan delên kurd niye û ewane turkî kêwîn û zimanî kurdî bo nizîkî 80 sal qedexe biwe, le êranda zimanî kurdî wek liqêkî zimanî farsî seyrdekrêt û nabêt bixwêndrêt, le suryada ewe xo kurd leray xwada wek penaber qebûl kirawin nek wek milletêk leser xak û nîştimanî xoyan bijîn. Le êraqiş hemû çîrokeke dezanîn. Nawerokî taybetî em nûsîne bo kesêke ke nek be praktîk le rêkxistinî nihênîda dijî rijêmî dagîrkerî be'sî erebî xebatî dekird belkû wek mamostayekî bîrrûn û peroşî zimanî kurdî lejêr zebrû zengî be'sîşda çawnetirsane xizmetî zimanî kurdî dekird. Dilşad Merîwany le (Amadeyî Helgurdî wejeyî) mamostay zimanî kurdî bû, le katêkda rijêmî be's geyştibiwe diwa lûtkey dirindayetî û helmetî lenawbirdinî gundekanî kurdistanî destpêkirdibû û le çekî kîmyawî kelkî werdegirt, bêdengî nêwdewletîş çekêkî dîkey karîger bû bo dirêjepêdanî tawanekanî rijêm. Lew kateda Dilşad Merîwanî şehîd le polekanî xwêndinda qutabyekanî fêrî rênûsî kurdî latînî dekird, jimareyekî zor le qutabyan leser destî ew û hizrî ew fêrî xwêndin û nûsîn be rênûsî latînî, bûn.

Dilşad Merîwanî tenya Mamosta nebû belkû şae'r, nûser, Rojnamenûs û hunermendîş bû. Kesayetiyekî nawendî wêje û roşinbîrî kurdîbû. Em karey em deykird bo rijêmî be'scêgey lêxoşbûn nebû, be taybetî pêştirîş gumanî ewey leser bû ke wek pêşmergey nihênî naw şar le hewlî kuştinî parêzgarî bekrêgîrawî slêmanîda beşdarbûbêt. Qederî Dilşad Merîwanî wabû ke le mangî azarda ledayikbêt û le mangî azarda şehîd bêt. Mangî azar bo kurd, mangî şayî û şîwene, mangî destkewte meznekan û nişûstyekane, mangî bone nîştîmanye pîrozekan û ledayikbûn û koçkirdinî serkirdekane.

Dilşad Merîwanî le 28-3-1947da le şarî slêmanî ledayik biwe, le operasyonî 9î huzeyranî salî 1963da ke hêşta 16 salan bû legel sedan kesî bêgunahî şarî slêmanî rapêçî hamye kira û kewte ber azar û aşkencey rijêmî be's, lew roje bedwawe be pênûs û be hizr û be kirdewe dijî be's û dagîrkeranî kurdistan le xebatdabû.

Le kotayî salî 1988da rojêk çend kesêkî ser be dezgay amnî bednaw be dûyda dên û daway lê deken legelyanda birwat, her ew royştinebû ta êstaş negerayewe. Wa bîstrawe giwaye le 13-3-1989 da gullebaran kirabêt, belam ta êsta rûn niye û termekey be kesûkarî nedrawetewe. Eger kurd bîr le dirûstkirdnî peykerî serbazî win yan pêşmergey win bikatewe, ewa şayîstey eweye ke leser şêwe û sîmay Dilşad Merîwanî bêt. ■■■

پرسەنامە

بە بۆنەی کۆچی دوایی هونەرمەندی گەورەی گەلەکەمان، هونەرمەند "عوسمان عەلی" لە ناخی دڵمانەوە پرسە و سەرخۆشی خۆمان ئاراستەی کەس وکاری خوالێخۆشبوو و دۆستان و هەڤاڵان و یەکێتی هونەرمەندانی کوردستان و تەواوی گەلی کورد دەکەین، لە یەزدانی مەزن داوا دەکەین بەبەهەشتی بەرینی شاد بکات و ئارامی و ئاسوودەیی بە خێزانەکەی و خۆشەویستانی ببەخشێ.

پەیامی کورد

شالوور و تووتی



حەمە سەعید حەسەن

لاتحسبوني أرقص بينكم طربا
فالطير يرقص مذبوحا من الألم

گەورەترین کارەساتیک کە بەرەو ڕوومان بێتەوە، ئەوەیە بڕوامان بە خۆمان نەمێنێت، مردن لەو ڕۆژەوە دەستپێ ناکات کە دڵمان لە لێدان دەکەوێت، لەو ڕۆژەوە دەستپێ دەکات، کە متمانەمان بە خۆمان نامێنێت. میللەتێک بڕوای بە خۆی پەو بێت و خەون بە ئایندەیەکی گەشەوە ببینێت، هانا بۆ پاساوی هەلومەرجی ناسک نابات و لە نیشاندانی گەندەڵی و کەموکوڕییەکان ناترسێت. ئەگەر دەست نەخەینە سەر برینەکان، ئەگەر نەخۆشییەکان دەستنیشان و چارەسەر نەکەین، ئیدی چۆن دەبینە خاوەنی کۆمەڵگەیەکی تەندروست؟ ڕەخنەگر لە پێناوی داهاتوویەکی ڕۆشنداً، باسی لایەنە تاریکەکانی کۆمەڵگە و ئەو دەردە کوشندانە دەکات کە جەستەی کۆمەڵیان دارزاندووە. نەخۆشییەکان زادەی ڕەخنە نین، ڕەخنەکان زادەی نەخۆشییەکانن، ئەو نەخۆشیانە بەوە چارەسەر ناکرێن، چاو لە ناستیاندا بنووقێنین، بەوە چارەسەر دەکرێن، ڕوو بە ڕوویان ببینەوە و هەوڵی وشککردنی سەرچاوەکانیان بدەین.

من لە سۆنگەی ئەوەوە کە دژی شەڕی نیوخۆم، ڕەخنە لە هەڵگیرسێنەرانی ئەو شەڕە ڕۆخلە دەگرم، ئەو شەڕە من، نە هەڵمگیرساندووە، نە بەشداریم تێدا کردووە، نە هەوڵی خۆشکردنی ئاگرەکەیم داوە، قارەمانانی شەڕی براکوژی، کەسانێکی ناسراون، ئەوانەن کە بازرگانییان بە خوێنی کوردەوە کردووە، ئەوانەن کە دەستیان بە خوێنی کورد سوور بووە و ئەوانەن کە بە شیعر و پەخشان، ستایشی جەنەڕالانی شەڕیان کردووە. ئەگەر تاوانێکی مەزن لە ئارادا هەبێت، کە بە دڵنیاییەوە هەیە، ئەوا تاوانبارانی ڕاستەقینە، هەڵگیرسێنان، جێبەجێکەران و ئاگرخۆشکەرانی شەڕی نیوخۆن، نەک ئەوانەی تیری ڕەخنەیان ئاڕاستەی قارەمانانی شەڕەکە کردووە.

ئایا ئەوانەی ئەنفالیان کردین، لە تەنگانەکانی داهاتوودا، بە هاناماندەوە دێن؟ ئایا ئەوانەی مالی گوردیان کاول کرد، دەتوانن ئاوەدانی بکەنەوە؟ ئایا ئەوانەی شەڕیان هەڵگیرساند، دەتوانن ئاشتیمان بۆ دابین بکەن؟ سەرنج بدەن، ئەها سەرسەختترین قارەمانی شەڕی نیوخۆ، چۆن خۆی گورگە کردووە، ئەها نەک هەر لە یەکەمین کزبوونەوەی پەرلەماندا ئامادە نابێت! بەڵکوو تەنانەت بەشداری لە ڕێورەسمی یادی سی ساڵەی حیزبەکەی خۆیشیدا، چونکە لە سایەی ئاشتیدا بەڕیوە دەچێت، ئاکات! بۆ ئەوەی ئەنفال نەکرێینەوە، بۆ ئەوەی نەفستزمان، سڵ لە تاقیکردنەوەی ڕیگەی ناپاکی بکەنەوە، بۆ ئەوەی شەڕی براکوژی هەڵنەگیرسێتەوە، پێویستە ئەنفالچیان، قەرەفایلان و قارەمانانی شەڕی نیوخۆ، نەک هەر بەردەوام ڕسوا بکرێن، بەڵکوو یەکە یەکە بە دادگەیش بدرێن.

کانت دەبێژێت: (ویستی چاک، پێویستە لە هەموو هەلومەرجێکدا هەر چاک بێت. نابێت لە قڵان باروبڕخدا چاک و لەوی تردا خراپ بێت. دەبێت هەمیشە ئامێزێک بێت بۆ گەیشتن بە ئامانجێکی خاوێن.) هیچ پاساوێک دادی ئەنفالچیان، هەڵگیرسێنانی شەڕی براکوژی و ناپاکان نادات، ئەوانەی دژی بەباکرینی کای کۆن و کۆلاندنەوەی بڕینەکانن، نە نیازیان خاوێنە، نە ڕابردوویان، ئەوانە لە دێزە بە دەرخۆنەکردنی تاوانەکان، سوودمەند دەبن. شیعر کارێک دەکات، ڕۆحی ئینسان بەرەو بەرزایی هەڵبکشێت، ئەوانەی لەبەر قازانجی تایبەتی، یان بەرژەوەندی حیزب، چاو لە تاوانی قەڵاچۆکەرانی میللەت دەپۆشن، داوێنی ڕۆحیان لە زەلکاو دەخشێت.

کافکا دەڵێت: (کە زیان بە زمان بگات، زیان بە هەست و بە عەقڵیش دەگات.) بۆیە ئەگەر زمانت پیس بێت، ئەوە نیشانەیە بۆ ئەوەی نە هەستت خاوێنە و نە ئاوەزت ساغ. ئەندامی گۆزلی گوێلەمستی حیزب، چونکە خۆی گۆیلەیە، قەت بڕوا بەوە ناکات، کەسانی ئازاد هەبن. جیاوازی نێوان ئەندامی گوێرایەڵی حیزب و تووسەری ئازاد، وەک جیاوازی نێوان تووتی و شالوور وایە، قسەی ئەم و ئەو دەڵێتەوە. شالوور، گۆرانیێەکانی لە ناخی دڵیەوە هەڵدەقوڵێن. ■■■

٢٠٠٥/٦/٢٢

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەکەڵ:

هونەرمەند پرشنگ توانا



رووبەکی گەش و کراوە، دەنگێکی خۆش، کەسایەتییەکی بەهێز، دڵێکی پڕ لە میهرەبانی، عاشقێکی هونەری ڕەسەنی کوردی. ئەوە هونەرمەندی کورد "پرشنگ"ە کە ناوەکەی لە ڕووناکی پرشنگی خۆرەوە دێت و خۆیشی بە هونەرمەکەی پرشنگی جوانی و خۆشەویستی بە ژیان دەدات.

پرسیار: سەرەتای دەستپێکردنی کاری هونەرییت چۆن و بۆ کەی دەگەڕێتەوە؟

وەڵام: هەروەکو هەموو هونەرمەندێکی تر سەرەتای دەستپێکردنی کاری هونەرییم بۆ قۆناغی سەرەتایی دەگەڕێتەوە، کە مامۆستاکانم بە دەنگ خۆش هەڵیانبژاردم و لە کۆبوونەوەی دایکان و باوکان گۆرانیم دەگوت. ئەمە سەرەتای دەستپێکردنم بوو.

پرسیار: چۆن هونەری گۆرانیت هەڵبژارد، ئایا بە هەڵبژاردنی خۆتان بوو، یان بە هاندانی کەسانی تر؟

وەڵام: دەتوانم بڵێم هۆکاری سەرەکی هەردوکیان بوون، من هەر لە منداڵییەوە حەزم لە هونەری گۆرانی و مۆسیقا کردووە و ئەو بەهرەیەشم هەبووە، دیارە ئەگەر ئەو بەهرەیە پشتگوێی پێ پاڵپشتی لە دواوە نەبێت، ئەوە ئەو بەهرەیە بەر ناگرێت، ئەوانەش کە هاندەرم بوون، دەبێ دیسان بگەڕێمەوە بۆ سەرەتای دەستپێکردنی کاری هونەریم کە مامۆستا بەڕێزەکانم لە قوتابخانەی سەرەتایی یەکەم هاندەرم بوون و، ئەو دەرگایەیان بۆ کردمەوە. دوای ئەوەش دەبێ سوپاسی هاوسەری ژیانم "قادر توانا" بکەم، کە هاندەرێکی ڕاستەقینەم بوو، بە هۆی ئەوەی کە خۆی نووسەر و شاعیرە، لە لایەکی تریشەوە دەبێ سوپاسی براکەم عەلی محێدین بکەم کە وەک گۆرانیبێژێک هاندەرم بوو، نابێت ڕۆڵی گرنگ و کاریگەری کۆڕەکەم "دیدەن توانا" لەبیر بکەم کە لە هەموو بۆنە و ئاهەنگەکاندا موزیکی بۆ ژەنیوم و تەنانەت ئەلبوومی یەکەمیشم ئەرکی تۆمارکردن و ئاواز و دابەشکردنی موزیک هەر لە ئەستۆی ئەو بووە. هەروەها گوێگرتنم لە گۆرانی هونەرمەندە دەنگخۆشەکان هاندەرێکی ترم بووە.

پرسیار: چۆن دەروانیتە موزیک و گۆرانی کوردی؟

وەڵام: هەر مۆرکی کوردەواریان پێوەبێت و لەسەر بنەمایەکی زانستیانە ڕێچکەیان گرتبێت، ئەوا هیوا و ئومێدێکی زۆری لێ بەدی دەکرێت، لەو بڕوایەدام تا ڕادەیەکی باش هەوڵی ئەوەی بۆ دەدرێت و هەنگاوی چاکیشی بۆ نراوە، بە هیوای دوا ڕۆژێکی ڕووناک و پرشنگدار بۆ هونەری کوردی بە گشتی و هونەری موزیک و گۆرانی بە تایبەتی دەخوازم.

پرسیار: ئایا بە هەموو گۆرانیبێژێک دەگوترێ هونەرمەند؟

وەڵام: تەنیا کەسانی خاوەن ئەزموون و شارەزا و لێهاتوو شایەنی ئەو وشە پیرۆزەن، بۆیە ناتوانین بە هەموو گۆرانیبێژێک بڵێین هونەرمەند.

پرسیار: تا چ ڕادەیەک میدیای کوردی خزمەت بە هونەرمەندان دەکات؟

وەڵام: میدیا جیهانێکی زۆر فراوانە و گەلێ بەشی لێ دەبێتەوە کە هەر یەکەیان بە شێوازێک خزمەت دەکەن، ئەرکی ئەو کەسانەی کە لەم بوارەدا کار دەکەن زۆر سەخت و پیرۆزە، بۆیە دەبێت کەسانێ لەم بوارانەدا کار بکەن کە شارەزاییان هەبێت و حەزیشیان لە کارەکەیان بێت. ڕاستە گوتوبانە "نان بۆ نانەوا و گۆشت بۆ قەساب" مەخابن زۆر جار ئەو پەندە پێچەوانە دەبێتەوە، یەکێ لەو خزمەتانەی کە میدیای کوردی دەیبێت بیکات، خزمەت کردنە بە هونەر و هەر لەم ڕێگایەشەوە خزمەت بە هونەرمەندانیش دەکرێت، جا ئایا لە ڕووی ناساندنیانەوە بە جەماوەر یان لە ڕووی گەیاندنی پێشنیار و داخوازییەکانیان بە شێوەیەکی ناڕاستەوخۆ بە لایەنە پێوەندیدار و بەرپرسەکان کە بە لای منەوە تەلەفزیۆن لە هەموویی زیاتر دەتوانی ئەم ئەرکانە ئەنجام بدات، بە کورتی، میدیای کوردی بە هەموو بەشەکانییەوە هاندەر و پاڵپشتێکی باشی هونەرمەندانە بۆ بەرهەمهێنانی باشتر و بە چێژتر ئەگەر ئاوڕێک لە بواڕەکانی هونەری بدەنەوە.

پرسیار: ئەو کارە هونەرییانە کە پێشتر ئەنجامتداون، چین؟

وەڵام: جگە لە بەشداربوون لە زۆرینەی بۆنە و ئاهەنگەکان، یەکەم ئەلبوومم لە ساڵی ١٩٩٩ دەرکرد کە ئاوز و دابەشکردن و ئامادەکردنی "دیدەن"ی کورم بوو، ئێستاش لە هەوڵی دەرکردنی ئەلبوومی دووەمم.

پرسیار: حەز بە دەنگی چ هونەرمەندێک دەگەیت؟

وەڵام: حەزم بە دەنگی زۆر هونەرمەندە، بەڵام ئەو هونەرمەندانەی کە زۆر کاریگەرییان لەسەرم هەبووە و زۆر حەز بە دەنگییان دەکەم: (رەفیق چالاک، محەمەد سالح دیلان، مریەم خان، کەریم کابان، ناسری ڕەزازی، بەهجەت یەحیا و تایەر تۆفیق و زۆر هونەرمەندی تریش.

پرسیار: ئاستی هەڵسەنگاندنی جەماوەر بەرانبەر کارە هونەرییەکان چۆن دەبینیت؟

وەڵام: جەماوەر بە شێوەیەکی گشتی گوێ لە گۆرانی دەگرێ، جا ئایا بە سی دی بێت لە ماڵەوە یان لە ئاهەنگەکان، بەڵام مەخابن ئێمە جەماوەرێکی کۆنسێرتمان نییە. هەموو هەر حەز لە گۆرانی شایی و هەڵپەڕکێ دەکەن بە تایبەتی لە ئاهەنگە کوردییەکاندا، لە ڕاستیدا جەماوەر هاندەرێکی زۆر گرنگە بۆ هونەرمەند، بەڵام بە داخەوە جەماوەری ئێمە نەگەیشتووەتە ئەو ئاستەی کە ببێ بە هاندەری هونەرمەند لە ڕووی کرپنی بەرهەمەکان هونەرمەندان، هەر کاتێ جەماوەر لە کۆپیکردنی بەرهەمە هونەرییەکان خۆی ڕزگار کرد و سیدی هونەرمەندەکانی کڕییەوە، ئەو کاتە دەتوانین بڵێین هونەرمەند جەماوەری خۆی هەیە، هونەرمەندیش دەتوانێ خۆی پێشبخات و بەرهەمی نوێ ئامادە بکات. ئێستا تاکو هونەرمەند سی دی یەک ئامادە دەکات، دووچاری دەیان کێشە دەبێتەوە و کاتێک کە دەکەوێتە بازاڕەوە کۆپی دەکرێت و هونەرمەند تووشی زیان دەبێت و ناتوانێت خۆی بۆ بەرهەمێکی دیکە ئامادە بکات، تا ئێستاش دەزگایەکی تایبەتی نییە ئەو ئەرکە بخاتە ئەستۆی خۆی بۆیە هونەرمەندانی کورد چیاوازیان زۆرە لەگەڵ هونەرمەندانی میللەتانی تر.

پرسیار: هونەر لای تۆ چییە و ڕەنگانەوەی لە نێو کۆمەڵگادا چۆنە؟

وەڵام: هونەر وشەیەکی پیرۆزە. هونەر داهێنان و بەهرەیە، پێشکەوتن و دواکەوتنی هەر میللەتێک بە هونەرەکەیەوە دیاری دەکرێت.

پرسیار: دوا وتەت بۆ پەیامی کورد، چییە؟

وەڵام: من زۆر سوپاستان دەکەم کە بەم جۆرە هونەرمەندان بەسەر دەکەنەوە و کێسە و گرفت و پێشنیار و داخوازییەکانی هونەرمەندان دەخەنە بەر دیدی جەماوەر، هیوادارین بەردەوامی بەو کارانەتان بدەن و هیوای سەرکەوتنتان بۆ دەخوازین. ■■■

ئەمساڵ لە ڤیستیڤاڵە هونەرییەکانی هۆڵەندا

تیپی مۆسیقای ئازادی تاکە بەشداری کورد بوو

ساسان دەروێش – هۆڵەندا بەپێ ی ئەو سەرچاوانەی کە لە چاوپێکەوتنەکاندا، لەگەڵ هونەرمەندان دەکرێ، هەموولە سەرئەوە کۆکن و گازەندە دەکەن، هونەری ئاواز و مۆسیقای گۆرانی کوردی، ڕۆژ لە دوای ڕۆژ ڕەسەنایەتی خۆی ون دەکات و بەهابەرزە هونەرییەکانی لە نێو دەبرێ، بە نەمانی تام و چێژی کوردانەی، کار تێکەڕیشی تێکەڵ بوونی مۆسیقای ڕۆژئاواییە کە لەلایەن چەند کەسانێکی هەرزەکار و کەم ئەزموون کە خۆیان خزاندۆتە نێوئەم هونەرەو بە هونەرمەند لە قەڵەم دەدرێن، وکاری گەرن بەهونەری بێگانە، ئەو شەپۆلە گەورە وتازانەیان لەگەڵ خۆیان هێناوەتە کەنار، وەک هونەرمەند لە گۆرانی کوردی، بێگومان ڕووبەڕووی ئاکامێکی تاڵیان کردوینەتەوە،

بەوەی هەست دەکەیت کە گۆرانی و ئاوز و مۆسیقای کوردی کەوتووەتە تەنگژەیەکی خەتەرناک و زۆربەی ئاوازەکانمان بیانین، هیچ کاتێک کولتوور و هونەر و ڕۆشنبیریەتی نەتەوەیەک لەگەڵ نەتەوەیەکی تر چوون یەک نیە، بەڵام دەکرێ بڵێن نزیکی هەیە بەو مانایەش نا، هی ئەوان هی ئێمە بن وهی ئێمەش هی ئەوان بێ، زۆر بەدەگمەن لەم تازە هەڵکەووتوانە مەقام و لاوک و حەیران ی کوردی دەبینین کەکولتووری هونەری بەرزی خۆمانی پێ بپارێزین، لەگەڵ ئەوەشدا ئەگەر بێتوو سەیری بناغەی فۆلکلۆری گۆرانی و ئاوازی کوردی بکەین ئەوەندە دەوڵەمەندە کە نەوەی نوێ داهاتووی گۆرانی کوردی پێ زامن بکەن لەو گەنجینە گەورەیە. دەمەوێ باس لە هونەرمەندێکی تاراوگە بکەم کە ئەویش(ڕزگار ڕەنجەڕۆ)یە کە ساڵانێکی دوور و درێژە لەگەڵ هونەری گۆرانیبێژی،ڕێڕەوپراستەقینەی کوردانەی گرتۆتەبەر، کە لەو پێناوەشدا زۆرکاری جوان ومانداووبووون و شەونخونی بەبەرهەمەکانیەوە دیارە بەتایبەتی لەسی دیە تازەکەیدا، دیارەکە دووڕە لە و قەیرانەی کە بە سەرگۆرانی کوردی هاتووە لە تاراوگە، کەبە هەنگاوەکانی بەرەو لوتکەی سەر بڵندی و ئەفراندن وجوانکاری و داهێنان لە هونەری ئاواز ومۆسیقای کوردی دەکات. بەبێ ئەوەی ڕتووشی هونەری بێگانە تێکەڵ بە هونەرەکەی بکات، هەندێ بە ناو هونەرمەند هەیە ئەگەرگوێ بیست و بینەرەکەی بیانی بێ هیچ هەست بەتام وچێژی کوردی ناکات، بەڵام کاکە ڕزگارلەگەڵ ئەوەی کە کاری هاوبەش لەگەڵ هۆڵەندیەکان دەکات هەست بەجیاوازی دەکرێ لە هونەرەکانیاندا کە ئەوان هۆڵەندین و ڕزگاریش کوردە، ئەگەر بێتوو بەشداربی لەبینینی ئاهەنگێرانیکاکە ڕزگار، سەیردەکەی سەروسیمای خۆی یەک پارچە فۆلکلۆری کوردیەیە بە هەمیشەیی، ئەویش بە پژشینی جلی کوردی دەشتی هەولێریان، ئەگەربێت و چاوێک بە ماڵپەڕە هۆڵەندیەکاندا بگێڕین بە تایبەتی ساڵی ئەم ساڵ واتە ٢٠٠٥ لە ئاهەنگ و ڤیستڤاڵەکانی کە بە بۆنەی ٦٠ هەمین ساڵڕۆژی بوونی کۆتاییهێنانی شەڕی جیهانی دووەم وئازادکردنی هۆڵەندا لەدەست نازییەکان ویادکردنەوەی قوربانیەکانی کارەساتەکانی لە4و5ی مایس دەبینی تیپێکی مۆسیقای کوردی بەشداریان کردوە بەناوی تیپی مۆسیقای ئازادی کە پێک هاتوون لەم بەڕێزانە : ڕزگار ڕەنجەڕۆ، هیواجەمال، هەڕێم سەلاح، سۆران ئیبراهیم خەیات، شارام سابووری، حەسەن گەنجۆ، ئالان عارف. شایانی گوتنە ئەم تیپە لەڕێگای ڕێکخراوێکی هۆڵەندی کە نموونەی گۆرانیەکان وبەرهەمەکانی خۆیان بۆنارادوە، دوای پشکنینی، بەشداریان پێ کردوون لەهەموو ئاهەنگەکاندا، بەتایبەتی لە فیستیڤاڵەکانی ئەمساڵی شارە گەورەکانی هۆڵەندا.

بەپێی میدیاکانی هۆڵەندا ومالپەڕە هۆڵەندیەکان تیپی ئازادی دەورێکی کاریگەریان لە نیشاندانی هونەری ئاواز و مۆسیقای گۆرانی کوردی نیشانی خەڵکی هۆڵەندا داوە و جێگای خۆشحاڵیان بوون ، ئەمەش خۆی لە خۆیدا سەرکەوتنێکی گەورەی هونەری کوردی یە، بەڵام ئەوەی جێگای ئاماژە پێ کردنە ئەم تیپە خنجیلانە یە، زۆر نیگەران بوون لە کەناڵە ئاسمانیە کوردیەکان بەگشتی کە بەشدار نەبوون لە گواستنەوەی برگەکانی ئاهەنگی تیپەکەیان ئەوەی کە ئێمە گوێ بیستی بووین لەخزیانەوە تەنها ئەوە بووە کە هیچ ڕەنگ و نیشانەی هیچ پارت وڕێکخراوێکی سیاسی کوردستانیان لە خۆیان نەداوە تەنها وتەنها کوردستانی بوون و بەناوی کوردستانەوە بەشداری فیستیڤاڵەکان بوون.■■■

شانۆی پادشایەتی لە ستۆکهۆڵم پێشکەش دەکات

"سەرکەوتنی خۆشەویستی" و بەهاکانی



دانا رەئوف - سوید

شانۆنامەی: سەرکەوتنی خۆشەویستی Kärlekens Triumf
نووسینی: ماریڤۆ Marivaux
ڕیژی: ستافان روس Staffan Roos
شانۆی: درۆتنینگهۆڵم Drottningholms slottsteater
شانۆی پادشایەتی لە ستۆکهۆڵم

شانۆنامەی سەرکەوتنی خۆشەویستی"، لە نووسینی نووسەری فەرەنسی"ماریڤۆ"١٦٨٨-١٧٦٣یە و پیەسەکەش یەکێکە لە شانۆنامە گرنگەکانی سەدانی ١٧٠٠ەکانی شانۆی فەرەنسی.

"ماریڤۆ" بە شێوازێکی زۆر تایبەت بە خۆی قۆڵ دەبێتەوە بە چەمکەکانی شانۆی کۆمیدی و شۆێنپێی داب ونەریتی "مۆلێیر" و کۆمیدیا "دیلارتی" هەڵدەگرێ. ئەم نووسەرە، شانۆنامەکانیشی ڕاستەوخۆ بۆ گرۆپەکی ئیتالی بە ناوی"کۆمیدیای ئیتالی"یەوە دەنووسێ. گرووپەکەش لە پاریس و لە نیوەی یەکەمی سەدەکانی ١٧٠٠دا، سەرکەوتنێکی هونەری گەورەیان بەدەست هێناوە.

ئێستە ئەم شانۆنامەیە لە سوێد و لەسەر یەکێک لە دێرینترین شانۆکانی ئەم وڵاتەدا پێشکەش دەکرێت .

شانۆی درۆتنینگهۆڵم

ئەم شانۆیە، لە جیهاندا کە تاکو ئێستا چۆن دروستکراوە، وەک خۆی پارێزراوە. شاژنی سوێد خاتوو"لۆڤیسا ئۆلریکا" بڕیاری دروستکردنی داوە. دواتر شانۆی درۆتنینگهۆڵم لە سالی١٧٦٦دا، بە تەواوەتی تەواو دەبێت. ئەم کۆشکە شانۆییە بە کەرەسەیەکی زۆر ساکار دروستکراوە. بە هۆی ئامێرێکی تایبەتییەوە، کە ڕاستەوخۆ بۆ ئەم مەبەستە ئامادەکراوە، دیکۆر و تابلۆکان گۆڕانکارییان بەسەردا دێت. ئەو گۆڕانکارییانەش گەمەیەکی بێهاوتای شانۆییە، ئەفسونێکە لە هیچ شانۆیەکی تری جیهانیدا وێنەی نییە. تابلۆکان، وێنە و دیکۆرەکان بە بەرچاوی بینەرانەوە، لە چاوترۆکانێکدا، هەر وەک ئەفسون گۆڕانکارییان بەسەردا دێت. ئەم شانۆ دێرینە، تا ئێستا ئەو شێواز و کاریگەرییە هونەرییە کۆنانەی سالەکانی ١٧٠٠ ەکانی خۆی وەک: شەپۆلی دەریا، ڕەشەبا، هەورە تریشقە، ئامێری بەکارهێنانی ڕووناکی و زۆر شتی تر وەک خۆی ماوە و، لە کاتی نەمایشە ئۆپێرالیەکاندا، بەپێی پێویست بەکاردەهێنرێ. پێشکەشکردنی ئەم شانۆنامەیەش لەسەر شانۆی درۆتنینگهۆڵم بایەخ و بەهایەکی بێهاوتای هونەری و میژوویی هەیە. نەمایشەکە وانەیەکی دانسقەی کردەیی میژووی شانۆیە.

سەرکەوتنی خۆشەویستی

تێکڕای ڕووداوەکانی شانۆنامەکە لە باخچەیەکدا ڕوودەدات. کێژە شاژنێک عاشقی لاوێک دەبێت، ئەو لاوەش دادەنرێت بە دوژمن و بەرهەڵستکاری ئەو شاژنە. بەڵام ئەم شاژنە عاشقە خۆی لە جلوبەرگی پیاودا دەشارێتەوە و، دەچێتە کۆشکی ئەو لاوە، تا بە شێوەیەکی ڕاستەوخۆ خۆی لەو لاوە نزیک بکاتەوە. ئەم شاژنە، بۆ ئەم مەبەستەش، هەموو ڕێگاکان بەکاردەهێنێت: دەمامک، خۆگۆڕین، گەمەی پیاو و ژن، شانۆی ناو شانۆ، زمانی جەستە و گەمەی پێناس و گەمەی ڕەگەز. هەر دوای ماوەیەکی کەم لەو گەمە پڕ لە عشقە، ئەو شاژنە دەتوانێت بە شێوەیەکی تووندوتیژ هەموو دانیشتوانی ئەو کۆشکە لە خشتەبەرێت، لە ئەنجامدا، خۆی بۆ ئەو گەنجە نەیارە ئاشکرا دەکات و، بەهاکانی خۆشەویستیش بەسەر هەموو دژایەتی و، دوژمنکارییەکاندا زاڵ دەبێت.

ماریڤۆ و شانۆی فەرەنسی

شانۆ، بەها و ڕۆڵێکی گرنگی لە کۆمەڵگای فەرەنسیدا هەبووە، بە تایبەتیش لە سالەکانی ١٦٠٠ەکاندا، هونەری شانۆ دەگاتە ئاستێکی زۆر بەرز. فەرەنسییەکان، خۆیان ئەو سەردەمە دادەنێن بە چەرخێکی گەورە لە میژووی کولتوور و شانۆی وڵاتەکەیاندا. هەر لەم قۆناغەدا، تراژیدیا گەورەکانی(کۆرنی و راسین) و دوای ئەوانیش کۆمیدیاکانی"مۆلێیر" لەدایک دەبێت. کە "ماریڤۆ"ش،



دەردەکەوێت، بە ئاسانی ناتوانێت جێگای خۆی لەو نەخشە پتەو و باڵایەی کولتووری فەرەنسیدا بکاتەوە. بەڵام دوای تەقەلایەکی زۆر و، دۆزینەوەی سیما و فۆرمێکی تایبەت بە خۆی، وەک دیاردەیەکی جیاوازی کۆمیدیای فەرەنسی دەردەکەوێت. هەر لە سەرەتاوە، ئەم نووسەرە، هەوڵیداوە دوور بکەوێتەوە لە تەقلیدکردنی زمان و، کولتووری کۆنی گریکی. شانۆنامەکانیشی بە زمانێکی جیاوازی ساکاری نێو خەڵکی دەنووسێت، شێعر و قافیە وەلاوە دەنێت و، زیاتر لە بەکارهێنانی پرۆسە نزیک دەبێتەوە. هونەرمەندی گەورەی فەرەنسی"ژان لیۆس بارۆ" لە سالی١٩٤٠دا بۆ بوژاندنەوەی"کۆمیدیای فرانسیس" شانۆنامەی "سەرکەوتنی خۆشەویستی" دەکاتە بنەمایەکی گرنگی ڕێپۆرتوارە شانۆییەکەی.

سەرکەوتنی خۆشەویستی لە سوێد

بۆ یەکەمجار ئەم شانۆنامەیە لە سالی١٩٩٥دا، لە سوێد پێشکەشکراوە. ئەم سالّ، بە دوو شێوازی جیاواز و، لەسەر شانۆی جیاوازیش(سەرکەوتنی خۆشەویستی)، سەرکەوتنێکی گەورە بەدەست دەهێنێت. سەرەتا، لەسەر شانۆی پادشایەتی و، لە فۆرمێکی مۆدێرن و شانۆیەکی وێنەیی و، ئێستاتیکیدا نەمایش دەکرێت. دوای چوار مانگ، نەمایشەکە دەگوێزرێتەوە بۆ سەر شانۆ دێرینەکەی درۆتنینگهۆڵم و، لە ئەتمۆسفاریکی هەزار و حەوسەدەکاندا پێشکەشدەکرێتەوە. بەڵام شانۆنامەکە لە هەردوو نەمایشەکەدا، سیمایەکی شێعر ئامێز، وێنەیی و شێوازێکی ئەسلەبە لەخۆدەگرێت. ئەمە جگە لە فۆرمێکی پڕ لە گەمە و، بەکارهێنانی ورد و بەسەلیقەی کۆمیدیای دیلارتی. ■■■

danamarouf@yahoo.se

دراماتووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف

٣٨- ماکس فریش
Max Frish



نووسەری بەناوبانگی سویسری ماکس فریش، لە ١٥ی مانگی مایی١٩١١دا، لە شاری زیوریخ لەدایکبووە. خوولی خوێندنی سەرەتایی و ناوەندی لە زیوریخ تەواودەکات. لە سالی١٩٣٠دا، دیپلۆم وەردەگرێت و لە زانکۆی زیوریخ بەشی ئەدەبیات، دەست بە خوێندن دەکات. پاش دوو سال، بە هۆی گیر و گرفتی ئابووریەوە، ناچاردەبێت واز لە خوێندن بهێنێت. لە سالی١٩٣٣دا، باوکی دەمرێت و دڵواری زیاتریان بۆ دروست دەبێت. فریش بۆ ماوەیەک، وەک هەواڵنێر لە ڕۆژنامەیەکدا کاردەکات. لە سالی١٩٣٤دا، بڕیار دەدات ریشتەکەی خۆی بگۆڕێت و لە بەشی بالەخانەسازیدا دەست بە خوێندن دەکات و، لە سالی١٩٤٠دا، دیپلۆم لەو بەشەدا وەردەگرێت و، پاش دوو سال ژن دەهێنێت. لە سالی١٩٤٤دا، شانۆنامەی"سانتا کروز"دەنووسێت و، لە سالی١٩٤٥دا، شانۆنامەی"دووبارە گۆڕانی دەڤێنەوە"دەخرێتە سەر شانۆ. هەر لە سالی١٩٤٥دا،شانۆنامەی بەناوبانگی"دیواری چین"لەسەر شانۆی شاری زیوریخ پێشکەش دەکرێت. لە سالی١٩٤٨دا، شانۆنامەی "کاتێک شەڕ کۆتایی دێت"لەسەر هەمان شانۆ نمایش دەکرێت. لە سالی١٩٥١دا، شانۆنامەی"گراف ئادرلند" دەنووسێت و، بۆ ئەمریکا سەفەر دەکات. ماوەی سالێک لەوێ دەمێنێتەوە، ئەو سەفەرە، بایەخ و کاریگەری خۆی دەبێتە سەری و ئەزموونێکی هونەری بۆ دەهێنێتە ئاراوە. لەسالی١٩٥٢دا، شانۆنامەی"دۆزوان، یان عیسق بە ئەندازیاری" و، لە سالی١٩٥٨دا، شانۆنامەی"ئاگر هەڵگیرسێنەر"دەنووسێت، لەسەر شانۆی زیوریخ، پێشکەش دەکرێت و، پێشوازییەکی گەرمی لێ دەکرێت و، ماکس فریش وەک دراماتووسێکی جیهانی ناوبانگ دەردەکات. لە سالی١٩٦١دا، شانۆنامەی"ئاندۆرا"دەنووسێت، لە هەمان ساڵدا، لە هاوسەرگیەکی جیابوەتەوە و بۆ شاری ڕۆما سەفەر دەکات. لە سالی١٩٦٨دا، شانۆنامەی"بیوگرافی گەمەیەک" بڵاودەکاتەوە. فریشی بەتوانا ڕۆمانی"ئیشتیلەر" و ڕۆمانی"هۆمۆ فابیر" و ڕۆمانی"ناوی من کانتان بێنە" دەنووسێت. ماکس فریش، چەند خەڵاتێکی ئەدەبی پێ دەبەخشرێت، لەوانە، خەڵاتی"جۆرج بۆشنەر" و خەڵاتی"ڕاین" و خەڵاتی"شیلەر". ماکس فریش، لە سالی١٩٩١دا، کۆچی دوایی دەکات و ماڵئاوایی لە هونەر و ژیان دەکات. ■■■

مام جەلال بۆ رۆژنامەی "ئاخشەم"ی تورکی:

خەیاڵی کوردستانێکی سەربەخۆ دوای رووخانی سەدام کۆتایی پێهات!



رۆژی٢٠٠٥/٦/٢٥، رۆژنامەنووس حوسنی مەحلی چاوپێکەوتنێکی لەگەڵ ڕێزدار جەلال تاڵەبانی بۆ رۆژنامەی "ئەخشەم"ی تورکی سازکرد. رۆژنامەی ئەخشەم دەڵێت بەپێی قسەکانی تاڵەبانی، کوردستانێکی سەربەخۆ، لەدوای ڕووخاندنی سەدام و بوونی تاڵەبانی بە سەرکۆماری عێراق، کۆتایی بەو خەیاڵە هێنا. هەروەها" ئەخشەم" لەسەر زاری مام جەلال دەڵێت کە شیعەکانی عێراق ئێرانیان لە پشتە و، سوننەکان وڵاتە عەرەبییەکانیان لە پشتە و، کوردیش تورکیایان لە پشت بووە و دەبێت.

حوسنی مەحلی: ئایا ڕێککەوتنێکی تەواو سەبارەت بە سیستەمی فیدراڵی لە نێوان گشت عێراقییەکاندا هەیە؟

جەلال تاڵەبانی:زۆربەی عێراقییەکان،پشتیوانی ئەم سیستەمە دەکەن، چونکە فیدرالیزم، تەنها داواکاری کورد نییە، عەرەبی شیعەش داوای فیدراڵی دەکەن، زۆر لایەنیش لە باشووردا، هەوڵ دەدەن بۆ ئەوەی سیستەمێکی فیدراڵی لە ناوچەکەیاندا رابگەێنن، بەڵام دەربارەی شێوەی فیدراڵی، بڕچوونی جۆراوجۆر لە ئاراداییە، هەندێک داکۆکی لە فیدراڵی ناوچەکان دەکەن، هەندێکی دیکەش پێشنیاری دابەشکردنی عێراق بەسەر پێنج ناوچە زێتر دەکەن، عەرەبە سوننەکانیش، پێیان باشە عێراق بۆ دوو ناوچەی عەرەبی و کوردی دابەش بکرێت.

حوسنی مەحلی: ئایا سیستەمی فیدراڵی لەسەر بنەمای جوگرافی یان ئەتنیکی یان مەزهەبی دەبێت؟

جەلال تاڵەبانی: هەموو لایەک لەسەر سیستەمی جوگرافی کۆکن، نەک ئەتنیکی یان مەزهەبی، لەوەش گرنگتر، بەکارهێنانی شێوازی تەوافوق لە نێوان گشت عێراقییەکاندا، واتە هەموو لایەنەکان ڕێک بکەون و زۆرینە ڕای بەسەر کەمینەدا نەسەپێنێت، چونکە کۆمەڵگەی عێراقی بەرگەی ئەم نموونانە ناگرێت.

حوسنی مەحلی: ئێوە سااڵنێکی دوور و درێژە بۆ هێنانە دی خەیاڵی کورد، خەباتتان کردووە، ئێستا ئێوە لە پۆستی سەرکۆماری عێراقدان، داخۆ خەیاڵی کورد لە هێنانەدی دەوڵەتی سەربەخۆ چی بەسەر هات؟

جەلال تاڵەبانی: لە منداڵی خۆمەوە تا ئێستا کە٨٥ ساڵە، لە خەباتدام، سەرەتا لە پێناو عێراقێکی سەربەست و دیموکراتدا تێکۆشام و، پاشان بۆ مافی گەلی کورد. کاتێکیش داکۆکیم لە مافی چارەی خۆنووسین بۆ گەلی کورد، کرد، داکۆکیم لەوە نەکردووە یان ڕۆژێک لە ڕۆژان نەمگوتووە کوردستان لە عێراق جیابێتەوە. ئەگەر ئێمە لە عێراق، سیستەمێکی فیدراڵی و ڕاست و دروست بێتینە ئاراوە، ئەوا خەیاڵی کوردان دێتە دی. ئەو خەیاڵەی مەبەستمە، جیایە لە خەیاڵی هەندێ شاعیر و نەتەوەپەرەستی کورد، چونکە ئەو خەیاڵانە خەیاڵی واقیعی نین و پیادەکردنیان زۆر دوورە. گریمان دەوڵەتی کورد دروست بوو، چۆن بەدردەوام دەبێت؟ دەوڵەتێک کە سوریا و عێراق و ئێران و تورکیای لە دەوروبەرێت، چۆن بەردەوام دەبێت؟

حوسنی مەحلی: دەوڵەتی ئیسرائیل بە دژی وێستی عەرەب هاتە ئاراوە و ئیستاش بەردەوامە؟

جەلال تاڵەبانی: ئیسرائیل سنووری لەسەر دەریا هەیە و، لۆبییەکی جولەکەی بەهێزی لە سەرانسەری جیهاندا هەبووە. لە سەرووی ئەمانەشەوە، هەر لە یەکەم ڕۆژەوە، ئەمریکا پشتگیری لێکردووە. ئیسرائیل لە١٩٤٨ەوە، تا ئێستا شەڕ دەکات، ئێمەش شەڕمان ڕاگرتووە، ئیدی ئێمە ئاشتیمان دەوێت.

حوسنی مەحلی: لەوانەیە ئەمریکا بتان پارێزێت؟

جەلال تاڵەبانی: ئەمریکا و ئەورووپا داوای بێکهێتانی دەوڵەتی کوردییان لێ نەکردووین، بە پێچەوانەوە، ئەمریکا لە پێناو عێراقێکی یەکگرتوو پشتگیری لە ئێمە دەکات. ئەگەر من سەرۆکی دەوڵەتێکی کوردی گەمارۆدراو بوومایە، نەتۆ سەردانت دەکردم و نە منیش دەرفەتی هاتنم بۆ ئیستەنبول و خواردنی ژەمێکی ماسیم لەگەڵ تۆدا بۆ دەرەخسا.

حوسنی مەحلی: بەشداریکردنی کورد لە بەغداد، کۆتایی بە خەونی کورد هێنا؟

جەلال تاڵەبانی: بەڵێ وایە، ئەمە بە تەواوی ڕاستە. یەکەم جارە کورد ببینێت کە بۆتە هاووڵاتی پلەی یەکەمی عێراق، ئێستا هەموو کوردێک شانازی بە عێراقیبوونی خۆی دەکات، تاڵەبانی بووە سەرکۆمار و زێباری بووە وەزیری دەرەوە و لە حکومەتیشدا، هەشت وەزیری کورد هەیە، بۆیە کورد زانییان کە خاوەنی ئەو وڵاتەن و، باوەڕیان پێ هێنا و، ئەو هەست و باوەڕە، بووە هۆی نەمانی بیری جوداخوازی، چونکە کورد نەک تەنها لە کوردستان، بەڵکو لە بەغداش بوونە خاوەن قسە و فەرمان.

حوسنی مەحلی: ئەزموونی کورد، چۆن کارەکاتە سەر کوردی ئێران و سوریا و تورکیا؟

جەلال تاڵەبانی: ئەگەر ئێمە لە عێراق سیستەمێکی دیموکراتی و ئازاد و یەکسان و ڕێزگر لە مافی مرۆڤ و دادپەروەری بهێنینە ئاراوە، ئەمە بۆ هەموو ناوچەکە دەبێتە نموونە. لە سوریا، لە سەردەمی پێشووتدا، بوونی کوردیان ڕەت دەکردەوە، بەڵام ئێستا بەشار ئەسەد بوونی کوردی لا پەسەندە و، دەڵێت پێویستە مافی کورد بدرێت، ئەمڕۆ، لە سوریا، کورد خۆپیشاندان ساز دەکەن و، ڕێکخراو و پارت دەهێننە ئاراوە.

حوسنی مەحلی: ئەی ئێران و تورکیا؟

جەلال تاڵەبانی: ئێمە ناتوانین کار لە تورکیا بکەین، تورکیا کار لە ئێمە دەکات. تورکیا، دەوڵەتی هەرە گرنگ و هاوچەرخ و پێشکەوتوو و دیموکراتی ناوچەکەیە، تورکیایەکی خاوەن مێژوویەکی دەوڵەمەند و دیموکرات، بۆ کورد پێگەیەکی ئیستراتیجییە. شیعەکانی عێراق، ئێرانیان لە پشتە و، سوننەکانیش، دەوڵەتە عەرەبییەکانیان لە پشتە و، کوردیش تورکیای لە پشت بووە و دەبێت.

حوسنی مەحلی: کێشەیەک لە نێوان ئێوە و تورکیادا هەیە، ئەویش بوونی PKK لە باکووردا؟

جەلال تاڵەبانی: ئێستا ئێمە نە سوپا و، نە هێزێکی ئاسایشمان هەیە، لەگەڵ ئەوەشدا، لە دژی تیرۆریزم لە ڕۆژئێکی سەختداین. ئێمە نیگەرانین لە بوونی PKK لە ناو خاکماندا.

حوسنی مەحلی: ئەمریکا موجاهیدین خەلقی چەک کرد، ئایا ناخوازێت PKKش وا لێ بکات؟

جەلال تاڵەبانی: ئەمریکا، مەبەستی ئەوە نییە لەگەڵPKKشەڕ بکات، کێشەی هەرە گرنگی ئەمریکا، بەرقەرارببوونی ئاسایشە لە عێراق و، ناخوازێت لەگەڵ هێزێکی تر شەڕ بکات.

حوسنی مەحلی: ئایا ئەمریکا حیساباتی دیکەیان هەیە؟

جەلال تاڵەبانی: ئەو پرسیارە لە ئەمریکییەکان بکەن، ئەمریکییەکان، لە هەموو کات و شوێنێکدا، حیساباتی خۆیان هەیە، ئەمریکا، دەوڵەتێکی مەزن و، پێشکەوتووە.

حوسنی مەحلی: جیاوازی نێوان جەلال تاڵەبانی وەک کەسایەتی و، جەلال تاڵەبانی سەرکۆمار چییە؟

جەلال تاڵەبانی: مام جەلال ئەو کەسەیە کە، تەواوی ژیانی خۆی بۆ خەباتی لە پێناوی ئازادی و مافەکانی گەلی کورد تەرخانکرد، جەلال تاڵەبانی سەرکۆماری عێراقە، ئەو نەک تەنها لە کورد، بەڵکو لە عەرەب و تورکمان و سوننە و شیعە و مەسیحی و کلدان و ئاشوورییەکانیش بەرپرسیارە، لەبەر ئەوە، بەرپرسیاریەتییەکەی ئێستا قورستر و فراوانترە.

حوسنی مەحلی: ئەمریکا کەی هێزەکانی لە عێراق دەکشێنێتەوە؟

جەلال تاڵەبانی: سوپا و ئاسایشی عێراق ئەگەر بە جوانی جێگەی خۆی بگرێت، ئێمە سوپاسی ئەمریکا دەگەین و پێیان دەڵێین، بڕۆن. کەسیش گومانی لەوە نەبێت. ئەمریکا چۆن هات، هەر وا دەگەڕێتەوە و ئەگەر لە ماوەی دوو ساڵدا، هیچ ڕوو نەدات، ئەوا ئەمریکا دەڕواتەوە. ■■■

وەرگێران: پەیامی کورد

بێدەنگی مەڕەکان....

The silence of lambs

"زۆر بەڵامەوە سەیرە کە ڕەخنە لە بەرنامەکەم دەگیرێت، خۆ وەزیرە کوردەکان لەوێ بوون و هیچ جۆرە کاردانەوەیەکیان نیشان نەدابوو بەرامبەر ئەو بەرنامە کارەی کە بۆ حکومەتم دانابوو... "

سەرۆک وەزیرانی عێراقی ئیبراهیم ئەلجەعفەری



خەسرۆ پیربااڵ

کوردەکان بەجیدی بڕیاری ئەوەیان داوە، عێراقێکی نوێ ی دیموکرات و فرەحزبی و فیدراڵ لەگەڵ هێزە سیاسیەکانی عەرەب دڕووست بکەنەوە، دەوڵەتی عێراق لە ئارامی و جێگیربوونی ئەمن و ئاسایشدا بێت و دووبارە بگەڕێتەوە نێو کۆمەڵگای نێودەوڵەتی، لەجیاتی ئەوەی پێشتر دەوڵەت و عێراقیەکان وەکوو وڵاتێک و میللتێکی هاوکار بۆ تەروریستی نێودەوڵەتی، ئێستا، عێراقی فیدراڵ وەکوو نموونەی ئازادی و هاوکاری کۆمەڵگای نێودەوڵەتی و ئەمریکا لەشەڕ دژ بە تیرور و تروریستان لە گۆڕەپانی سیاسەتی نێودەوڵتیدایە .

بۆ بەشداریشمان لە ژیانی سیاسی و کۆمەڵایەتی کۆمەڵگای عیراقی، هێزو و لایانە سیاسیەکانی کوردستان، لەسەرووی هەمووشیانەوە، پارتی دیموکراتی کوردستان و یەکێتی نیشتیمانی کوردستان، هەر پاش ڕووخانی دیواری دیکتاتۆر لە بەغدا، خەریکی ڕێکخستن و بەشدارکردی کادر و کەسایەتی و کاندیدەکانی خۆیانن لە حکومەت و ناوەندە جۆربەجۆرەکانی دەوڵەت، لەوانەیش لە بواری ڕاگەیاندن و پەخش و ڕێکخراوە حکومی و ناحکومیەکانی بەغدای پایتەختدا

لێرەدا، گرینگترین گۆڕەپان، بەشداریکردنمانە لە ناوەندی بڕیار و ئەنجوومەنی نیشتیمانی عێراقی فیدراڵە، لە پەرلەمانی بەغدایە، دەبێت بەشداریمان لە باشترین و ئەکتیڤترین ئاست بێت، بۆ ئەم مەسەلەیەش، ژمارەیەکی زۆری کورد هەن کە بە هەماهەنگی لە نێوان هێزە کوردستانیەکان بۆ بەغدا دەستنیشانکراون، بەڵام مخابن پێدەچێت بەشی هەرەزۆریان هەر دەوام ناکەن !وە بەشدار نەبن لە هەموو کۆبوونەوەکانی پەرلەمانی عێراقی، پێموابێ گەواهی ئەم ڕاستیە تاڵەش ئاشکرایە هەر لە دەستبەکاربوونی یەکەمین کابینەی حکومەتی عێراقی فیدراڵەوە، چەندین بڕیار و مەسەلەی مەترسیدارمان هاتوەتەپێش، میللەتی کوردستانیش، تەنها بەڕێگای کەناڵەکانی ڕاگەیاندنەوە ئاگادار کراینەوە، یانیش کاتێک لە سەری بڵندەوە سەرۆک بارزانی، چەند چاودێرێکی تر، زەنگی مەترسیان لێدابی، ئینجا خەڵکی ئاگاداری مەسەلەکان کراینەوە لێگەڕنا ، ئەوە بەتەمای پەرلەمەنتارانمان ، بێژینگان دەبەینە بەر چێڵی !.

ئەمڕۆکە کورد لە بەغدا، لە شەڕێکی قورسی دەستووری و سیاسیدان، دەبێت لە نێوان خۆیان، هەفتانە یان مانگانە، کۆبوونەوە و هەماهەنگیان هەبێت و یەکتر ببینن، هاوکار و پێکەوە لەسەر پرسە گرینگەکان ئاڵوگۆڕی بیروڕا بکەن و پێکەوە، پێش ئەوەی هیچ بڕیارێکی حکومەت تێپەڕێت و بچەسپێت، دەبێت کوردەکان هەڵوێستێکی یەکگرتوویان هەبێت بەرامبەری و و داکۆکیکەن و موناقەشەی بکەن و بیروبۆچوونی خۆیانیان لەسەر بەیان بکەن، بەو شێوەیەبێت کە لەبەرژەوەندی میللەتی کوردستاندا بێت .

بەڵام مخابن، ئەوەی تاوەکوو ئێستا هەستی پێدەکرێت، بەشی هەرە زۆری ئەو بەڕێزانە زۆر کەم دەوام دەکەن، بەشدارنابن لە کۆبوونەوەکانی ئەنجوومەنی نیشتیمانی، هەندێکیشیان ئەگەر بەشداریش بن، ئەوە ئەکتیڤ و چالاک نین ؟ هیچ ڕۆڵیان نیە لە پێشگرتنی بڕیار و هەڵوێستە دووڕۆنکاریەکانی هەندێک لایانە سیاسیەکانی عەرەبی عێراقی لەناو ئەنجوومەنی نیشتیمانی، بەتایبەتی ڕووبەڕووبوونەوەیان لەگەڵ بەرنامەی حکومەتی ئیبراهیم ئەلجەعفەری کە هەر لەسەرەتای دەستبەکاربوونی، هیچ شتێکی بۆ کورد پێ نیە و ناشبێت لە هەڵوێست و سیاسەتەکەی خافڵ بین ..

بەگوێرەی هەندێک زانیاری، زوربەی ئەندامانی کوردی نێو پەرلەمانی عێراقی خەریکی دەرکردنی پەسەپۆرت و سەفەرکردن بۆ دەرەوەی وڵات بە مەبەستی گەشت و گوزار یانیش خەریکی کڕین و نوێکردنەوەی ئۆتۆمۆبیلن !!؟؟

بەراستی لەم قۆناغە مێژوویییەدا، بەشداریکردنمان لە گفتوگۆیەکانی ناو پەرلەمان، گرینگەیکی مێژوویی گەورەی هەیە، بەتایبەتیش، ئێستا پرسی کەرکوک و یەکلاکردنەوەی مەسەلەی سەقامگیری و چەسپاندنی فیدراڵیەتی عێراق و بڕیاردانی چارەنووسی میللەتی کوردستان و ئاستی بەشداریمان و کاریگەریمان لەسەر ڕەوتی مەسەلەکان لە عیراقدا یەکلانەکراوەتەوە و وەکوو گرفتێکی گەورە ماونەتەوە، ڕۆژانە پێویستی بە خۆسازکردن و هەماهەنگیی نێوان کوردەکان هەیە . .

زۆر لە پرسە کوردستانیەکان، ئێستا بەستراوتەوە بە بەغدا و بڕیاری سیاسی حکومەتی فیدراڵ ، لەبەرئەوەیە دەبێت بەشداریمان لە گفتوگۆکان زۆر لە ئاستێکی بەرز بێت و زۆر چالاکانە بێت، ئەندامانی کوردی نێو پەرلەمان قوڵیان بۆ کارێکی قورس هەڵبکەن و سوود لە هەموو ناوەند و لایان کوردی و هەروەها سوودیان لە لایانە عەرەب و بیانیەکانی پایتەخت وەرگرتبا بۆ کارێکی ڕێکوپێک و بۆ داکۆکیکردن لە بەرژەوەندیەکانی میللەتی کوردستان، بەتایبەتیش ،سوود لە ناوەندی ڕاگەیاندن و دیپلۆماسیەکانی وڵاتانی عەرەبی و بێگانە وەربگرن بۆ خۆچەسپاندن و ئاستێکی بەرزی ئامادەگی کوردستانی لە بەغدا .

بە کوردی و بەکورتی، دەبێت دان بەوە بنێین کە بوونمان لاوازە لە بەغدا و ئاستی بەشداربوونی پەرلەمانتارە کوردەکانی ئەنجوومەنی نیشتیمانی عێراقی فیدراڵ، زۆر لاواز و سەقەتن. نابێت بێدەنگی بنوێنن لە کاتی گفتوگۆیەکانی نێو پەرلەمان، دەبێت ئەکتیڤتر و کاریگەرتربن لەوەی هەن، ئەو بەڕێزانە ئەرکێکی نەتەوەیی و نیشتیمانی گەورەیان لەئەستۆدایە.

شوکر هەموشمان هوشیارین بەو مەترسیانەی کە دەورەمانیان داوە، پێشموابێ سەرکردایەتی کورد، لە ئەزموونی ئەو دوو ساڵەی ڕابردوو، باش دۆست و دوژمنانی خۆی دەناسێتەوە، بۆ ئەوەش دەبێت چیتر نوێنەرانمان لە پەرلەمانی عێراقی هاوشێوەی ئەو(ڕانەمەڕانە) نەبن کە بەبێ هوشیاری و بێدەنگیەوە بەرەو لای قەساب ڕێدەکەن!.■■■

*(بێدەنگی مەڕەکان): تێزمێکی ئینگلیزیە بەکاردێت بۆ ئەوکەسانەی ئاگادار و هوشیار نین بەرامبەر دووژمنەکانیان، هیچ مەبەستێکی ناشرینی لە خۆیدا هەڵناگرێت ..

Pirbal@hotmail.com

شاندی پەرلەمانی کوردستان سەردانی پەرلەمانی ئەوروپای کرد

سەرۆکی فراکسیۆنیCDUی ئەڵمانی لە پەرلەمانی ئەوروپا

داوای کردنەوەی ئۆفیسێکی حکومەتی هەرێم بۆ کاروباری ئابووری لە پەرلەمانی ئەوروپی کرد



شاندی حکومەتی کوردستان بەسەرۆکایەتی د. ناسیح غفور سەرۆکی فراکسیونی زەرد و بە یاوەری رۆمیو هەکاری سکرتێری حزبی دیموکراتی بەیت نەهرێن لە فراکسیونی کلدوئاشور و حەسیب رۆژبەیانی یاریدەدەری پارێزگاری کەرکوک، سلاح عەولا و محمەد علی نوێنەری بازرگانانی کوردستان

لوقمان بەرزنجی - بروکسل - شاندی پەرلەمانی کوردستان، کاتژمێری یانزە و نیوی پێش نیوەڕۆی ڕۆژی ٦/٢٨ گەیشتنە بڕۆکسل. سەرەتا شاندی ناوبراو سەردانی بارەگای نوێنەرایەتی حکومەتی هەرێمی کوردستانیان کرد و لە لایەن بڕهان جاف بەرپرسی نوێنەرایەتی، پێشوازیان لێکرا. جێگەی باسە شاندی حکومەتی کوردستان بەسەرۆکایەتی د. ناسیح غفور سەرۆکی فراکسیونی زەرد بە یاوەری ڕۆمیو هەکاری سکرتێری حزبی دیموکراتی بەیت نەهرێن لە فراکسیونی کلدوئاشور و حەسیب ڕۆژبەیانی یاریدەدەری پارێزگاری کەرکوک و هەروەها کاک سلیمان یەلدرم بەرپرسی ڕێکخراوی خۆرهەڵاتی ناوەڕاست لە ڕێکخراوی گەلانی هەڕەشە لێکراو و چەند سەرمایەدارێک لە بازرگانی کوردستان. پەیامی کورد لە بارەگای نوێنەرایەتی توانی چەند دیدارێک لەگەڵ شاندەکە سازبدات. سەرەتا پرسی گرنگی ئەو سەردانەمان لە د. ناسیح غفور کرد و لە وەڵامدا بەڕێزی گووتی: ئەوەی ڕاستی بێت شاندەکەی ئێمە لەڕۆژی ٦/١٧ گەیشتینە ئەوروپا و یەکەمین وێستگەمان شاری "بەرلین"ی پایتەختی ئەڵمانیا بوو لە هەمان ڕۆژی گەیشتنمان لە کاتژمێر دوو و نیوی پاش نیوەڕۆ سەردانی وەزارەتی کاروباری دەرەوەی ئەڵمانیامان کرد و لەلایەن بەرپرسی کاروباری ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست و پسپۆرێکی تایبەت بە کاروباری عێراق پێشوازیمان لێکرا و دانیشتنەکانمان دەستی پێکرد. سەرەتا لایەنی ئەڵمانی داوایان کرد کە ئێمە تۆزێک باسی ڕەوشی ئەمرۆی عێراق و کوردستانیان بۆ بکەین. ئێمەش باسێکی تێر و تەسەلمان لەم بارەیەوە خستە بەردەمیان و زۆر بەڕاشکاوی ڕاز و گلەییەکانی خۆمانمان پێ ڕاگەیاندن لە ڕووی کەمی هاوکاریکردنی حکومەتی ئەڵمانی، وەک پێویست هیچ هەنگاوێکی پراکتیکی نەناوە بۆ ئاوەدانکردنەوەی کوردستان، بە تایبەتی دوای پرۆسەی ئازادکردنی عێراق. بۆیە ئێمە تەکیدمان لەسەر ئەم خاڵە کردەوە.

پ: ئەڵمانەکان وەڵامیان چی بوو؟

و: وەڵامیان زۆر ئیجابی بوو و دانیان بە کەمتەرخەمی خۆیاندا ناو و گووتیان نەدەبوایە حکومەتەکەی ئێمە بەم شێوەیە هەڵسوکەوتی کردبایە، گوتیان ئێمەش لە هەوڵی ئەوەدا دەبین کە حکومەتەکەمان چاوێک بە سیاسەتی خۆیدا بخشێنێتەوە سەبارەت بەو هەوڵێستانەی کە بەرانبەر عێراق و کوردستان لە ڕابردوودا هەیبووە. کۆبوونەوەکەمان ماوەی سێ کاتژمێری خایاند و گەشبینیشم بەوەی کە ئاکامەکانی باش دەبێت. لە دوای تەوابوونی کۆبوونەوەکەمان بەڕەو شاری گوێتنگن چووین لەوێش چەند دیدار و کۆبوونەوەمان سازدا لەگەڵ لایەنە پێوەندارەکان بە بواری ئابووری سیاسی هەروەها توانیمان سەردانێکی شاری فرانکفۆرت بکەین و لەوێش لەگەڵ بەرپرسانی "کریدیت بانک" کۆبوونەوەیەکی گرنگ ساز بدێن. لەم دانیشتنەماندا بە وردی باسمان لە چۆنیەتی بووژانەوەی ئابووری کوردستان کرد.

پ: وەڵامی ئەوان چی بوو؟

و: ئەوان زیاتر مەبەستیان ئەوە بوو کە تایبەتمەندییەکانی کوردستان بزانن لە ڕووی یاسایی و ئاساییشەوە.

پ: ئایا ئەوان بەبێ ڕەزامەندی حکومەتەکەیان دەتوانن بە پیر داخوازیەکانی ئێوەبێن؟

و: نەخێر. بەڵام ئەوانیش بەڵێنی ئەوەیان پێدابن کە ئەم مەسەلەیە لەگەڵ حکومەتەکەیان باس دەکەن و لەوانەشە شاندێکیان سەردانی کوردستان بکەن و لە نزیکەوە بارو دۆخی کوردستان ببینن تاوەکو بەرنامە و دیدی هاوکاریکردن لە ئایندەدا، تۆمار بکەن.

پ: وەک دەزانین سەردانی پەرلەمانی(نیدرزاکسن) تان لە شاری هانۆڤەر کردوە لەوێ چیتان ئەنجامداوە؟

و: بەڵێ، لەوێش لەگەڵ جێگری سەرۆکی پەرلەمان و چەند پەرلەمانتارێکی ئەو بەشە فیدارالە پێشوازی کراین و لە دانیشتنێکی دۆستانە بیرو بۆچوونەکانی خۆمان سەبارەت بە ڕەوشی ئەمرۆی کوردستان و ئەو پێشکەوتنانەی کە بەدەست هاتوون بۆ باسکردن، دوا جار بیرو بۆ چوونەکان ئاڵوگۆڕ کران و داوای ئەوەمان لێکردن کە دەبێت ڕۆڵی خۆیان ببینن لە دەوڵەمەندکردنی ئەزموونی دیموکراتی و دەوڵەمەندکردنی ئەزموونی پەرلەمانی کوردستان. هەروەها باسی گرنگی هاوڕێیەتی هەردوو شاری هەولێر و هانۆڤەرمان کرد، گوتمان پێویستە پێوەندییەک دروست ببێت بە تایبەتی ئەو باسەمان ڕووبەڕووی د.هیربرت شمالشتیگە پارێزگاری هانۆڤەر کرد. دەبێت ئەوەش بڵێم کە ئەو پارێزگارە دۆستێکی زۆر نزیکی بارزانی نەمربوو. زۆر دڵخۆشیش بوو بە ئەم بارودۆخەی ئەمڕۆی کوردستان. بەڵێنی ئەوەی پێدام کە هەموو هەوڵێک دەدات بۆ دروستکردنی پێوەندی و بە هاوڕێکردنی هەولێر و هانۆڤەر، وێرای ئەوەش گوتی لە چەند ڕۆژی ئایندە کۆبوونەوەی پارێزگارەکانی ئەڵمانیا دەبەسترێت، هەوڵ دەدەم ئەم بابەتە لە کۆبوونەوەکەمدا باس بکەم، بۆ ئەوەی ئەوانیش لەلایەن خۆیانەوە بتوانن هاوکاری گەلی کوردستان بکەن. هەر لەم دیدارەماندا بەدرێژی لەسەر ڕەوشی کەرکوک وەستاین.

پ: لەگەڵ کام لە حزبەکانی ئەڵمانیا دیدارتان کرد؟

و: تاوەکو ئێستا هیچ دیدارێکمان سازنەداوە.

پ: ئەی چالاکی ترتان لە ئەڵمانیا چی بوو ؟

و:چەند چالاکیەک بوو لەگەڵ ڕەوەندی کورد وەک بەشداریکردنمان لە ئاهەنگی سەروەری هەڵبژاردنی بەڕێز کاک مەسعود بارزانی بۆ سەرۆکی هەرێم و گرتنی سمینارێک لە شاری بیلەفیلد.

پ: وەک دەزانین ئەمڕۆ لە بڕۆکسل کۆبونەوەیەکتان لە پەرلەمانی ئەورپیدا هەیە لەم کۆبوونەوەیە چ. نامەیەکتان هەیە بۆ ئەوروپیەکان؟

و: ئەمڕو کاتژمێری سێ و نیو لە باڵەخانەی پەرلەمانی ئەوروپی، دیدارێکی دۆستانەمان لەگەڵ پرۆفیسۆر پۆتەرینگ سەرۆکی فراکسیونی CDU ی ئەڵمانی کە گەورەترین فراکسیونە لە پەرلەمانی ئەوروپی دا، هەیە.

پ: چیتان ئامادەکردوە بۆ ئەم دیدارە؟

و: ئێمە لەلایەن خزمانەوە فایلێکمان سەبارەت بە ڕۆڵی پەرلەمانی کوردستان، لە سەرەتایی دامەزراندنیەوە تاکوو هەڵبژاردنەکانی ئەم دواییە لە ڕووی یاسا و مافی مرۆڤ و مافی ئافرەتان، ئامادەکردوە.

ئەمجارە ڕووی پرسیارمان ئاراستەی ڕۆمیو هەکاری ئەندامی فراکسیونی کلدوئاشوری لە پەرلەمانی کوردستان کرد، سەبارەت بە جموجۆڵی چەند کەسانێکی ئاشوری کە لەدەرەوەی کوردستان پرۆپاگەندە دژی حکوومەتی هەرێمی کوردستان بڵاودەکەنەوە کە گوایە کلدو ئاشوریەکان لە کوردستان مافی تەواویان پێنەدراوە و چەوساوەن. لەوەڵامدا، ڕۆمیو هەکاری گوتی:

لە ڕاستیدا هەموو کەسێک ئازادە لە دەربڕینی بیروڕا بەڵام من هەرگیز لەگەڵ ئەو بیروڕایە نیم و مەسەلەی تۆندڕەوی ئەوان لەم بارەیەوە دەگەڕێتەوە بۆ دووربوونی ئەوان لە واقیعی و ژیانی ئاشوریەکان لە کوردستان و، ئەومافانەی وەدەست هاتوون بۆ کلدو ئاشوریەکان بۆیە لەوانەیە ئەم جۆرە کەسانە کەوتبنە ژێر باری هێندێک لە تەئسیراتی گوێگرتنی ناحەزانی حکومەتی هەرێمی کوردستان و هیوادارم بێن بۆ کوردستان و بەچاوی خۆیان ڕاستیەکان ببینن.

پ: دیارە لەم دواییەدا کاری تیرۆر زۆر لە بەرامبەر کەسایەتیەکانی هەراسان کردووە. لێرە لە ئەورووپا دەنگی ئەوە هەیە کە بەشێکی زۆر لە بەغدا و خواروی عێراق ڕوویان کردووەتە کوردستان؟

و: بەڵی ئەمەیان ڕاستە و ژمارەشیان لەسەروی پانزە تا شانزە هەزارێک هەن و بەش زۆریشیان تاراەیەک ژیانیان لە کوردستان بۆ مسۆگەر کراوە بەڕای من ئەمە وەڵام دانەوەیکی زۆر باشە بۆ ئەوانەی کە پرۆپاگەندە لە دژی حکومەتی هەرێمی کوردستاندا دەکەن.

جێی ئاماژەیە، شاندەکەی پەرلەمانی کوردستان سەردانی پەرلەمانی ئەوروپای کرد و لەوێش لەگەڵ پرۆفیسۆر پۆتەرینگ سەرۆکی فراکسیۆنیCDUی ئەڵمانی کە گەورەترین فراکسیۆنە لە پەرلەمانی ئەوروپا کۆبوونەوە و هەمان فراکسیۆن پێشنیاری ئەوەی کرد کە لە جیاتی ئەوەی بیرۆیەکی سیاسی بچوک دابنێن، با ئۆفیسێکی حکومەتی هەرێم بۆ کاروباری ئابووری بکەنەوە و لەگەڵ پەرلەمانی ئەوروپی لە پێوەندیدا بن.



شاندی پەرلەمان و حکومەتی کوردستان لە شارەوانی هانۆڤەر

بانگەوازی کومیتەی پەنابەرانی کوردی ئێرانی لە تورکیا

بۆ هەموو کۆڕ و کۆمەڵ و ڕێکخراوە کوردیەکانی ئوروپا، ئەمریکا، کانادا، ئوستڕالیا !

بۆ هەموو ڕێکخراوە و بەشەردۆستەکان !

بۆ هەموو کوردێکی بەشەرەف و دڵسۆز لە سەرتاسەری جیهان !

دۆخی پەنابەرانی ڕۆژهەڵات لە تورکیە ڕۆژ بە ڕۆژ بەرەو خراپتربوونی زیاتر دەچێ، بەشی هەرە زۆری ئەو کەسانەی لە ماوەی پێشوو لە خۆپێشاندانی بەردەم دەرگای UNHCR لە ئانکارا بەشدار بوون لە هەموو شارەکان بۆ بەردەم دادگا ڕاکێشراون و بێ حورمەتییەکی زۆریان پێ دەکرێ، مانگرتن لە خواردن هەر وا درێژەی هەیە و ژمارەیان هەر لە زیاد بوونە و کەس ناوڕیان وەسەرنادا. مەحدودییەتەکانی کومیساریای بەرزی پەنابەران و خەمساردی و کەمتەرخەمییەکانیان ڕۆژ لەگەڵ ڕۆژ زیاتر دەبێ، بە چەشنێک ئەوە ٣ مانگە ئەو بڕە یارمەتییەی کە جار و بار دەدرا بە پەنابەران، بڕاوە و نادرێ، هەموو یارمەتی دەرمانی و پزیشکییەکان کەم کراونەتەوە و نەخۆشەکان چارەسەر ناکرێن و تەنیا ژمارەتەلەفۆنێک کە بۆ ئەم مەبەستە دراوە بە پەنابەران هیچ کاتێک وەڵام ناداتەوە. بە کورتی ئەو باس و خواستانەی کە ماوەیەکە لەسەر دیپۆرت (سنووردانان) کردنەوەی ئەو پەنابەرانە دەکرێن، وا دیارە ڕەنگی ڕاستی بە خۆوە دەگرن و مەترسییەکان زیاتر دەبێ.

بۆیە داوای بە پەلەتان لێ دەکەین کە بۆ پێشگیری لە گەڕی تەسلیم کردنەوە و بەو جۆرە لە ژێر فشار خستنی سەر ١٢٠٠ کەس پەنابەری هەق خوڕاوی کورد هەموو هەوڵی خۆتان بخەنە گەر بۆ فشار هێنان بۆ سەر ئیدارە دەولەتییەکان و نوسینگەکانی UNHCR و سەفارەتەکانی تورکیە خۆپێشاندان و ناڕەزایی وەڕی بخەن تا بەڵکو بە هیمەتی هەموو لایەک بتوانرێ ئەو پەنابەرانە لەو بارودۆخە پڕمەترسیدارە نەجاتیان بێت.

تکایە بۆ ئەم مەبەستە لە ڕۆژی هەینی ٢٠٠٥/٧/١ دا دەنگی خۆتان بخەنە پاڵ دەنگی ئەو دڵسۆزانەی وڵاتی سویسرا کە بە ناوی (لیژنەی پشتیوانی لە پەنابەرانی کوردی ئێران لە تورکیە) بەم ژمارە ٠٠٤١ ٧١ ٥٣ ٤٦ ٥٩٢ لە ڕۆژی تەلەفۆنە ٢٠٠٥/٧/١ لە بەر دەم کومیساریای باڵای پەنابەران لە ژنێف کۆ دەبنەوە و هاوکات لە پایتەختی زۆربەی وڵاتانی ئورووپایی و ئوستڕالیا و کەنەدا، ئەمریکا ڕێپێوان وەڕی دەخەری. پێشەکی سوپاس و پێزانینی خۆمان بۆ هەموو هەوڵ و هەمیەتی هەر تاکێکی کورد و هەر کەسێکی دڵسۆز دەردەبڕین.

ویست و داخوازییەکانی پەنابەرانی کوردی ئێرانی ناسراو بە شیمالی عێراق لە تورکیە بریتین لە:

١- جێبەجێکردنی بە پەلەی بەندەکانی یاسای ١٩٥١ ژنێڤی کومیساریای بەرزی پەنابەران UNHCR.

٢- گواستنەوەی هەموو ئەو پەنابەرانە بۆ وڵاتی سێیەم، کە هەموویان وەکو پەنابەری سیاسی لە لایەن UNHCRموە قەبوڵ کراون.

٣- گۆڕینی یاسای ٥٦٨٣ی دەولەتی تورکیە کە تایبەتە بە تۆریزم و کەش و گۆزار، کە بە هاوکاری نێوان UNHCR و دەولەتی تورکیە بە سەر ئەو پەنابەرانە دا سەپاوە.

با لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٧/١دا دەنگی مەزلومیەتی ١٢٠٠ پەنابەری کورد بە گوێی دونیا بگەیەنین.

کومیتەی پەنابەرانی کوردی ئێرانی لە تورکیە ٢٠٠٥/٦/٢٤

PEYAMÎ
Kurd
Jimare 43 | Salli 1 | 01.07.2005
Rojnameyekî heftaney gistiye

Hesîb Rojbeyanî, endamî Encûmenî Şarewanî Kerkûk:

Berey Turkmaniy droy legel daîk û bawkî xoyan kird!

Laparrey 7



Şandî Perlemanî Kurdistan serdanî Perlemanî Ewrûpay kird

Laparrey 2



مام جەلال بۆ رۆژنامەی "ئاخشەم"ی تورکی:

- خەیاڵی کوردستانێکی سەربەخۆ دوای رووخانی سەدام کۆتایی پێهات!
- ئەگەر من سەرۆکی دەوڵەتێکی کوردی گەمارۆدراو بوومایە، دەرفەتی هاتنم بۆ ئیستەنبول و خواردنی ژەمێکی ماسیم لەگەڵ تۆدا بۆ نەدەڕەخسا.

لاپەڕەی ٣

خەسرۆ پیربااڵ

بێدەنگی مەڕەکان....

لاپەڕەی ٣

حەمە سەعید حەسەن

شالوور و تووتی

لاپەڕەی ٦

Mistefa Çiwartayî

Yadek le Dilşad Merîwanî

Şehîdî Zimanî Kurdî

Laparrey 6

دانا رەئوف

"سەرکەوتنی خۆشەویستی" و بەهاکانی

لاپەڕەی ٤